K.T.
Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# XWEZA DI HELBESTÊN NÛ YÊN KURDÎ DE HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE

HAYHAT ISSA IBRAHIM
15711020

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mêrdîn 2017

K.T.

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

# XWEZA DI HELBESTÊN NÛ YÊN KURDÎ DE
# HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE

HAYHAT ISSA IBRAHIM
15711020

Şêwirmend

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mêrdîn 2017

**TAAHHÜTNAME**

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Xweza Di Helbestên Nû Yên Kurdî de, Helbestên Qadir Qeçax Û Edîb Çelkî wekî Nimûne" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

□ Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

□ Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

□ Tezimin/Projemin … yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

…./…./……

**HAYHAT ISSA IBRAHIM**

**KABUL VE ONAY**

**Hayhat Issa IBRAHIM** tarafından hazırlanan "Xweza Di Helbestên Nû Yên Kurdî De, Helbestên Qadir Qeçax û Edîb Çelkî wekî Nimûne" adındaki çalışma, 03.11.2017 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

Yrd.Doç.Dr. Mustafa ASLAN (Başkan)

Doç.Dr. Rafik SULAIMAN

Yrd.Doç.Dr. Haci ÖNEN

**PÊŞGOTIN**

Mijara xwezayê cihekî pan û berîn di helbestên nû yên kurdî de girtiye, lê rexnegir û lêkolerên kurd hind li ser vê mijarê nexebitîne. Di eynî demê de jî ew li cem hindek nivîser û lêkolerên kurd bûye keresteyê lêkolînê jî, lê hêşta bi têrûteselî nehatiye hilkolan û hêşta jî girîngiyeke hêjayî wê bi wê nehatiye dayîn ku hemî aliyên xwezaya bêgiyan û ya giyandar vegire. Anko ev hemî cure, beş, element û diyardeyên xwezayî bên şîrovekirin. Ev mijar bi rastî hêjayî gelek xebat û lebat û lêkolînan e. Hindî berhem li ser vê mijarê hebin jî, ji du nameyên akademî û çend gotarên kêm derbas nabin. Ev jî hindek ji wan nameyan in; "Kwêstan Cemal Selam: Siroşt le Şi'rî Nwêy Kurdî da 1930-1960", nameyeke masterê ye ku di sala 1996an de ji bo koleja edebê ya Zanîngeha Selahedînê hatiye pêşkêşkirin, "Fazil Mecîd Mehmûd: Siroşt le Şi'rî Goran da", nameyeke masterê ye ku di sala 1990î de ji bo Zanîngeha Selahedînê hatiye pêşkêşkirin. Ev jî hindek gotar in; "D. Emîn Mutapçî: Nalî û Siroşt" û "Kemal Mîrawdelî: Siroşt û Ciwanî le Şi'rî Goran da". Ev nameyên akademîk û gotar ji bo vê xebatê bûne çavkaniyên girîng, lê ev tenê ji bo vî babetê berfireh bes nîne. Ji ber ku xweza mîna keresteyekî herî girîng di nav helbestên kurdî de mişe xuya dibe.

Ez dixwazim spasiya şêwirmendê xwe, Doç.Dr. Rafiq Sulaiman, bikim. Spasî ji bo Ebu Ubeyd Ebdila Ziyab ku her ji destpêkê were piştevanê min e; her ji dema ku ez li Zanîngeha Duhokê xwendekarê wî bûm, wî berê min dida nivîsînê. Spasiyeke taybet ji bo diktor Îmad Weysî ku ji bo peydakirina çavkaniyan alîkarê min bû. Ez spasiya her du helbestvanan, Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî dikim. Wan bi hemî awayan alîkariya min kiriye û gelek caran dema xwe ji min re terxan kiriye. Di dawiyê de jî, ez spasdarê hemî hevalan im ku alîkariya min kiribin û çavkanî ji min re peyda kiribin.

**KURTE**

**XWEZA DI HELBESTÊN NÛ YÊN KURDÎ DE HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE**

**HAYHAT ISSA IBRAHIM**

Ev lêkolîna bi navê "Xweza di Helbestên Nû yên Kurdî de, Heslbestên Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî wekî Nimûne" bi rengekî teorîk û praktîkî behsa xwezayê di helbestên nû yên kurdî de dike û xasime di helbestên Qeçaxî û yên Çelkî de. Mijara xwezayê gelek berfireh e, xasime ku xwezayê peywendiyeke baş bi mirovan re heye û ta radeyekê zêde reng vedaye. Xweza zêdetir bi rengekî kurt û erkeke şîrovekarî nîşanên xwe hatiye berçavkirin. Lewma jî di vê xebatê de bizav hatiye kirin ka helbestvanên romantîk çawa pena biriye ber wê yekê ku hevgirtinekê yan pirekê di navbera hestên xwe û xwezayê de çê bikin. Xasime dema ku helbestvanên bihûrî serederiyê bi element û diyardeyên xwezayê dikin, ew serederî dibe sedema dahênanan li cem mirovî û xasime li cem helbestvanan bi xwe. Her wisa bi teknîkên cuda cuda ev elementên xwezayê mîna keresteyekî bingehîn di nav helbestên nû yên kurdî de xuya dibin ji ber ku xweza ji bilî erkeke statîkî dibe sedema derbirînê ji xweşiktiya jîngehê, jinan, aramiya derûnî, viyana welatî, gel û niştîmanên xwe tev li xwezayê giyandar û ya bêgiyan dikin.

Ev xebat li ser sê beşan hatiye parvekirin; di beşa yekê de, me jiyan û berhemên her du helbestvanên mijara xebatê, anku Qadir Qeçax û Edîb Çelkî daye nasandin. Di beşa duyê de behsa aliyê teorî yê xwezayê hatiye kirin ku taybetmendiyên xwezayê û pênase û beş û coreyên xwezayê vedigire. Her wisa xweşiktî û danberhevî û têkelbûna sîfetên jinan bi xwezayê re elementên xwezaya bêgiyan, diyardeyên xwezaya bêgiyan û xwezaya giyandar hatine kirin. Di beşa sêyê de jî bi awayekî praktîkî behsa tevlihevbûna her du helbestvanan, Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî, bi xwezayê jîngehê, niştîmanperweriyê, jinê, derûnî, bîr û baweriyan û Newrozê re hatiye kirin.

**Bêjeyên Sereke**: Xweza, element, diyarde, bêgiyan, giyandar, helbest, jîngeh.

**ÖZET**

**QADIR QEÇAX VE EDÎB ÇELKÎ ŞİİRLERİ ÖRNEKLEMİNDE MODERN KÜRT ŞİİRİNDE DOĞA**

**HAYHAT ISSA IBRAHIM**

Bu çalışma genelde modern kürt şiirinde özelde de Qadir Qeçax ve Edîb Çelkî'nin şiirlerinde doğayı teorik ve pratik açıdan inceliyor. İnsanın doğayla olan sıkı ilişkisi, doğa konusu insan üretimine geniş bir şekilde yansımıştır. Bu çalışmada doğa konusu kısa ve analitik bir şekilde ele alınmış, romantik şairlerin duyguları ve doğa arasında bir bağ veya köprü kurarken doğaya yaklaşımları incelenmiştir. Özellikle şairlerin doğadaki element ve fenomenleri ince bir şekilde ele almaları yaratıma yol açmaktadır. Doğadaki elementler modern kürt şiirlerinde çeşitli tekniklerle temel bi malzeme olarak görülmektedir; çünkü doğa, canlı cansız unsurlarıyla, bu şiirlerde statik bir şekilde kalmayıp, yaşam alanının ve kadın güzelliğinin, ruhsal durumun ve vatan sevgisinin ifade aracına dönüşmektedir.

Bu çalışma üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde çalışmanın konusunu teşkil eden iki şairin, yani Qadir Qeçax ve Edîb Çelkî'nin hayatları ve eserlerine yer verilmiştir. İkinci bölümde doğa konusu, özellikleri, tanımı, ve türü açısından teorik olarak ele alınmıştır. Yine bu minvalde bu şiirlerde doğanın güzelliğiyle kadının güzelleğinin ilişkisi ve bunların karşılaştırılması incelenmiştir. Cansız doğanın elementleri, canlı ve cansız doğanın fenomenleri incelenmiştir. Üçüncü bölümde Qadir Qeçax ve Edîb Çelkî'nin şiirlerinde doğanın vatan sevgisi, kadın konusu, ruhsal durum, inanç ve ideoloji ve Newroz bağlamında işlenişi incelenmiştir.

**Anahtar Kelimeler**: Doğa, element, fenomen, cansız doğa, canlı doğa, şiir, yaşamsal coğrafya.

## ABSTRACT

**THE NATURE IN KURDISH NEW POETRIES, QADIR QACHAKH AND EDIB CHALKI AS SAMPLES**

**HAYHAT ISSA IBRAHIM**

This thesis searches about the nature in Kurdish poetry theoretically and practically with a focus on poetry of Qachakh and Chalki. The subject of nature is vital and has no ends especially that the nature has a good relationship with humans and has a good reaction. The nature is showed in this thesis more in a short way and as an analytic paper and by its symbols, thus in this thesis we tried to know how the romance poets tried to make a relationship or a bridge between them and the nature. Especially when they react with elements and phenomenon of the nature in a good way, that reaction inspires people and especially inspires poets themselves. Also these elements of the nature shown as the main things in new Kurdish poems by different techniques because out of the static duty the nature is a reason of explaining the beauty of the homeland and women and psychotherapy and the love of the country and they mixture their lands and people with the lived and the unlived nature.

This thesis divided into three parts; in the first part we wrote about the lives and works of poets, Qadir Qachakh and Edib Chalki who are subjected to this study. In the second part, we wrote about the theoretical aspect of the nature that includes "the characteristics of nature and definitions and kinds of it". It also contains he beauty and the mixture of women with the nature and their comparisons. the elements of the unlived nature and the phenomenon of lived and unlived natures". In the third part, we focused about the mixture of both poets, Qadir Qachakh and Edib Chalki, with the nature homeland, nationalism, women, psychology, superstitions and Newroz.

**Key Words**: Nature, element, phenomenon, unlived, lived, poems, homeland.

# NAVEROK


**PÊŞGOTIN ...................................................................................................... III**

**KURTE ........................................................................................................... IV**

**ÖZET ................................................................................................................ V**

**ABSTRACT ...................................................................................................... VI**

**NAVEROK ...................................................................................................... VII**

**DESTPÊK ............................................................................................................ 1**

I. MIJARA LÊKOLÎNÊ ........................................................................................ 2

II. ARMANC Û GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ ........................................................... 2

III. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ ....................................................................................... 3

IV. PIRSGIRÊK Û ASTENGÊN LÊKOLÎNÊ ......................................................... 3

V. ÇARÇOVE Û SÎNORÊN LÊKOLÎNÊ ............................................................... 4

VI. TÊGEHÊN SEREKE YÊN LÊKOLÎNÊ ............................................................ 5

**BEŞA YEKEM ................................................................................................. 10**

**JIYAN Û BERHEMÊN HER DU HELBESTVANAN, QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKî ............................................................................................................ 10**

1.1. Qadir Qeçax ................................................................................................ 10

1.2. Edîb Çelkî .................................................................................................... 13

**BEŞA DUYEM ................................................................................................. 15**

**TAYBETMENDIYÊN XWEZAYÊ ...................................................................... 15**

2.1. XWEZA ÇI YE? ............................................................................................ 15

2.1.1. Xweza di Hundirê Mirovan de ................................................................. 15

2.1.2. Xweza ji der ve .......................................................................................... 15

2.1.2.1. Xwezaya Bêgiyan ................................................................................... 16

2.1.2.2. Xwezaya Zindî ....................................................................................... 16

2.2. BEŞÊN XWEZAYÊ ....................................................................................... 16

2.2.1. Element ...................................................................................................... 17

2.2.2. Diyarde ...................................................................................................... 17

2.3. CUREYÊN XWEZAYÊ .................................................................................. 18

2.3.1. Xwezaya Bêgiyan ....................................................................................... 18

2.3.2. Xwezaya Giyandar ........................................................................................18
2.4. XWEŞIKTIYA XWEZAYÊ Û XWEŞIKTIYA JINAN ................................ 19
2.4.1. Danberheviya Xwezayê û Jinan ..........................................................................19
2.4.2. Têkelbûna Jinan û Sîfetên Wan bi Xwezayê re..........................................23
2.5. XWEZAYA BÊGIYAN Û XWEZAYA GIYANDAR ................................. 27
2.5.1. Xwezaya Bêgiyan ........................................................................................27
2.5.1.1. Elementên Xwezaya Bêgiyan...............................................................27
2.5.1.2. Diyardeyên Xwezaya Bêgiyan ............................................................50
2.5.1.2.1. Werzên Salê .........................................................................................50
2.5.1.2.2. Seqa .....................................................................................................55
2.5.1.3. Xwezaya Giyandar ...............................................................................59
2.5.1.3.1. Giyandarên Kûvî...................................................................................60
2.5.1.3.2. Giyandarên Kedî...................................................................................63
2.5.1.3.3. Balinde .................................................................................................66
2.5.1.3.4. Giyandarên Avî “Masî” .........................................................................69
2.5.1.3.5. Zîndewer “Mêş û Mor”..........................................................................71
**BEŞA SÊYEM ......................................................................................... 76**
**XWEZA DI HELBESTÊN KURDÎ YÊN NÛ DE HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE ............................................ 76**
3.1. XWEZA DI HELBESTÊN KURDÎ DE ........................................................ 76
3.1.1. Xweza di Helbestên Klasîk yên Kurdî de ...................................................76
3.1.1.1. Melayê Cizîrî ........................................................................................76
3.1.1.2. Ehmedê Xanî.........................................................................................77
3.1.2. Xweza di Helbestên Nû yên Kurdî de .........................................................78
3.1.2.1. Celadet Bedirxan ...................................................................................80
3.1.2.2. Mueyed Teyîb .......................................................................................84
3.2. XWEZA DI HELBESTÊN QADIR QAÇAX Û EDÎB ÇELKÎ DE ............... 92
3.2.1. Xweza û Xweşiktiya Jîngeha Kurdi1stanê.......................................................92
3.2.2. Xweza û Niştîmanperwerî...............................................................................97
3.2.3. Xweza û Jin .................................................................................................100
3.2.4. Xweza û Derûn .............................................................................................105
3.2.5. Bîr û Bawerî û Newroz...................................................................................110
3.2.5.1. Qadir Qeçax û Bîr û Bawerî....................................................................110
3.2.5.2. Edîb Çelkî û Bîr û Bawerî.......................................................................113

3.2.5.2.1. Edîb Çelkî û Newroz........................................................................114
**ENCAM** ........................................................................................................ **118**
**ÇAVKANÎ** ...................................................................................................... **122**

# DESTPÊK

Bê guman xweza wekî pêkhateyeke girîng di nav helbestên nû yên kurdî de xuya dibe. Her wisa komeke xasyetan heye ku wan ji helbestên klasîk cuda dike û girîngtirîn xasyet jî vegera wan a ber bi xwezayê û serederiya wan a nû ye bi regez û diyardeyên wê re. Em dikarin bi rengekî ji rengan bibêjin ku hemî bingehên din ên helbestên nû yên kurdî xwe di nav xwezayê de dibînin. Veger ji bo xwezayê veger e ji bo jiyana paqij û bêastengî û dilsafiyê. Xweza xeyala helbestvanan vedike û mejiyê helbestvanan di nav xwezayê de dikeve bizavê û çalakî û dahênanan dike yan jî deriyê derbirîna helbestvanan vedike û helbestvan xem û derd û nexweşiyên xwe ji wê re der dikin û derdê dilê xwe li cem regezên xwezayê vedigirin. Helbestvan xemên nemana 'emrî û yarê û jiyana bihadar bi weryana belgan, behtîna gulan, avabûna rojê, heyvê û stêran re têkel dikin. Xweza wekî dayikeke wefadar û dilovan û jineke nazdar tê dîtin. Temaşekirina xwezayê hestên helbestvanan germ û gur dike û helbestvan jî bi helbestên xwe hestên xwendevanan germ dikin û bizavê dikin ku jiyana xwe li gor wê dozê bikin. Rast e ku helbestvanên kevin û klasîk awir dane xwezayê û heger mirov dîwanên wan vekole dê bi hezaran navên regez û diyardeyên xwezayê bibîne, lê helbestvanên romantîk bi nerîneka dî berê xwe didin xwezayê û bi ruhekî dî serederiyê bi wê re dikin.

Heger xweza li cem helbestvanên klasîk her keresteyê ber destên wan bûbe ji bo wesfandina yaran û hindek dîmenên rojane, li cem helbestvanên romantîk têkeliyeke organîk di navbera xwezayê û helbestvanan de peyda dibe. Helbestvan xwe parek ji xwezayê dihesibînin û ew û xweza bi hemî regezên xwe ve ruh didin hev. Ne her tenê giyandarên xwezayê, lê bêgiyanên wê jî bi helbestvanan re eleqedar dibin. Ji bilî wê ku helbestvan ruh didin wan, helbestvan aqil û hestan jî wekî mirovan bi wan didin. Xweza dikare bibe hevraza helbestvanan û ji wan bipirse û bersivan jî ji wan bistîne. Helbestvan derdên dilê xwe ji xwezayê re vedigêrin û ew her du, hestên xwe ji hev re diyar dikin.

## I. MIJARA LÊKOLÎNÊ

Di vê mijarê de, me bizav kiriye ku xwezayê şirove bikin û bidin nasandin û rengvedana wê di nav helbestên kurdî de û bi taybetî rengvedana wê di helbestên nû de derbixin holê. Ji pêxemet vê yekê, me du helbestvanên nûjen ji bo vê lêkolîna xwe hilbijartine. Ê yekê Qadir Qeçax e, pirtûkên wî yên ku bûyîne mijara lêkolînê ev in; Çiyavîn, Kel û Şkeft, Bizot, Giyandarperwer, Beyana Min, Bizav û Bizav û Armanc. Ê duyê Edîb çelkî ye, pirtûkên wî yên ku bûyîne mijara lêkolînê ev in; Stiranên Zêy, Dara Çil Awaz û Pêlistankên Koçer. Merem ji hilbijartina helbestên wan wekî keresteyên vê lêkolînê bo corbicoriya saloxdana xwezayê di nav helbestên wan de vedigire, bi wan helbestan yên girêday bi regez û elemêntên xwezayê ve, ta çi ast xwiya dibin, her wesa li ser xwendevanê kurd kartêkirinek baş bi dest xisitye. Ji ber ku xweza di helbestên nû yên kurdî de mijareke hûr û berfireh e û bêguman xweza bi xwe jî gelek element û diyardeyan vedigire, wekî asmanî, erdî, avê, werzên salê, seqayê, giyanewerên kûvî û yên kedî, balindeyan, giyandarên avî û zîndeweran. Ji bo zelalbûna li ser vê mijarê, me tenê du helbestvan hatine hilbijartin.

Di vê xebatê de, têgeha helbestên nû û qonaxên wan û pêla romansîzmê bi rengekê zelal hatiye pejirandin. Her wisa pênase û taybetmendiyên xwezayê di vê xebatê de hatine kirin.

## II. ARMANC Û GIRINGIYA LÊKOLÎNÊ

Ji bo giringiya vê mijarê, li başûrî û bakurî xebat li ser helbestên nû yên Kurdî hatine kirin. Li başûrî; Yadgar Resol Balekî, Simakanî Tazekirdineweyî Şirî Kurdî û Ehmed, 'Edle Cemîl, *Rolê 'Ebdirehîm Rehmiyê Hekarî di Nûkirina Hozana Kurdî* da. Xebateka dî jî ya Zulkûf Ergûn bû bi navê *Nerîta Netewayetî di Helbesta Nû ya Kurdî* de. Her wisa li bakurî jî ev bûn; Roger Acûn *Îmaj Di Helbesta Nû ya Kurdî de*, Îrfan Amîda *Qonaxeke Modernîzma Kurdî-Helbesta Tîrêjê*. Ev xebatên navborî hemî bi nêrînên nasyonalîzim û çarçovên din hatine nivîsandin, lê li ser mijara xwezayê tenê du lib hene û ew jî bi zarê Soranî ne; Kwêstan Cemal Selam: *Siroşt le Şi'rî Nwêy Kurdî da 1930-1960* û Fazil Mecîd Mehmûd, *Siroşt le Şî'rî Goran da*, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1990. Lê ev ji bo cara ewilî ye ku xebateka bi vî rengî bi kurdiya Kurmancî û bi elfabêya Latînî-kurdî li ser xwezayê di helbestên nû yên Kurdî

de tête kirin. Armanca me ya serekî di vê mijarê de ew e ku em destnîşankirina wan xasiyetên xwezayê bikin ku bi çi reng di nav helbestên nû yên kurdî de xweya dibin, taybetî di nav helbestên Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî de û ta çi rade şiyane tevlîhevkirina regezên xwezayê di nav helbestên xwe de bi kar bînin. Her wisa armanca me ew e ku rengvedana xwezayê di nav jîngeha kurdistanê de berceste bikin. Armanca din ew e ku nameyeka akadîmîk li ser mijara xwezayê bihête kirin taybetî di dîyalêkta kurmancîya serî da. Her wisa armanca me ya din destnîşankirina wê peywendiya nêzîka xwezayê bi mirovan ra heye û bûye mijareka giring û bingehîn û keresteyekê serekî ku helbestvan penayê bibin ber wê.

### III. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ

Ji ber ku di xebatên zanistê civakî de û taybet di zanistê edebî de xebatên wesfî-şirovekarî bikêrhatîtir û guncayîtir in, lewma di vê qadê de lêkoler zêdetir berê xwe didin rêbaza wesfî-şirovekarî ya ko rêyê dide lêkoleran ku di wesfandin û şirovekirin û veçirandina metnên edebî de kar bikin wate di metnê lêkolînê de. Piştbestina me bi çavkaniyên here serekî ko me mifa jê wergirtî li ser rêbaza wesfî-şirovekarî yên van lêkoleran bûn; Fazil Mecîd Mehmûd, *Siroşt le Şî'rî Goran da, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1990* û Kwêstan Cemal Selam, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da ‘1930-1960’, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1996*. Ên bi zimanê Erebî jî ev bûn; Mihemd Hesen 'Elî Mecîd, *el-Wesif fî el-Şi'ir el-'Îraqî*, Rîsalet el-Dikturah, Camî'et Bexdad, 1985 û Huseyn 'Ebud Hemîd, *el-Tebî’e fî el-Şi'ir el-'Îraqî el-Hedîs*, Rîsalet Macistêr, Camî'et el-Besre, Kuliyet el-Adab, 1984. Em dibînin ku ev rêbaza wesfî-şirovekarî ji bo xebata me guncayîtir e, lewma jî me pişta xwe bi vê rêbazê bestiye.

### IV. PIRSGIRÊK Û ASTENGÊN LÊKOLÎNÊ

Rast e hindek pirtûkên kurdî hebûn, lê ne li astê pêdivî bûn anku pirraniya pirtûkên li ser vê mijarê bi zimanê Frensî û Tirkî bûn û ji ber wê yekê astenga herî mezin di bidestxistinsa çavkaniyan de nezanîna zimanên biyanî bû. Ji ber ko pirraniya çavkaniyan li ser mijara helbestên modern ji wan zimanan bû, lewma me berê xwe daye çavkaniyên bi zimanê Erebî û em karîne tiştên baş ji bo xebata xwe peyda bikin û mifayê ji zimanê Erebî werbigirin.

Pirsgirêka dî elfabê bû. Li başûr û rojhilatên Kurdistanê, bi elfabêya Erebî dihêt nivîsandin. Me bihêsanî xwe gehand wan çavkaniyan. Lê elfabêya Kurdî-Latînî li bakur û rojavayên Kurdistanê û Kafkasyayê û diyasporayê dihêt bikaranîn. Lewma çavkaniyên vê elfabêyê bihêsanî negehiştin ber destên me. Ên ko me peyda jî kirine zêde dema me girt ji ber ku elfabêya latînî ji bo me hindek zor e, lê dîsa jî me mifa jê wergirt.

Bê goman çi kar bê asteng nînin. Pirsgirêka here serekî kêmiya çavkaniyan li ser mijara xwezayê bû, anko kêmiya pertûkên bi kurdî li ser mijara xwezayê ji bo hejariya pertûkxana kurdî vedigere. Astenga din li ser wergêrana peyvên biyanî bû ji bo zimanê kurdî ko gelek caran peyv wataya xwe ji dest dide. Astenga din nebûna zimanekê standerd yê kurdî bû.

## V. ÇARÇOVE Û SÎNORÊN LÊKOLÎNÊ

Ev lêkolîne li ser sê beşan hatiye parvekirin, ji bilî destpêk û encaman û lîsta çavkaniyan. Her wisa sinorên xebata me bi du helbestvanan û çendîn pirtûkên wan hatine sinordarkirin. Ê yekê Qadir Qeçax e, pertûkên wî; Çiyavîn, Kel û Şkeft, Bizot, Giyandarperwer, Beyana Min, Bizav û Bizav û Armanc. Ê duyê Edîb çelkî ye, pertûkên wî; Stiranên Zêy, Dara Çil Awaz û Pêlistankên Koçer.

Beşa yekem: behsa jîyan u berhemên her du helbestvanan, anku Qadir Qeçax û Edîb Çelkî, hatiye vegêran. Zêdebarî diyarkirina xwezayê di helbestên kurdî de. Her wisa îşaret bi çawaniya bikaranîna xwezayê bi xweşiktiya xwezayê, jinan, danberheviya xwezayê û jinan û têkelbûna sîfetên jinan bi xwezayê re hatiye dayîn.

Beşa duyem: Di vê beşê de, element û diyardeyên xwezaya bêgiyan hatine destnîşankirin û ka çend di helbestên kurdî de reng vedaye. Her wisa xwezaya giyandar jî bi hemî cureyên xwe ve di vê beşê de hatiye destnîşankirin û rengvedana wê jî di helbestên nû yên kurdî de hatiye berçavkirin.

Beşa sêyem: Di vê beşê de ku beşa dawiyê ya vê xebatê ye, xweza di helbestên kurdî de hatiye vekolîn û bi taybetî li ser helbestên Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî hatiye praktîzekirin. Em bi rengekî praktîkî li ser helbestên wan rawestiyane ji bo ku bi ser tevlihevbûna xwezayê û jîngeha Kurdistanê hilbin, zêdebarî niştîmanperweriyê, jinê,

derûnê, bîr û baweriyan û Newrozê. Her wisa me berê xwe daye wê ka rengvedana helbestên wan bi çi rengî xuya dibe.

## VI. TÊGEHÊN SEREKE YÊN LÊKOLÎNÊ

Xebata me bi tevahî pala xwe didex çar têgehên sereke; helbesta nû, helbesta nû ya kurdî, pêla romansîzmê, xweza. Li jêr em dê van têgehên sereke yên vê xebata bidina nasîn û li ser girîngî û watedariya wan a ji bo xebata me dê bînin ser zimanî.

- **Helbesta nû:**

Têgehê helbesta nû di ser wê yekê ra ku gelek bîr û boçûn derbarey helbesta nû hatin nivîsîn, pêwîst e deqên rexnegiran jî dest nîşan bikeyn, ku wan jî hewldaye zaravekê ji bo vî toxmê edebiytê bibînin, lê negehiştine wî astê edebîyatê di gel şêweyê vî toxmê edebî û destinîşankirina nasnama wî. Tê zanîn ew deqên rexinegiran jî rengekê tondrew û dijayetîya vê taqîkiriê dikin.

Lê di ser wê yekê ra vî şêweyê nû yê nexişê edebî di qada helbesta nû de xwe daye pejirandin her weha di dawiya salên heftiyan de û destpêka heştîyan de ji sedsala bîstan bi tewawî xwe di vê qadê de daye pejirandin. Ji layê zaravê ve bi şêweyê xwe yê zimanî (poertic prose) hatîye wergêran.

Lê emê hewl bideyn hinekê ji dîroka vî toxmê edebî û rewşa wî dîsan nasnama wî bibînîn ziman. Tê zanîn vî şêweyê helbestê di dawiya sedsala nozdeyê zayînî de û destpêka sedsala bîstê de destpêka wê dihêt destnîşankirin. Di gel pêşdaçûna mezin a mirovatiyê di cîhanê de bêguman roşenbîrî jî pêşda diçît û rengên xwe digihurît .[(1)]

Kesên ku piştgîrîya wê çendê dikir û dixwast helbesta nû ji bendên kêş û serwa rizgar bibît, paşan bizava helbestvanên ciwan destpêkir kû li ser rûpelên rojname û kovaran hatine pejirandin.

[1] Berwarî, Hîvî, *Rêbazên Edebî*, Weş,Êketîya Nvêserên Kurd, (Çapa 1), Duhok, 2010, r. 288.

- **Helbesta nû ya Kurdî**

Pêşengên helbesta nû di nav kurdan da mîna, Ebdulrehîm Rehmî Hekarî, dîwanek belav kiribû bi navê “Gaziya Welat” di sala 1918- 1919 zayînî de, di kovara Jînê de hatiye belavkirin.

Diktor marûf xeznedar sîmayên nûkirina helbesta nû ya kurdî di van xalên jêrîn de di bînît.

1- Di gel berdewamîya behra erûzê kêşa (pence yan tilî, kert, birge) di helbesta kurdî de peyda bû
2- Di helbesta nû de eketîya qafye( serwa) helweşya û helbesta nû kefte di azadîyê de.
3- Di helbesta nû de xeyal û hesit afrandin û peywendiya lûcîkî di nav bera dêrên helbestê de bihêz diket, ji alîyek din ve hemû dêrên helbestê berdewam zelalkirin û temamkirina wateya dêrên pêştir.
4- Zimanê biyanî ji helbestê têt dûrkirin, dîsan peyvên nû yên kurdî tên afrandin bi rengekê berfreh derbirîn bi kurdîya resen û xomalî di helbestê têt bikar anîn.[2]

- **Pêla Romansîzmê:**

Tê zanîn pêla romansî li dawiya sedsala hejdan de şoreş bû li hemberî hemû kevneşopiyan, Ev rêbaze deyndarê hizrên Jean Jack Rousseau (Jan Jak Ruso) ye, ku li Fransayê zemînê yek ji bu şoreşa Frensî li sala 1789 de amadekir bû.

Bêguman ji bu pênase û naskirina her zaravekî çendîn boçûn hene, mîna zaravê romansîzm û romansî û romantîk yek wata digehînin. Hinek dîtin ji bo wê yekê diçin ku peyva (Romanius) ji çendîn ziman û zaravên latînî yên belavbuyî hatiye, pêşan ew pêkihateyên xwe ji cîhana xwezayî, giyanî, muzîkî û vîyanê av didet. Ew cîhan jî bi zimanê nazik û henasa dirêji û dûr ji tiştên aşkira, anku wêneyên wî hemû wêneyê xeyalane û cîhana veşartiye. Li ser vî zaravî dîsan hinek dîtinên din hene wate peyva

[2] Xeznedar, Marûf, *Mêjûy Edebî Kurdî*,(bergî 5), (Çapa 1), Hewlêr, 2005, r. 28.

romansî ji peyva (Romanyns) hatiye, ku ev zarave ye li ser ziman û edebiyata berbelava zimanê latîn yê kevin hatye kutin.

Yek ji taybetmendiyên romansîzmê girîngî dane bi xwezayê, û bankirin û vegeryan ji bo xwezayê, wateya ku zelalî û paqijî, saxlemî têda ye, ji ber vê yekê jî piraniya romansîyan ji başêran ber bi kundan koçber bûn da ku ji xelkê dûrbikevin û xweşiyê jî bibînin ku xweza li ba evîndar û eş û azarên wan in, bi vî awayî viyana wan ji xwezayê re bû çavkaniya afirandinê, ji wan helbestvanên ev bange dikir (Ruso) bu dema digot, vegerin ji bo xwezayê.

Her wesa liba romansîyan azadiya takekesî tiştekê pîroz e, viyan û jin li cem romansîyan bi çavekê pîroz û bilind di nirxînin li viyan û suzan temaşe dikir û gelek caran jin bi firîşta esmanan xwe yad dikir.

**Romansîzim li cem kurdan**

Bi rengekî giştî ev rêbaz li sedê bîstê de pitirya helbestên belavkirî yên kurdî demê navbera her du şerên yekem û duyem de derketin.

Bi rengekê giştî her du şerê yekem û duyemê cîhanî bûn, naveroka helbestên wan bêbeş nînin ji hest û xeyalên romantîkî. Pişka zêdeya ewan helbestan romantîkî bûn, anku girêdayî bûn bi baredoxê siyasî û derdeseya bi serê miletê kurd da hatiyî, her wesa Şêx Nurî Şêx Salih bi pêşengên helbestvanê romantîkiyê ser demê xwe di hate naskirin. Di helbestekê da Şêx Nurî bi vî rengî derdê dilê xwe li berambeyî dunyayê û gerdunî derdixeş;[3]

Derdê dilî xom cumleyêkî bênime teqrîr

Înso û melek û cin û perî dênime giryan

Bê şek muteheyîr debê dêwane le zincîr

Sed aqil û huşiyar exême kêw û biyaban.[4]

---

[3] Balekî, Yadgar, Resol, *Simakanî Tazekirdineweyî Şirî Kurdî*, Çapxane. Wezaretî Perwerda, Hewlêr, (Çapa 1), 2005, r. 172.
[4] Şêx, Nûrî, Şêx, Salih, *Dîwan*, Komkirin û Saxkirin, Ebdulwahid, Azad, (Çapa1), Beşa Duwem, Çapxana Cahiz, Bexda, 1976, r. 114.

- **Xweza:**

Dema em di vê xebatê de behsa mijara xwezayê dikin, merema me ew e ku wê yekê diyar bikin ka ta çi rade xwezayê bandora xwe li ser helbesta kurdî û her du helbestvananên me, Qadir Qeçaxî û Edêb Çelkî, kiriye û ka ev mijar ji bo çend mereman hatiye terxankirin wate xwezayê peywendiyeka nêzîk bi mirovan re heye û her wisa xweza bi keresteyê serekî ji bo her du helbestvanên me bûye bingehekê serekî. Tiştên here serekî ku em di vê xebata xwe de gehiştin wan ev in: xwezayê cihekî berfireh di nav helbestên her du helbestvanan de vegirtiye. Xasime ku xwezayê di helbestên nû yên kurdî de komeke xasiyetan heye ku wan ji helbestên klasîkî cuda dikin ji ber ku her du helbestvanên me girîngiyeke zêde didin hemî regez û diyardeyên xwezayê. Wan berê xwe daye xwezayê û nîşandana dîmenên wê bi hemî ta, cure, regez û diyardeyên wê ve.

Zimanê her du helbestvanan dema behsa xwezayê dikin, kurdiyeke paqij û vewjartî ye û peyvên xwemalî di wan de hatine bikaranîn, bi pend û gotinên pêşînan û peyvên xweş ên nav xelkî hatine xemilandin.

Merema din vegera helbestvanan ber bi himbêza xwezayê wekî keresteyê sereke û bingehîn di helbestên xwe de bi kar anîne ji bo xweşiktiya xwezaya Kurdistanê û evîna kûr a helbestvanan ji bo wê xwezaya ku ew xwe parek ji wê dizanin vedigere û bi sedema helbestên xwe yên li ser xwezayê zêdetir xweşiktiya xwezayê berçav dikin.

Xwezayê kartêkirineke rasterast li her du helbestvanan, Qadir Qeçax û Edîb Çelkî kiriye. Ev jî ji verêja evîna kûr û bêdawî ya wan her duyan ji bo wê xwezayê ye ji ber ku heger mirov ji hundirê xwe tiştekî ne'ecibîne, qet di behskirina wî de serkeftî nabe. Me jimareyeke helbestên Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî di warên niştîmanperwerî û evîna jinan û ya jîngehê û derûnî de tev li elementên xwezayê kirine.

Sererayî vê yekê têgehê xwezayê li cem Yewnaniyan bi vî rengî hatiye diyarkirin: xweza ji cîhanê û gerdûnî û her tiştekê berciste bibit û li dû yasayan biçe pêk dihêt û ev mirovan jî vedigire. Her wisa Cemîl Silîba têgehê xwezayê bi vî rengî diyar dike:

xweza ji wê hêza belav di nav leşan de ye ku her zîndewerek dikare bi rêya wê bigehe pêgehiştina xwe ya xwezayî " [5]

Xweza wekî zarav di edebiyatan de jî, çi pênaseyeka vebir ji bo xwezayê nîne. Em dikarin pênaseya xwezayê wekî zaravekê edebî bikin" xweza ew beş e ku di vê cîhanê de dikare hestên mirovan ên hunerî bigire"[6] an bi ramaneka din hebûna her tiştekê madî li derdorên me di vî gerdûn de ku em dixwînin û dibînin û hest bi wan dikin an bandorê li hebûna mirovan dikin wekî rojê, heyvê, stêran û deryayan. Ev hemî jî mîhraba xwezayê ne.

Seyîd Newfel bi vî rengî helbestên xwezayê pênase dike: helbest nûnerên xwezaya zindî û bêcan in. Ka çawa helbestvan bi xwe nûnerên xweşiktiyê û xeyalê ne"[7]

---

[5] 'Ebdalnur, Cibur, *el-Mu'cem el-Edebî*, Dar el-'Ilim el-Milayîn, Beyrut,( Çapa1), 1979,r.163.
[6] Silîba, Cemîl, *Ferhengê Felsefî, Tercumê: Minuchirêanmî Derbîdî*, (Çapa2), Tehran, 1381k,r.442.
[7] Newfel, Seyid, *Şi'ir el-Tebî'e fi el-Edeb el-'Erebî*, el-Qahîre, Metbe'e Misir, 1945,r.12.

# BEŞA YEKEM

# JIYAN Û BERHEMÊN HER DU HELBESTVANAN, QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ

## 1.1. Qadir Qeçax

Navê wî yê rasteqîne Qadir 'Ebdil'ezîz Reşîd Mihemed 'Elî ye. Ew di nav maleke cotyar û kurdperwer de di 8ê Adara sala 1962yan de, li gundê Kurêmeyê ku bi ser nahyeya Mangêşê û parêzgeha Duhokê ve ye, hatiye dinyayê.[8]

Ew bi navê Qadir Qeçax navdar bûye û ta niha jî her bi vî navî tê nasîn. Sebaret xwendina wî, ew bi xwe dibêje: "Min di şeş saliya xwe de dest bi xwendina xwe ya berahiyê kir, li gundê Kurêmeyê. Paşê min dest bi xwendna navinciyê kir, li her du gundên Beroşkê û Kovilyê. Piştî hingê, xwendna amadehiyê li Duhokê kir."[9] Di sala 1979an de ku Qeçax li dibistana Birayetîyê xwendekar bû. Hingê xwendin li parêzgeha Duhokê bi zimanê kurdî bû, her çende Be'sî li ser hikmî bûn. Qeçax wê demê di nav rêz û rêxistinên nihênî yên Partiya Demokrat a Kurdistanê de bû. Di sala 1980yî de, ev rêxistina nihênî ku navê wê "Şefeq" bû ji aliyê rejîma Be'syan ve eşkere bû. Lewma wî û hindek hevalên xwe peywendî bi şoreşa gulanê ya pêşketinxwaz kir. Wan berê xwe da çiyayan û bûn pêşmerge. Paşê Qeçax li rojhilatê Kurdistanê dibe penaber û li aliyê parêzgeha Ûrmiyeyê binecih dibe.

Di sala 1984an de, Qeçax di nav hilbijartinên Partiya Demokrat a Kurdistanê de bûye berpirsiyarê navçeya xebatê li bajarê Nexedeyê ku piranî kurdên başûrî li wê derê wekî penaber binecih bûbûn. Di sala 1986an de, ew bûye berpirsiyarê îdarî yê mekteba siyasî û piştî hingê bi şeş mehan li gundê Zêweya Şikanê yê ser bi parêzgeha Duhokê ve bûye kargêrê liqa yekê ya Partiya Demokrat a Kurdistanê.

Di sala 1988an de, Qeçax careke dî diçe rojhilatê Kurdistanê ku bi stî Beyan Aîf 'Ebdilqadirê re bizewice. Piştî sê mehan ji enfalan, ew careke dî vedigere başûrê

---

[8] Çavpêkevtineka taybet bi Helbestvan Qadir Qeçaxî re, *li Mozexaneya wî*, Dihok, 17/6/2017.

[9] Husên, Beyan Ehmed, *Hozana Bergiryê li Serdemê Şoreşa Gulanê* 1976-1991ê Devera Behdînan, Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, Kolîja Adabê, 2003, r. 113.

Kurdistanê û li nêzî gundê Şetûnsê ku nêzî tixûbê bakurê Kurdistanê ye bi giranî birîndar dibe. Paşê ew ji bo çareseriyê diçe bajarê Colemêrgê, li bakurê Kurdistanê.

Piştî serhildana sala 1991ê, wî gelek postên hizbî û îdarî wergirtin. Di sala 2010an de, di kongreya sêzdehan ya Partiya Demokrat a Kurdistanê de, ew wekî kesê yazdehê yê civata serkirdetiyê hat hilbijartin.

Her di sala 2010an de, Qeçax bû berpirsiyarê akademiya Partiya Demokrat a Kurdistanê û çavdêriya dewreyên hevdehê û hejdehê û nozdehê yên akademiyê kir û ta sala 2016an jî berdewam bû û bi sedan kadro li ber destên wî hatine perwerandin.[10]

Qadir Qeçax ji bo çarekirina kêşeyên civakî kesekî desthel bû. Bi çavdêriya wî, 432 kêşeyên xwîndariyê li Akrê, Duhokê, Hewlêrê, Soranê, Şêxanê û Zaxoyê hatine çarekirin.

Her wisa wî bi alîkariya qaymeqamê Akrê yasaya jimare 90î ya çandinê li tixûbê qezaya Akrê xist karî ku di berjewendiya cotyar û hejaran de bû. Di sala 2005an de, wî xelata Cewahîrê ya torevaniyê wergirt. Di 8ê Adara sala 2009an de, wî muzexaneyek bi navê "Mozexaneya Qeçax"ê vekir ku tiştên folklorî, şûnwarî, antîkî, fosîl, diravê kevin û yê nû, çek, destnivîs, tablo, şano, dîmenên xwezayî û kitêbxane di wê de hene. Ji ber ku ta niha 2086 xwendekar di dewreyên rewşenbîrkirinê de li ber destên wî hatine perwerandin, em dikarin bibêjin ku ew kesayetiyekî şoreşger û rewşenbîr e. Destekî wî pênivîsk û destê dî çek hilgirtî ye. Wî hemî jiyana xwe ji bo xizmeta gel û welatê xwe terxan kiriye.[11]

### Berhemên Wî

Qadir Qeçaxî yekem car di sala 1980yî de dest bi vehandina helbestan kiriye. Wî bi her du rengên klasîk û azad helbest vehandine. Her wisa wî bi her du zarên kurmancî û soranî helbest vehandine, bê cudahî. Helbestên wî bi zimanekî sade ne û bara pirtir ji wan posterî ne anku li beranberî her helbestekê nîgarek jî hatiye kêşan. Ye'nî wî helbestên xwe bi rengekî serbest vehandine.

[10] Çavpêkevtineka taybet bi Helbestvan Qadir Qeçaxî re, li *Mozexaneya* wî, Dihok, 17/6/2017.

[11] Çavpêkevtineka taybet bi Helbestvan Qadir Qeçaxî re, li *Mozexaneya* wî, Dihok, 17/6/2017.

Tiştê herî girîng ku em îşaretê pê bidin ew e ku helbestên Qeçaxî bi kurdiya petî hatine vehandin, lê dîsa jî zimanekî sade û zelal e. Naveroka helbestên wî bi rengekî giştî behsa xwezaya Kurdistanê dike, mîna kitêbên wî yên *Kanî û Rûbar*, *Çiyavîn*, *Kel û Şkeft*, *Guldan* û *Giyandarperwer*. Di nav van pirtûkan de, Qeçaxî zêdetir ji hezar navên kanî, rûbar, gul, çiya, kel û şikeft û giyandaran bi kar anîne û helbest bi wan vehandine. Her wisa naveroka helbestên wî girêdayî serhildan û bergirî û şoreşan in û kêşeyên civakî û tiştên xweşik in. Ta niha, wî gelek berhemên çapkirî ji pirtûk û helbestan hene:

1. *Bizav* – 1984, helbest
2. *Çawerwanî* – 1985, helbest
3. *Berixwedan* – 1989, helbest
4. *Bizav û amanc* – 2000, helbest
5. *Bzot* – 2003, helbest
6. *Guldan* – 2004, helbest
7. *Tuxûb* – 2005, helbest
8. *Çiyavîn* – 2005, helbest
9. *Kanî û Rûbar* – 2006, helbest
10. *Witarbêjî* – 2006, pirtûk
11. *Kel û Şkeft* – 2007, helbest
12. *Giyandarperwer* – 2007, helbest
13. *Wekhevî* – 2008, helbest
14. *Hemk û Sînem* – 2010, helbest
15. *'Ebdalê Zeynê* – 2011, helbest

16. *Mozexana Qeçax* – 2013, pirtûk

17. *Bûke Merg* – 2013, helbest

18. *Stiranemê* – 2015, helbest

19. *Beyana Min* – 2015, helbest

20. *Zanyarî Geş bo Mêrûy Reş* – 2016, pirtûk

21. *Domêt Kurdistanê* – 2016, helbest

22. *Nav û Nîşan bo Gotarxwên* – 2016, pirtûk

### 1.2. Edîb Çelkî

Navê wî yê rastîn Edrîsê Mihemed 'Eliyê Çelkî ye, lê ew bi Edîb Çelkî tê nasîn. Ew nivîser û helbestvan bi taybetî helbestvanê stranê û awazdanerekî kurd e.

Di sala 1957an de, li gundê Çelkê yê bi ser qezaya Amêdiyê û parêzgeha Duhokê ve, li başûrê Kurdistanê, Çelkî ji binemaleke dîndar peyda bûye. Wî xwendina xwe ya berahiyê li Duhokê û di sala 1982yan de jî Koleja Şerî'etî li Zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Di sala 1982yan de, ji 27ê Sibatê ta 10ê Gulanê anku ji bo heyama 72 rojan, ew bi gunehê alîkariya şoreşa kurdî bi destên rejîma Bexdayê hat girtin. Di payîza sala 1982yan de, ew çûye nav rêzên şoreşa kurdî û ji hîngê û ta havîna sala 1995an pêşmerge bûye û di gelek çalakî û karên şoreşê de beşdar bûye. Ji Tîrmeha sala 1995an ta niha, ew li welatê Almanyayê dimîne. Di sala 1979an de, wî dest bi nivîsandina helbestê kiriye. Ji sala 1980yî ta niha, ew endamê yekîtiya nivîserên kurd e. Di sala 1991ê de, li kongreya raperînê, li Şeqlaweyê, Çelkî bûye endamê desteya giştî ya rêveberiya yekîtiyê. Her wesa li nav şoreşê jî, di sala 1989an de, ew yek ji damezrînerên koma nivîserên Kurdistanê bûye. Piştî hevgirtina wî û yekîtiya nivîserên Kurdistanê, Çelkî bû endamê desteya wê jî. Gelek nivîsar û lêkolînên wî bi her du zimanên kurdî û 'erebî belav bûne û di bihara sala 1989an de, yekemîn dîwana wî ya helbestan bi navê *Şevistranên Zêy* belav bûye. Wî yekemîn rojnameya hefteyane bi

navê *Peymanê* ku hejmara yekê di 11ê Tîrmeha sala 1994an de belav bûbû li Duhokê damezirand û ta Xêveya anku Xizîrana sala 1995an sernivîserê wê bû.

Çelkî gelek xizmeta stranên kurdan kiriye. Helbestên wî yên dîwana wî ya berahiyê azad in, lê hindek ji wan jî bûne stran. Wî Beyta Lalişê, Beyta Şêx 'Ebdselamê Barzanî û her du koralên wî yên Şingalê û pêşmergeyê ji şakarên wî ne û hemî kurdan ha ji van berheman heye. Ew niha dîwana xwe ya yekê ji nû ve diberhevîne û kar li ser hindek stranên nû dike. Beyta bakurê Kurdistanê jî di rêzê de ye û gelek stran jî ji bo serxwebûna Kurdistanê.

**Berhemên Wî**

1. *Şevistranên Zêy* - helbest
2. *Dara Çilawaz* – 2010, helbest
3. *Pêlistankên Koçer* – 2016, helbest
4. *Stiranên Zêy* – 2017, helbest

# BEŞA DUYEM

# TAYBETMENDIYÊN XWEZAYÊ

## 2.1. XWEZA ÇI YE?

“Peyva “nature”ê ya îngilîzî anku xweza ji peyva “phiysis”ê ya latînî hatiye wergirtin. Van her du peyvan girêdaneke rasterast bi taybetmendiyên şînkatî û giyaneweran û her tiştekî di gerdûnê de xuya dike heye.”[12]

“Her wisa di zimanê 'erebiyê de jî peyva “eltebî'e” bi manaya xwezayê heye. Zanayên zimanê 'erebiyê li ser têgeha zimanî ya xwezayê bi manaya “eltebi' weltebî'e” rêkkeftine. Ew van gotinan di ferhengên xwe yên zimanî de wisa diyar dikin; “eltebi'” anko rewşt ku merem ji wê her tiştekî girêdayî bi rewştên mirovî ve ye û “eltebî'e” jî manaya her tiştekî di vê gerdûnê de dide.”[13]

Peyva “xweza”yê di piraniya zimanan de bi du manayên cuda hatiye wergirtin.

### 2.1.1. Xweza di Hundirê Mirovan de

Merem ji vê rewşt, mîzac û rewşa derûnî ya mirovan di hemî kar û reftar û livînan de ye, mîna kesekî serbixwe an dijwar, kesekî geşbîn an reşbîn, … Ev di hindek gotinan de diyar e, dema dibêjin ku filan kesî/ê tebî'etekî baş an jî tebî'etekî xerab heye.

### 2.1.2. Xweza ji der ve

Ev hemî gerdûnê vedigire anko tiştên ji derveyî hizra mirovan bi rengekî madî vedigire û li dû qanûnan kar dike û diyardeyên cur bi cur bi xwe ve dibîne. “Hindek kes mirovan bi elementekî xwezayê dadinin û hindek kes jî mirovan ji xwezayê cuda dikin, her çend ku mirov elementek ji xwezayê bi xwe ye.”[14] Ye'nî her çend ku mirov ji

---

12 Httpsi//ar.wikipedia.org/wiki/el-tebîe

13 Ibin Menzur, lîsan, *el-Ereb el-Muhît*, 2/567 – 568. Made “el-tebi'” tac el-'urus, el-Zubeydî, Mihemed Murteza, r.438-439.

14 Selam, Kwêstan Cemal, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da* ‘1930-1960’, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1996., r. 50.

elementên xwezayê peyda bûye, lê tiştê girîng ew e ku mirov xwedanê mejiyekî pêşketî û hizreke berfireh û vekirî be. Merema me di vê mijarê de ya duyê ye, anko xwezaya madî ya ji derve ye.

Xweza bi gelek rengan hatiye pênasekirin û ev yek di rûpelên borî de hatiye xuyakirin.

Sererayî vê yekê, xweza “her tiştekî ku di vê dinyayê de hatiye çêkirin, ji bilî mirovan, an jî her tiştekî ku helbestvan ji xwe re bikin mijar an salox bidin an jî bi hûrî hizir di wan de bikin”[15].

Merem ji xwezayê hemî tiştên li derdora me ne ku em hest bi hebûna wan dikin, ji bilî mirovan. Bi rengekî giştî, xweza ji du beşan pêk tê:

#### 2.1.2.1. Xwezaya Bêgiyan

Element û diyardeyên vî cureyê xwezayê gelek in, wekî erdî, asmanî, stêran, deryayan, rûbaran, bayî, golan, deştan, çiyayan, nihalan û hwd. Ku ev hemî cureyên xwezaya rastîn in. Xwezayên bidestçêkirî jî di xana vî cureyî de ne, wekî xaniyan, gundan, kelehan, şûnwaran, bendavan...

#### 2.1.2.2. Xwezaya Zindî

“Ev cureyê xwezayê hemî giyaneweran vedigire, çi li ser erdî bin an jî di avê de, mîna bilbilan, şêran, nehingan, masiyan û hwd., ji bilî mirovan.”[16]

## 2.2. BEŞÊN XWEZAYÊ

Bi awayekî giştî xweza ji du cureyan pêk tê:

---

15 Micdî Wehbe, Kamil Muhendis, *Mektebet Mu'ecem el-Mustelehat el-Erebiye fi el-Luxe wel-Edeb*, Libnan, t.2, 1970, S.35.

16 Mehmûd, Fazil Mecîd, *Siroşt le Şî'rî Goran Da, Nameyêkî Master*, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1990, r.5.

### 2.2.1. Element

Ev cure wan çeqan vedigire yên ku li ber çavan cihgir û neliv in û her hene û çi caran ji nav naçin anku hebûna wan ne demkî ye, wekî hesareyan, rojê, heyvê, stêran, asmanî, çiyayan, deştan, nihalan, şikeftan, kaniyan, çeman…

### 2.2.2. Diyarde

Ev cure di dema guherînan de peyda dibin û her wisa demkî ne. Peywendiya wan bi sedem û encaman ve heye ku bi elementên xwezayê ve girêdayî ne. Di encama çalakiyên elementên xwezayê de, ev diyarde serê xwe hildidin û her wisa her bi encama wan ji nav jî diçin. Her wisa dema hebûna wan li dû diyardeyan dimîne û her li dû wan tên guhertin jî, mîna şev û rojan, ewr û birûskan, berf û baranan, ba û baroveyan, lehî û tofanan, bihar û havîn û payîz û zivistanan hwd.[17]

17 el-Zubeydî, Kasim, Yasir, *el-Tebî'e fî el-Quran*,1980, r.9.

## 2.3. CUREYÊN XWEZAYÊ

### 2.3.1. Xwezaya Bêgiyan

Ev cure xwezaya bêgiyan vedigire, mîna rojê, heyvê, stêran, çiyayan, deştan, rûbaran, biyabanan, ba û baroveyan, avê…

### 2.3.2. Xwezaya Giyandar

Ev cure jî wan tiştên giyandar ên ku di nav xwezayê de dijîn vedigire, mîna hemî giyanewerên biçûk û yên mezin, giyandarên ku li ser pejahiyê û yên ku li ser dar û baran û yên ku di avê de dijîn…

Her di vî warî de, du nêrînên din jî hene:

1. Hindek kes tiştên bidestçêkirî yên mirovan jî didin pal xwezayê, mîna gundan, qesran, kelehan, bîran… Ew kes wan tiştan didin pal xwezayê ji ber ku ew tişt di bingeha xwe de nebûn, belkî ji encama çalakiyên mirovan ji bo rêxistinên jiyanê hatine çêkirin.

2. Hindek ji wan behsa giyanewerên kûvî dikin, bi taybetî wan di edebiyatan de giyanewerên kedî xistine pal hindekên dî anku ew giyanewerên kedî ji hev cuda dikin.

Rast e ku ev giyanewer jî di bingeha xwe de her kûvî bûne lê ji ber ku mirovan ji pêxemet pêdiviyên jiyana xwe ew kedî kirine, ew jî êdî bûne giyanewerên nav malan.

Em dikarin bibêjin ku temenê mirovî li beranberî temenê vê gerdûnê û xwezayê gelek kurt e û peywendiya mirovan digel giyaneweran her ji destpêka jiyana wan bûye.

## 2.4. XWEŞIKTIYA XWEZAYÊ Û XWEŞIKTIYA JINAN

### 2.4.1. Danberheviya Xwezayê û Jinan

Sebaret xweşiktî û rindiya xwezayê bi taybetî li cem helbestvanên romantîk û ka ew bi çi rengekî diçin di nav element û diyardeyên vê xwezaya şeyda de û tiştên xweşik ên mîna çiya û deşt û biyabanan derdixin, ji pêxemet wê yekê ye ku xweşiktiya xwezayê bi dest xwe ve bînin û bidin ber xweşiktiya jinan.

Li vê derê, em dikarin behsa elementekî nû bikin ku ew jî xweşiktiya jinan ji riwangeyê helbestan ve. Her wisa em dikarin behsa danberheviya wan her du xweşiktiyan -xweşiktiya xwezayê û ya jinan- bikin. Li cem helbestvanên romantîk, jin û xweşiktî û xweza bûne kevalek ji xwezaya Kurdistanê. Bi rengekî romansî yan bi dîtineke hevçerx û hizreke pêşkevtî, ew wêneyên jiyaneke geş û tijî hêvî û umîd diyar dikin.

Ji helbesta "Bestey Dildarî"yê

Le jêr asmanî şîna,

Le pal lûtkey befrîna,

Kurdistan geram,

Dola û dol pêwam,

Ne le şar û, ne le dê:

Nem dî kes

Wek tu ciwan bê!

Tuyt û bes

Kiçe kurdêk dil pêy şad bê,

Wek firîşte û perîzad bê![18]

Goran di helbesta “Bestey Dildarî”yê de wêneyekî balkêş ji xwezaya Kurdistanê dide ber çavan, mîna asmanekî şîn û gopê çiyayekî berfîn. Ew li vê derê xweşiktiya “yar”ê anku “jinek”ê dide ber xweşiktiya xwezayê. Ew newal newal di nav xwezaya Kurdistanê de digere û nabîne ku tiştek wekî yara wî xweşik be, ne li bajaran û ne jî li gundan.

Ye'nî bi vî rengî ji bo me diyar dibe ku xweza li cem Goranî xweşik e, lê xweşiktiya jinan bi ser hemî xweşiktiyên dî re ye. Anku bandor di mejiyê Goranî de namîne û di vî kevalî de jin zal dibe û pileya yekem werdigire, her wekî di wê helbesta li jor de jî xuya ye.

Ji helbesta “Diwa Sernic”ê

Wa êsta ebînî gîrodey dawim;

Le ber dem ciwanêkî wek tuy dilnerma,

***

Ey qij zerd, ey gerdin benaz lar girtû,

Dîwêkim le basa tuy, dîwêk bax e;

Ekeme heç dîwêk nîgay arezû:

Bo giyanî “qefesî”m serçawey ax e![19]

Her li destpêkê Goranî viyaye xwezayê û jinan bide ber hev û wan her duyan wek hev bike, lê li dawiyê her bandora jinan di mejiyê Goranî de zêdetir bûye. Bi vî rengî, em dikarin bibêjin ku wî di dema danberheviyê de xweşiktiya jinan hilbijartiye.

Her wisa Mueyed di helbesta xwe ya bi navê “Xatirxwastin”ê de dibêje:

---

18 Melay Kerîm, Mihemed, *Sercem Şî'rekanî 'Ebdula Goran*, Bergî Yekem, (Çapa5), Pexşangay Panîz, Tehran, 1393, r. 28.
19 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 206.

Dema roj

Xatra xo ji esmanî dixwazît

Esman

Hemî çirayên xo heldiket

Dema tu

Xatra xo ji min dixwazî

Min du çav hene

Ez herduwan vedmirînim[20]

Mueyed Teyîb di vê helbestê de danberheviyekê di navbera xwe û hindek diyardeyên vê xwezayê û yara xwe de dike. Rast e ku şevê jî dîmenên xweşik hene, mîna heyv û stêran. Dema ku roj xatirê xwe ji asmanî dixwaze, hindek hesare pêşwaziyê li asmanî dikin. Lê dema yara helbestvanî xatirê xwe ji wî dixwaze, ew bi ezîztirîn endamên laşê xwe pêşwaziyê li wê dike ku her du çavên xwe ji bo wê vedimirîne.

Ye'nî xweşiktiya yarê digel xweşiktiya xwezayê li cem helbestvanî wisa xuya dike. Dema ew dikevin beranberî hev, bandora xweşiktiya yarê li cem helbestvanî ji her tiştekî din zêdetir pawanî digire.

Her wisa helbestvanekî dî yê kurd dibêje:

Ji helbesta "Pirsyar"ê

Geşestêra cana zelal

Te dîtiye zeryek şepal

Enî kever ya çavbelek

20 Teyîb, Mueyed, *Ne Ba Min Swar Diket Ne Ax Min Peya Diket*, r. 108.

Bala zirav mîna melek?...

***

Dilbera min ya nazdar e

Weku heyvê şewqdar e

Lew dilê min birîndar e

Bo dîdarê bê hedar e… [21]

Hafizê Qazî di vê helbestê de danberheviyeke xweşik nîşan dide. Ew caran yara xwe mîna stêrka geş xuya dike, caran jî çavbeleka xwe ya bejnbilind û nazik bi periyan wesf dike. Li dawiyê jî, Qazî ji bo dîtina dilbera xwe û dîdara wê bêhedar e ji ber ku ew naşê xweşiktiya yara xwe ji xwezayê cuda bike. Ew dibêje ku nazdara wî mîna heyvê şewqdar e.

Ji helbesta "Bihar"ê

Siroşt hat pê xemilîn,

Heliz û takên çinara

Ser lêv û rexên rûbara

Xo dadihêlin jor da xarê

Hewlê diden bigehin yarê

Lêv û rûyan lê maçî ken

Kela dilî bo vala ken[22]

Dema Qazî dibêje, "Siroşt hat", merema wî ew e ku bibêje bihar hat. Ka çawa xweza bi hatina biharê bi cureyên gulan li ber lêvên rûbaran dixemile û hemî gij û giya

21 Qazî, Hafiz, *Dîwana Qazî bi Navê Êş û Jan*, Çapxaneya Xebatê, Dihok, 2004, r. 209.
22 Qazî, Hafiz, *Dîwana Qazî bi Navê Keser û Kovan*, Çapxaneya Xebatê, Dihok, 2004, r. 27.

û dar û ber xemla xwe dikin, helbestvan xemla yara xwe jî dide ber xemla biharê û li wê demê kela dilê xwe bi dîdara yara xwe vala dike.

"Mirov di serederîkirina digel xweşiktiya biharê de azad û serbest e, lê xweşiktiya xwezayê dikare di hemî cihan de her bi 'eynî rengî xwe dubare bike û bê ku em hest bi guherîneke mezin bikin ji ber ku em dizanin ku xwezayê aliyê hindurîn nîne. Heger xweza bêgiyan jî nebe anko zindî be û jiyan hebe, ew bêguman dil e… bê hest û soz û hiş e û nikare canê mirovan bişikîne."[23]

### 2.4.2. Têkelbûna Jinan û Sîfetên Wan bi Xwezayê re

Berî niha ji bo me diyar bû ku li cem helbestvanên mîna Goranî, Hafizê Qazî, Mueyed Teyîbî, Cegerxwînî û yên dî xweşiktiya jinan bi ser xweşiktiya xwezayê dikeve û xweşiktiya xwezayê li beranberî ya jinan çi girîngiya xwe nîne. Anku xweşiktiya jinan ji xweşiktiya xwezayê zêdetir bandor li ser hizr û bîrên wan kiriye.

Li vê derê ya girîng e em diyar bikin ku hemî helbestvanên romantîk xwezayê û xweşiktiya xwezayê wekî jinan dibînin ji ber ku xweşiktiya jinan û sîfetên wan di keresteyên xwezayê de berçav dibin. Em dikarin bibêjin ku xweza careke dî şîrîn dibe.

Her wisa helbestvan 'Ebdila Goran di helbesta "Paîz"ê de dibêje:

Paîz paîz

Bûkî pirç zerd

Min mat tu zîz

Her du hawderd

Min firmêskim, tu baranit

Min henasem tu bay sardit

Min xem tu hewrî giryanit

Diwayî naye, dadim dadit

23 *Kovarî Nûserî Kurd,* Jimare 15, 1979, r. 25.

Hergîz hergîz paîz paîz[24]

Goran di helbesta “Paîz”ê de xwe û paîzê hevderd dibîne; ew her du mit û zîz in, rondikên wan dibarin, henaseya wan bayê sar û xemên wan jî ewrên baranî ne. Ew û payîz her du xemgîn in ji ber ku gul û giya û dar zer dibin û hêdî hêdî ber bi mirinê diçin. Lê têkelbûna helbestvanan bi xwezayê re bi rengekî hunerî ye, ew payîzê wekî bûkeke porzer dibînin. Ye'nî ew û payîz wekî jineke hevparî nexweşî û eşkencedana jiyanê dibin û çi tixûb di navbera wan de namînin, anko helbestvan û payîz dibin du gul di yek qelbî de. Ye'nî em dikarin bibêjin ku werza gelarêzanê werza mirina gij û giyayan e û nîşana çûna ber bi nemanê ye, li cem helbestvanên romantîk ev yek xuya dibe. “Helbestvanên romansî sozeke rastîn ji hilgirtina xem û nexweşiyan heye. Dema ew behsa payîzê dikin, wê sozê diyar dikin. Ew nîşana wê rastiyê ye ku hevpêjneke rast di navbera hestên helbestvanî û xwezayê de heye...”[25]

Helbestvan Mueyed Teyîb di helbesta “Ew Canê min e Ne Paîz”ê de dibêje:

Eve ji wê şeva

Serê te

Li ser balgehê min nemay

Canê min

Bûye belgekê zer û pêtî

Xo havêtiye

Bextê hirr û bay

***

Ger rojekê

24 *Dîwanî Goran*, Sercem Berhemî Qoran, (Bergî 1), Mihemedî mela Kerîm, Bexda, Çapxaney Korî Zanyarî 'Îraq, 1980., r. 163.
25 Hemîd, Huseyn ‘Ebud, *el-Tebî’e fi el-i’ir el-Îraqî el-Hedîs*, Rîsalet Macistêr, Camî’et el-Besre, Kulyet el-Adab, 1984, s. 128.

Di ber pencera te ra derbas bû

Nebêje çi zwî belgên daran

Zer û sîs bûn

Çi zwî bû paîz[26]

Mueyedî ev helbest di dîwana "Ne Ba MinSiwar Diket Ne Ax Min Peya Diket"ê de belav kiriye. Mirov ji her demeke dî zêdetir bi şevê hest bi aramiyê dike. Şev ji bo hizirkirinê di jiyana raborî û serhatiyan de baştirîn dem e ji ber ku şev demeke hêmin û bêdeng e û mejiyê mirovî bi şevê safî ye. Lewma jî serhatî û bîrhatin baştir tên bîra mirovî, anku şev mewdayeke yan cihekî berfireh dagir dike. Mueyed di vê helbestê de bûye helbestvanekî romansî yê jêhatî û helwesta xwe bi hemî hest û nestên xwe têkelî xem û nexweşiyên payîzê kirine û paşî tev li xema yara xwe jî kirine.

Çavên yarê golek şîn e

Gemiyên vînê lê xemilîne

Mîna kaniyên pak zelal in

Çu pêşêlî di nav nîne…

Biriyên kêşay wek kivan in

Nû heyv qewsên yek şevî ne

Lêvên badayî renge al in

Mesteperwan dûr ketîne[27]

Hafizê Qazî di helbesta "Dilber"ê de çavên evîndara xwe bi rengê goleke şîn wesf dike, viyana xwe mîna kaniyên zelal wesf dike û birûyên yara xwe jî wekî heyva yekşevî wesf kirine. Em dikarin bibêjin ku Hafizî wekî kesekî şareza sîfetên jinan bi

26 Teyîb, Mueyed, *Ne Ba Min Swar Dike Ne Ax Min Peya Dike,* r. 113-114.

27 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 148.

rengekî baş digel xwezayê têkel dike. Her wisa di helbesta "Mamiz"ê de jî, ew jinan bi wesifkirineke xweşik û delal tev li xwezayê dike.

Ji helbesta "Mamiz"ê

Ho periya bejin zirav

Ey huriya rwîmet gulî

Çavbelekê şox û şengê

Zerya delal xaza dilî…

***

Gel dilberê di xewnan da

Nav paxilan desta digerim

Ser mermerê gulavkirî

Sor bijkojan ez diçerim [28]

28 Qazî, Haviz, *Dîwana Qazî*, r. 150.

## 2.5. XWEZAYA BÊGIYAN Û XWEZAYA GIYANDAR

### 2.5.1. Xwezaya Bêgiyan

Tiştê girîng li vê derê ew e ku helbestvanên romantîk yên kurdan bi çi awayekî ligel xwezayê kar dikin, xwezaya bêgiyan û xwezaya giyandar. Em dê her yek ji wan cuda wergirin. Di xwezaya bêgiyan de jî, em dê behsa element û diyardeyên her yek ji wan bi rengekî serbixwe bikin. Bêguman dema helbestvanên romansî temaşeyî xwezayê dikin, "axaftinê digel dar û gul û stêr û pêlên deryayan dikin."[29] Anku ew bi zimanê wan bersiva wan didin û ji nêz ve xemxwuriya xwe nîşan didin. Ye'nî dema helbestvanên romansî behsa mijara xwezayê dikin, ne wekî heyî behs dikin belkî ew karekî ligel wan dikin ku hestên xwe li nav xwezayê têkel dikin û hindek nêrînên xwe li ser wan dipejirînin.

Xwezaya bêgiyan ji hindek element û diyardeyan pêk tê. Anku ew diyardeyên ji elementan peyda dibin mîna hêvênê helbestan yan ji bo dewlemendkirina rihê helbestan li cem helbestvanan dibin kereste. Em dikarin bibêjin ku helbestvan îlhamê ji xwezayê werdigirin. Lê dema helbestvanên kurd temaşeyî xwezayê dikin, rengvedana dîmenên Kurdistanê dibe sedema wê yekê ku hindek wêne û tabloyan çê bikin. Bi wan dîmen û wêneyên xweşik, aliyê evîndariya helbestvanan li beranberî welat û niştîmanên wan xuya dibe. "Rengvedana xwezayê û dîmenên wê ji tabloya Kurdistanê bi xwe pêk dihat û aliyekî evîna helbestvanên me li beranberî niştîmanî nîşan dida. Xwe heger di hindek helbestan de jî ku bêguman em varêtiyekê di wan de dibînin awayekî revînê û xwedûrxistina ji jiyanê serê xwe hildabe jî, ew dîsa her bi miletî ve eleqedar bûye ji ber ku ewên ku ew pal dabûn û wisa li wan kiribû ku xwe bixin himbêza xwezayê ew azar û derdeserî bûn ku gelê wan tûş bûbû."[30]

#### 2.5.1.1. Elementên Xwezaya Bêgiyan

Wekî ku xuya ye, elementên xwezaya bêgiyan bi ser sê astan de parve dibin; asman, erd û av.

29 Selam, Mihemed Zexlul, *el-Neqd el-Edebî el-Hedîs*, dar el-Me'arif, Qahîre, t. 1, 1981, s. 129.
30 'Elî, Dilşad, *Dîlan Şa'îr û Azadîxwaz*, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1981, r. 13.

### Asman

Asman di helbestên nû yên kurdî de her çend gelek caran di helbestên xwezayê de hatiye, lê em qet çi helbestekê nabînin ku taybet ji bo asmanî hatibe gotin. Asman her dem wekî paşxaneyekê bûye, roj stêr û heyv di wî de derketine, ewr di wî de ketine livînê, bi zevî û deryayan re xwe li hev daye û aso çê kiriye lewma wesf û axaftina asmanî her dem bi elementên dî re girêdayî ye.

Her wekî Hafizê Qazî di helbesta "Bihar"ê de li ser asmanî û elementên wî dibêje:

Tîşka tava zêrîn

Nîva 'esmanê şîn

Berda ser şar û nizar

Davegeşên ronakdar[31]

Qazî di vê helbestê de behsa asmanî û elementekî wî dike ku asman e, anku pesna tîşka hetavê dide ku li nîva asmanê şîn dide şar û newal û zinaran. Lê sebaret rengê şîn, Qazî wî dide pal asmanî ku wekî diyardeyên fîzyayî lêkdan û şîrovekirinên xwe hene, her çend ku asman vala ye û çi reng nînin. Anku ew şînatiya ku çavên mirovî dibîne tenê rengvedana çavan e. Her çend ku merema Qazî ne ya fîzyayî û zanistî bûye, belkî merema wî ew bûye ku zêdetir xweşiktiyekê çê bike. Gelek caran dema helbestvanên romansî behsa rengê şîn dikin, merema wan derbirîna ji wan xem û kovanan e ku bi serê gelê wî hatine ji ber ku rengê şîn her ji kevin de nîşana xem û kovanan bûye. Dema kesek çûba ber dilovaniya xwedê, kes û kar û hezkiriyên wî cilikên şîn li xwe dikirin. Ye'nî rengê şîn hêmayê xem û nexweşiyan bû.

Her wisa Qazî di helbesta "Geşta Jiyanê" de behsa çend elementên asmanî dike:

Jêr 'esmanê saf û bijwîn

Cihên spehî, xewn pêvebîn

---

[31] Dîwana Qazî, *Keser û Kovan*, r. 26.

***

Taveheyva şev havîn

Bin 'esmanê bi stêr nexşîn

Bi min xoştir e, ciwantir e,

Bisebirtir e[32]

Qazî di vê helbestê de hindek elementên dî yên asmanî xuya dike, mîna heyv û stêran. Her wisa ew pesnan dike; dema mirov temaşeyî asmanê safî dike, bêhna mirovî fireh dibe. Xasime li jêr stêrên geş, dema mirov di şevên bitaveheyv ên havînê de dîmenên xweşik û balkêş dibîne, çi xem û nexweşî li cem mirovî namînin û mîna xewneke xweş li cem mirovî çê dibe. Em dikarin bibêjin ku di vî kevalî de wekheviyek di navbera mirovî û elementên asmanî de xuya dibe.

**Roj**

Her ji serdemên destpêka hebûna mirovan, rojê girîngiya xwe li cem mirovan peyda kiriye ji ber ku roj hêmayê manê û jiyanê ye. Her wisa mirovan di destpêka jiyanê de roj peristiye û navên taybet jî ji bo wê danîne. Hêdî hêdî rojê cihê xwe di nav edebiyatê de û taybet di nav helbestan de kiriye. Di efsaneya Gilgamişê de ku wesfa Gilgamişî bi palewanekî tê kirin, ji wî re digot: Şemiş-Roj. Asmanî xweşiktî bi wî da û erdî jî qehremanî... Xwedayê Şemiş–Rojê li cem Îraqîyên kevin xwedayê dadiyê û mafan û dana îlhama qanûna şerî'et bû. Gelek peristgeh jî jê re hatibûn avakirin, wekî peristgeha Subyarê û ya Larsayê. Li cem Sumeriyan, ji xwedayê rojê re Uttu tê gotin."[33]

Roj di helbestên kurdî de ji bo gelek mereman hatiye bikaranîn, mîna azadiyê, serxwebûnê û ronahiyê. Anku roj hêmaya manê û jiyanê û berdewambûnê ye. Her wisa dema roj li cihên sar û çiyayî derdikeve, ew nîşana heliyana berfê û mizgîniya hatina biharê ye. Ye'nî hilatina rojê nîşana serkeftinê û xweşiyê û jidayikbûnê ye. "Avabûna rojê –pitrî ya caran– tev li xem û nexweşiyan dibe û eynî nexweşiyê bi ser

[32] 'Eynî Çavkanî ya Berê r. 59-61.

[33] Baqir, Teha, *Melhemet Gilgamiş,* t. 2, dar el-Huriye lîl-tîba'e, Bexdad, 1980, r. 77.

helbestvanan de xuya dike. Bi vî rengî, avabûna rojê dibe hêmaya mirinê û nemanê. Her wisa hilatina rojê dibe hêmaya manê û jiyanê."[34] Helbestvan Mueyed Teyîb di helbesta xwe ya bi navê "Mizgîniya Rojê" de dibêje:

Şengeperî..

Dema mizgînî ya rojê dihêt

Hêj nehatî

Tariya şeva .. Hindî jê dihêt

Xo bihêz diket

Sed astenga bo rêz diket

Lê netirse û

Hêdî serê xo bihelîne

Da ji gerdenê bikem xêve[35]

Di vê parçehelbestê de, Mueyed mîna hostayekî şareza rojê û yara xwe tevlihev dike, mizgîniya hilatina rojê bi dîdara yara xwe ve girê dide. Anku hilatina rojê hêzeke dî dide helbestvanî ka çawa şev şerî bi rojê re dike, lê roj her dihele. Helbestvan wê yekê xuya dike ku pêdivî ye kesên evîndar ji pêxemet yara xwe li beranberî hemî astengan xweragir be.

Pîremêrd di helbesta "Rojî Taze"yê de hatina biharê û hilatina roja nû tevlihev dike:

Rojî tazey salî tazey ême hat

Roj hellat rojî hellat, serma hellat

Bay behar hat xakî zîndû kirdewe

[34] Hemîd, Huseyn 'Ebud, *el-Tebî'e fî el-Şi'ir el*-Îraqî el-Hedîs, r. 59-60.
[35] Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir,* r. 151.

Boye nêrgis çawî mestî kirdewe

Newciwanî hat û pîrî birdewe

Tîşkî roj derkewt temî labirdewe

***

Burcî berxe, roj serefrazî eka

Berxî êmeş boye wa bazî eka[36]

Pîremêrd şîrovekirineke xweşik dide “rojî taze”, wê beranberî nemana sermayê bi hatina xêr û bêr û bereketan wesf dike. Têkelkirina bayê biharê û keskatiya erdî û bişkivîna nêrgizan bi ciwantî û pîrîtiyê re tevlihev dike. Em dikarin bibêjin ku ew xwezayeke rengîn dixe ber çavan, mîna ku mirov bihuştekê temaşa dike. Dema ew behsa berxan dike, merema wî nifşê kurd e, her wekî di pendên pêşînan de hatiye gotin; berxê nêr bo serbirînê ye yan bi wesfeke felekiyane dike mîna du berxan; berxek li asmanî û berxek li ser erdî ku ev yek dibe hunereke helbestvanan û di 'eynî demê de mîna wesfeke felekiyane.

**Heyv**

Heyvê taybetmendiya xwe li cem helbestvanan heye. “Heyv dilbera helbestvanan e û di şevên dirêj de hevala wan e. Ew êş û azarên xwe ji heyvê re dibêjin, ta wê radeyê ku helbestvan zêdetir ji yara xwe bi heyvê ve girêdayî ne.”[37] Ji ber ku nêrînên helbestvan li ser heyvê ne wekî nêrînên wan ên li ser rojê ne. Piraniya caran dema heyv ron dibe, tiştên herî girîng li cem helbestvanan çê dibin. Xasime eşqa şevê, Nazik Elmelaîke ku nêrîna wê ji bo heyvê hindek tiştên balkêş xuya dike, dema dibêje: “Helbestvanan hez li ser rojê nîne ji ber ku roj xewn û xeyalên helbestvanan xirab dike, anku heyv û şev li cem helbestvanan cihê aramiyê û xweşiyê û dahênanê ne.”[38] Piraniya caran helbestvanên romansî penaya xwe dibin ber navê heyvê ku

---

[36] *Pîremêrd,* Faq Huşyar û Mehmûd Ehmed Mihemed, Bexda, 1990, r. 139.
[37] Hemîd, Huseyn ‘Ebud, *el-Tebî’e fî el-Şi’ir* el-Îraqî el-hedîs, r. 62.
[38] 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 62.

elementekê xwezayê ye û bi dîmenên xwezayê re derbirînê ji hestên xwe dikin an derdê dilê xwe jê re dibêjin. Ew di şevên dirêj de yek derd û yek xem bûne.

Bêkes wekî helbestvanekî zîrek bi xweşikî behsa vî elementê xwezayê dike. Wî helbesteke binavûdeng li ser heyvê nivîsiye, dibêje:

Ey mang min û tu her dû hawderd în

Her dû giriftarî yek ahî serd în

Tu wêll û reng zerd be asmanewe

Minîş derbeder be şaranewe[39]

Weku xuya ye bêkes di vê helbestê de bi heyvê re dikeve nîqaşê û ji wê re dibêje ku ew û heyv her du di vê mijarê de hevxem, hevderd, bêkes û bindest in; yek ji wan li asmanî ku heyv e û yek jî di nav bajaran de ku helbestvan e. Helbestvan penayê dibe ber heyvê ji bo ku xema dilê xwe bigihîne, paşê ji heyvê dixwaze ku ew jî serpêhatiya xwe ji wî re bibêje ka çima ew rengê zer û lawaz bi ser wê de hatiye. Karesat, şehîd, derbiderî, çavên bigirî û hêrsên ku hatine ser Kurdistanê bûne sedema wê yekê ku rengê zer xuya bibe. Her wisa ew "ciwanî bays" çê dike, ye'nî rengê zerê heyvê bi wan xem û derdên ku bi serê gelê kurd hatine re tevlîhev dike.

Mueyed Teyîb di helbesta "Şev û Bêdengî û Stranek"ê de behsa heyvê dike ku yek ji elementên xwezayê ye:

Ne heyva geş û diyar e

Tava xo bo me darêjît..

Kew biçerin.

Ne rûbarê me rûbar e..

Lawk û heyrana bêjît..

Evîndar bên li ser kinarên wî bigerin

---

[39] *Dîwana bêkesî*, (Çapa2), Mihemedî Mela Kerîm, Çapxaney el-Edîb, 1989, r. 151.

Bêdengî ye..

Hemî dixewin, hemî dixewin![40]

Helbestvan xuya dike ku dema ev elementê xwezayê "heyv" bi şevê roniya xwe bernede, şevê çi xweşiktî namîne. "Şa'rê ku dostê xwezayê nebe û evîna dîmenên xwezayê negihe kûrahiya dilê wî, ev cureyên wesfan bi wî ve nayên."[41] Lewma xweza li cem helbestvanan bûye aliyekî serekî yê xweşiktiyê, wan pirî caran dîmenên xweşik xuya kirine, mîna heyvê, rojê, stêran... Wan ew dîmen wergirtine ji bo ku bala xwendevanan bikêşin ser xweşiktiya xwezayê. Her wisa helbestvan danberheviyekê di navbera tava heyvê û qebîna kewan û herikîna rûbarî û dilê evîndaran de çê dike.

**Stêr**

Bêguman ev element ji mijarên asmanî ye, girîngîdana bi vî elementî li cem mirovan ji bo serdemên herî kevin vedigere ku gelek mefa ji bo zanyaran li qonaxên şevê û demên salê ji hilatin û avabûna wan wergirtiye. Taybet ji bo diyarkirina qonaxên şevê, tenê stêr wekî rêber ji bo karwaniyan bi kar hatiye ji bo ku rêya xwe winda nekin û taybet li deverên deşt û biyabanan.

Her wisa mirovan her ji kevin de bawerî hebû ku stêr kartêkirinê li ser jiyana mirovan dikin. Taybet hindek mirov hebûn ku bi vî karî radibûn, ji wan ra xêvzank digot. Karê wan diyarkirina paşeroja mirovan bi rêya stêran bû ka gelo ew mirov dê di jiyana xwe de dewlemend be yan hejar, dê bextekî spî hebe yan bextekî reş û hwd. Lê bi xêra zanistê feleknasiyê, ew bîr û bawerî hatin guhertin.

Gelo stêr li cem helbestvanan bi çi rengî bi kar hatiye? Em dikarin bibêjin ku stêr jî mîna heyvê û rojê pirî caran di şevên nexweş, tengav û dirêj de bûne heval û hevxemên helbestvanan. Helbestvanên romansî penaya xwe biriye ber wê, ji pêxemet wê yekê ku xem û keser û kovanên dilê xwe ji bo wan darêjin û barê xwe yê derûnî sivik bikin. Hindek caran an hema bibêje pirî caran stêr wekî elementekî xweşiktiyê bi dîmenên asmanê bijûn re hatine razandin û tabloyên xwezayî jê re hatine çêkirin.

---

40 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, r. 115.

41 Qeredaxî, 'Elî Şêx 'Omer, *mewlewî û Siroşt*, Çapaxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1978, r. 37.

Mueyed Teyîb sebaret vî elementî di helbesta xwe ya bi navê “Stêr”ê de dibêje:

Stêr

Kulîlkên şevê ne

Li baxçeyên esmanî

Hemî şevên sahî

Dilên şikestî

Li hindav difirin û

Berê spêdê

Di himbêza wan da diçine lîsî[42]

Mirina stêran li cem romantîkan bûye nîşana nemanê, lê Mueyed Teyîb bi rengekî dî temaşe dike. Ew stêran wekî çirayeke hêvîdarîtiyê û bextewariyê bi dilên şikestî dide anku mirina stêran û vemirandina çirayê umêdan bi hev re girê dide. Ye'nî stêr bi hevderdên xwe dibin nîşanên hêvîdarîtiyê, umêdewariyê û bextewariyê.

Her wisa Pîremêrd jî di helbesta xwe ya binavûdeng “Min û Estêrekan”ê de dibêje:

Estêre berzekan edrewşênewe be şew

Wek min bedaxewen, ne sirewtiyan heye û ne xew

Çend salle aşnay şewî bêdarî yektir în

Wek serser în, şewê serê nakeyne serser în[43]

Pîremêrd di vê helbestê de keser û kovanên xwe û stêran di yek qalbî de dadine, mîna ku rondikên çavên xwe û rondikên stêran û avekê li ser gij û giyayên biharê çê

42 Teyîb, Mueyed, *Piling Dema Birsî Dibin ... Mirov Dema Têr Dibin*, (Çapa 1),Weş. Spîrêz, 2012. , r. 150.
43 *Dîwanî Pîremêrd*, r. 191.

dike anku ew giryana xwe û stêran dike baran û bi ser erdî de dadirêje. Ye'nî Pîremêrdê helbestvan ji bo rewşa miletê xwe rondikan dibarîne û kartêkirin li ser stêran çê dibe. Dema stêr wî dîmenî dibînin, ew jî rondikan dibarînin ser gij û giyayan. “Bi rastî ev parçehelbesta Pîremêrdî di asmanê edebiyata kurdî de stêreke birîqedar e û dîroka edebiyata kurdan dikare ji kûrahiya dilê xwe şanaziyê bi vê parçehelbestê bike ...”[44]

Goran di helbesta xwe ya “Ey Şewqî Gelawêj”ê de dibêje:

Ey şewqî gelawêjî beyan nûrî nîgahit!

Ey 'etrî seba boy nefesî zulfî siyahit![45]

Goran hesteke romantîkî di vê parçehelbestê de nîşan dide. Her wisa wî stêra gelawêjê wekî alavek ji bo wekhevandinê bi kar aniye û bi derbirînê tîşka bextewerî û hêvîdariyê bi çavên dilbera xwe daye. Vêca bi van dîmenan xwe berdaye nav komeke dîmenên din ên xwezayî û yek yeke mîna zêrekî bixe gerdena dilbera xwe ji ber ku li cem Goranî xwezaya bêyar çi xweşiktiya xwe nîne û her xweşiktiyeke xwezayê hebe şewqa xweşiktiya yarê ye.

Şêx Nurî Şêx Salih di helbesta “Gelawêj”ê de dibêje:

Weha diyar e min û tu.. Min le erza, tu le gerdûna

Le sergerdaniya wek yek, le deryay bê binî bûna

Teqllamane herdû, min le şwên amal û tu alam

Bellam wek mubteday bê xeber, axazî bê encam[46]

Şêx Nurî gazinan ji stêra gelavêjê dike, dixwaze wekî kesekî hevderd û hevxem bibe. Paşê ew danberheviyekê di navbera xwe û stêra gelawêjê de dike, mîna kesekî cegersotî û yek hev dibînin, lê li dawiyê bêumêdiyekê xuya dike û hemî tiştan bêencam dibîne.

---

44 Sucadî ,'Elaedîn, *Mêjûy Edebî Kurdî*, (Çapa 2), Bexda, 1971, r. 471.
45 *Dîwanî Goran,* r. 65.
46 *Şêx Salih, Şêx Nurî*, Azad 'Ebdilwahid, Bergî Yekem, Beşî Duwem, Bexda, Çapxaney (Cahiz), 1989, r. 110.

**Erd- Ax**

Merem ji vê mijarê hemî ew elementên ku girêdayî erdî ne, mîna deştan, newalan, çiyayan, şikeftan, hwd. Em dê yek bi yek behsa van elementan bikin, dema em digehin ser mijarên wan. Her wekî ku xuya ye erd ji van dîmenên curbicur pêk hatiye û her ji kevin de wan bala mirovan kêşaye û mirov bi wan daxbar bûye.

Li vê derê em tenê behsa mijara erdî wekî ax dikin ji ber ku cihê vehewiyana mirovan ev ax bûye. Her wisa ev ax çavkaniya serekî ya xwarinê, çandinê û akincîbûnê ye, lewma pirî caran ax li cem helbestvanên romansî bi dayikê hatiye wesfandin û xasime bergiriya ji ax û niştîmanan mîna bergiriya ji dayikê ye. Ji pêxemet vê axê, mirov bibuhatirîn tiştê xwe ku canê mirovî ye pêşkêşî axa welatê xwe dike.

Helbestvan Kamîran Bedirxan di dîwana *Dilê Kurên Min*ê de dibêje:

Hej welatê xwe bike

Di mirin û jînê de

Binivîse!! Bixwîne

Xebat, xebat xelat e

Lo kekê min megirî

Dayika te welat e[47]

Hemî helbestên Kamîran Bedirxanî ji baweriyeke rasteqîne û zelal hatine pejirandin, lê di vê helbestê de dayikê û welatî tevlihev dike. Mirov dikare bibêje ku van hêvî û xweziyan hêlaye ku diktor Kamîran şevên xwe biheyrîne û rojên xwe bijîne ji ber ku pîroziya axa welatê wî mîna peleke germ xwe diavêje dilê wî. Çi carekê wî bizav nekiriye ku vî barî bide pişta kesekî dî. Wî her dem xwestiye ku buhayê xwendinê û nivîsînê nîşanî takê kurd bide ku mîna çekekî berevaniyê bi wan ji welatê xwe bike.

47 Bedirxan, Kamîran, *Dilê Kurên Min*, Têlî Emînî ji Tîpên Latînî Veguhertiye û Vekolaye, Darul-Huriye, Bexda, 1991, r. 20.

Her wisa Pîremêrd di helbesta "Xakekeman"ê de dibêje:

Ax bo em xak e, dax bo em xak e

Hîç kes nazanê: emende çak e

Ta hellkollê, awî lê derdê

Ta awî bidey gulle her gulle her derdê[48]

Hemî helbestên Pîremêrdî yên girêdayî axa welatî ji hestên wî yên paqij û derûnê wî yê zelal zane, xasime di vê helbestê de. Wî pîroziya axa welatê xwe kiriye havênê hemî helbestên xwe yên neteweperweriyê. Pîremêrd ji pêxemet vê axê axîneke kûr ji dilê xwe berdide. Heger mirov bi nerîneka hûr temaşeyî vê axê neke, mirov nizane ka ew çend bi qedr û qîmet e. Lê piştî vê yekê, helbestvan wesfa behsa aloziya nav welatê xwe dike ku ew bi xwe bê aramî û azadî di nav wê de dijî. Ye'nî axa welatî tenê xweşik nabe, heger mirov azad û serbest di wê de nejî. Her wisa hingê axê çi mefa li cem mirovan nabe.

Her wisa Celadet Bedirxan di helbesta "Loriya Şehîdan"ê de dibêje:

Serê çiyan û zozan li wan dinêrin

Siha tirba wan li wan xweş tê

Ji ber ku sînga milet in, ew tirb û gor

Mîna taceke zêrîn roj lê dide

Dema ko dinya dibe êvar û roj dibe sor[49]

Mîr Celadet di vê helbestê de pesneke xweşik dide wan mêrxas û 'egîdan ên ku ji bo tirba pîroz canê xwe dikin qurban. Ev tirb mîna taceke zêrîn li ser serê wan dibiriqe. Helbesta "Loriya Şehîdan"ê ji helbestên helbestvanê fransayî yê mezin Victor Hugoyî hatiye wergirtin. Di ciwantiya xwe de jî bi helbestên xwe yên spehî û hêja

48 *Dîwanî pîremêrd*, r. 159.
49 Mizûrî, Azad 'Ebdul'Ezîz, *Celadet û Şi'ir,* Lêkolîneke Şirovekarî, r. 146; bê îmze, kovara hawarê, j. 27.

binavûdeng bû. "Victor Hugoyî ji welatê xwe, fransayê, gelek hez dikir û mirov di ş'rên wî de dîroka fransayê dibîne."[50]

**Çiya**

Ev element her ji kevin de li cem mirovan bûye cihê tirsê û heybetê û hindek caran jî bûye dîmenekî balkêş, xasime ku deverên çiyayî girîngiya xwe heye mîna ku berf û baran zêde li wan deran dibare ku dibin çavkaniyên avên svererd û binerd. Çiya ji bo helkevtên xwezayî bûne cihê serdan û seyranan. Her wisa çiya bi samanên kanzayên xwezayî dewlemend in. Deverên çiyayî ji bo berhemanîna berhemên çandinê girîng in. Ev ji aliyê aborî ve, lê merema me ji çiyayan ew e ku ta çi radeyê kartêkirinê li hizrên mirovan dikin û ka çawa wan hizran dilivînin û hizr û derbirînên xweşik li cem mirovan çê dikin û zêdetir hestên xweşiktiyê werdigirin.

Xasime deverên çiyayî bûne cihê girîngîpêdana helbestvanan ji ber ku her gaveke mirov bi ser çiyayan dikeve û bilindtir dibe, dîmenekî dî û asoyeke dî bi ber çavên mirovî dikevin û xweza li ber çavên mirovî rontir dibe ji ber helbestvanan bilindî û zehmeta biserketina çiyayan ji bo hindek meremên dî bi kar anîne. Gelo mirov mîna çiyayan kesekî bihêz û xweragir û bilind tê ber çavan? Mirov pirî caran şanaziyê bi çiyayan dibe û ew hêzekê li beranberî dijminan didin mirovî. Helbestvan Mueyed Teyîb di helbesta "Qif Litiftîş"ê de dibêje:

Siyarê me xo havête bextê çiya

Ew çiyayên hêşta bilind

Hêşta befrê û xwîna gerim

Serê wan sor û spî dikir

Qet ji cihê xo nelivîn..

Sehmê bar kir[51]

50 'Eynî Çavkanî ya berê, r. 148.
51 Teyîb, Mueyed, *Piling Dema Birsî Dibin ... Mirov Dema Têr Dibin*, r. 16.

Em dikarin li vê derê bibêjin ku helbestvan şanaziyê bi çiyayan dibe ji ber ku çiya li beranberî stemê û zordariyê hêzê bi mirovî dide. Vî elementî wekî nîşana xweragiriyê her ji kevin de bala helbestvanan kêşaye. Hindek caran helbestvan danûstandinê bi çiyayan re dike û mîna kevalekî berçav dike, weku dema ew berfa serê çiyayan tev li xwîna germ dike. Merema helbestvanî ew e ku sehmê ji cem wan qehremanên canê xwe kiriye qurban bar kiriye. Mueyed her wisa evîna xwe ya li beranber çiyayan di helbesta berfê de jî xuya dike:

Ger ez mirim..

Hûn bûne rêz, we ez birim..

Wesyeta min li hewe ew bît:

Min veşêrin

Li kopê çiyayekê befrîn..

Befr û kevî jê bar neken..[52]

Di van çend rêzikan de, ew peywendiya mikom û bihêz a di navbera helbestvanî û xwezaya çiyayan de berçav dibe.

Her wisa helbestvan Bedirxan sindî jî di helbesta "Şoreşa Eylolê" de 'eşqa xwe ya li ser çiyayan xuya dike û dibêje:

'işqa çiyayan 'işqeka kwîr e

Çendî pê bêjin hêşta ya dwîr e

Di dilê li nav dilê kurda bû

Ew û çiyayan peyman girê dabû[53]

Helbestvan di van çend rêzikan de 'eşq û viyanên çiyayan li cem kurdan berçav dike û xuya dike ku çiyayan pîroziya xwe heye. Mirov xwe bi çiyayan bihêz û bilind

---

52 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, r. 43-44.
53 Sindî, Bedirxan, *Hozanêt Min*, (Çapa1), Weş, Spîrêzê – Dihok, 2009., r. 131.

dibîne û şanaziyê bi soz û peymanên xwe dike, her wekî mala yekê ya kurdan çiya bûne ji ber ku çiya her dem mîna hevalên hevxem û hevderd bûne.

Helbestvanekî mîna Goranî ku bi helbestvanê xwezayê û xweşiktiyê tê nasîn li ser çiya gotiye:

Bonî dirext û dewenî naw kêw

Tazey kirdewe newgiyanî serlêw

***

Biro! Bem renge, pêçawpêç, dey dey,

Emca leser çax elên oxey[54]

Di sefera Qeredaxê de, Goran hindek awiran bi çiyayan dide; wan dixe nav tabloyan û wesf dike, mîna zehmetî û evrazî û nişîviyên çiyayan û ka bi çi rengî mirov bi ser wan dikeve û çend zehmetê dibîne. Lê dema mirov bi ser wan dikeve û digehe ser pîtkan û temaşeyî xwezayê dike, bîrdankeke nû li wan bilindahiyan li cem mirovî xuya dibe. Mirov mîna dinyayeke dî hest dike.

**Gil û Giya**

Ev element hemî dar û bar û şînkatî û tiştên çandinê vedigire. Bêguman gil û giyayan roberekî berfireh di helbestên nû yên kurdî de vegirtiye. Her helbestvanekî bi dehan caran behsa darên çinarê û berûyê û gwîzê û yên dî kiriye, behsa cureyên gulan kiriye mîna nêrgiz û beybûn û çîmen û gulçîçek û yên dî û behsa cureyên fêkî jî kiriye mîna trî û sêv û hinar û xoxan û yên dî. Ev mijar gelek berfireh e û lewma em nikarin behsa hemî elementên wê bikin, lê em dê hindek mînakan jê werbigirin.

54 *Goran*, Sercem, r. 140-141.

**Dar**

Dar mîna elementekî xwezayî bi rengekî giştî di nav helbestên helbestvanan de xuya dibe. “Çi wekî elementekî binecih ê xwezayê û çi wekî çavkaniya xwerek û fêkî sotemenî û sîber û yên dî.”[55] Mueyed Teyîb di helbesta “Dar”ê de wêneyekî xweş datîne ber çavan, dema dibêje:

Ne rondik in ne xwîn

Ne hawar in ne nalîn

Lê kî nabêjît

Dema bejna wan bi axê dikevît

'erd û esman bo nagirîn[56]

Helbestvanek wê yekê xuya dike ku guneheka mezin e mirov elementekî xwezayê, mîna darekê, bibire. Rast e ku daran çi desthilat li beranberî mirovan nîne. Çi rondik û xwîn û hawar û nalîn ji wan nayên bihîstin, lê guneheke mezin e ku mirov bejna wan bi biviran bibire û li axê bide. 'Erd û asman mîna dayik û baban hêstiran ji wan re dibarînin. Ev wêne dibe berçavkirina wefadariya mirovên kurd bi xwezaya bêgiyan re ka gelo çend bi hevnifşê xwe re aştîxwaz e.

Her wisa Cegerxwîn di rasta dar û barên xwezaya Kurdistanê de dibêje:

Kurdistan pir xweş û geş ez jêre pir dinalim

Ew estanê kurde şêrîn deşt û zinar

Zinar û bax û bustan zeytûn û sêv û hermê

Hince û xox û mişmiş bihuk û gwîz û hinar[57]

[55] Selam, Kwêstan Cemal, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da*, 1996, r. 87.
[56] Teyîb, Mueyed, *Piling Dema Birsî dibin ... Mirov Dema Têr Dibin*, r. 148.
[57] Cigerxwîn, *Agir û Prûsik*, r. 26.

Cegerxwîn wesfeke xweşik dide xwezaya Kurdistanê, taybet wî fêqyê di nav bax û bostanan de. Xwezaya Kurdistanê ji bo hemî helbestvanên romantîk her dem bûye mijareke serekî ji ber ku Kurdistan mîna bihuşteke xwedî çiya û dol û newal û kanî û rûbar û hemî cureyên dar û baran e. Ev dibe sedema azirandina hestên helbestvanekî mîna Goranî ku di rasta vê mijarê de dibêje:

Le dirext eda şiney bay seher

Cim û colyetî çeşnî sewday ser[58]

Daran jî mîna her elementekî dî di helbestên nû yên kurdî de bi rengekî zindî kar li xelkî kiriye û pirî caran rihê dide ber wan û hevfehmandinê di navbera helbestvanî û dar û baran de xuya dike.

**Gul**

Bêguman gulan gelek reng hene. Gul di helbestên kevin û yên nû de pirî caran dubare bûne. Çi bi merema xwe ya giştî û çi xesletên wê çi jî gulên taybet û ji bo meremên taybet, diktor Marûf Xeznedar du nivîsarên têr û tesel li ser gulan û cureyên wan û çawaniya bikaranîna wan nivîsîne, li ser Nalî û Hemdî: "Nalî Çon Gol Debînê", "Gul di Helbestên Helbestvanê Kurd Hemdî". Helbestvanên klasîk zêdetir wekî keresteyê şibihandinê gul bi kar aniye, ji der ve wesf kiriye, bi gulan re têkil nebûn û neçûn nav wan anku serederiyeke ruhî di navbera gulan û xwezayê û gulan û helbestvanan de peyda nekiriye."[59] Her cureyekî gulan bûye nîşanek û derbirîn tiştekî kiriye. Ji bo nimûne, gula rengê wê mor bûye nîşana nexweşiyê û gula sor bûye nîşana evînê û dildariyê. Lê di helbestên kurdî de pirî caran gula sor bûye nîşana xwîna şehîdan ji ber ku rengê xwîna şehîdan wekî rengê gulên sor e. Gulnêrgiz pirî caran bi çavan hatiye şibihandin, lê di edebiyata cîhanî de nîşana xweperestiyê ye mîna efsaneya nêrgizê ku ji bo yewnanan vedigere. Gulberoj jî ku bi rojê re dizîvire bûye nîşana perestinê.

Dema Mueyed Teyîb di helbesta "Buharvano"yê de behsa cureyên gulan dike, wî gelek merem hene.

[58] Goran, *Sercem*, r. 131.
[59] Selam, Kwêstan Cemal, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da*, r. 90.

Çi şînî ye û çi zêmar e?

Binefş û nêrgiz çirmisîn..

***

Buharvano

Buhar nîne

Me ya dîtî buhar şîn e..

Ne ya sor e tijî xwîn e!

***

Gotin:

“adarok bo me şîn kirin”

Lê adarok..

Her li roja diwê mirin

Berze kirin[60]

Mueyedê helbestvan gelek caran navê hindek gulên taybet yên xwezaya Kurdistanê di helbestên xwe de bi kar anîne, lê merema wî ew e ku bi vê rêyê rewşa miletê xwe ron û zelal bike. Di sala 1974an de Kurdistan di gera xwînê wer bûbû, hêşta rejîma Be'syan digot “bihar e” û xayînên kurd jî li wan vedigeriya digot “bihar û aştî” ye. Lê helbestvanê me vê yekê red dike û dibêje ku bihar xweşî û tenahî ye, ne xwînrêtin e. Paşê ew penayê dibe ber sê gulan ku binefş û nêrgiz û adarok in. Ev gul mişe di nav xwezaya Kurdistanê de tên dîtin, lê merema helbestvanî ji gula adarokê zêdetir beyana 11ê Adarê ye û ew mîna hostayekî zîrek kariye bi wênekirina serbora vê gulê ku jiyê wê gelek kurt e çarenivîsa rêkeftinnameya 11ê adarê bide xuyakirin.

Her wisa Goran di helbesta “Bo Gullî Lawlaw”ê de dibêje:

---

60 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, Dihok, (çapa 3), 2009, r. 15-16.

Be kol giryan le çawim dê, gullî lawlawî rengawreng!

Le ber çî sîs ebî wa zû? Çi ye esbabî jakanit?

***

Minîş wek tu beqam kurte û beharim tîj û kemfirset,

Geşem meyle û zewale çeşnî tu, çeşin hemû dinya,[61]

Goran di vê helbesta bi navê "Gullî Lawlaw"ê de hestên xwe diyar dike, her çende wî hizra vê helbestê ji helbesteke îngilîzî wergirtiye, lê rengvedana bîr û baweriyên helbestvanî beranber vê gulê xuya dibe ji ber ku helbestvan û jinavçûna vê gulê hevderd û hevxem in. Ev yek dibe giryana romantîkî li ser jiyana borî ji ber ku mirin û jinavçûna xwe di nav çarenivîsa gula lawlawê de dibîne; ew her du hevseferên jiyanê ne û dibe nîşana mirinê û temenkurtiyê, lewma drama helbestvanî û ya gulê tevlihev dibin û dibin giryan.

Her wisa Pîremêrd di helbesta "Nawgullana"yê de behsa çendîn cureyên gulan dike, dema dibêje:

Hellse, wa gullan kewtine pêkenîn

Ba satê lenaw gullana bijîn

***

Emane erwên le xakekeman

Keçî qewmekem le payey keman

Beharman xezan, pê helxizane

Bo newnemaman gelarêzane

Sa xwaye tenha êmeş toman hey

---

[61] Goran, *Sercem,* r. 223.

Perwerdgara keremit bo key[62]

Li vê derê tirs û nexweşiya helbestvanî ji bo guleke asayî tenê nîne, belkî merema helbestvanî çarenivîsa miletê kurd e. Her wisa wî gul mîna nîşanekê ji bo doza kurdan an têkelkirina gula sor mîna nîşanekê ji bo keçên kurd bi kar aniye. "Yan gula sor ku nîşana keçeke kurd a delal e û wekî dilê helbestvanî sergerdana karesata evînê bûye û di vê cîhanê de keser û rondikên bextreşiyê û poşmaniyê dibarîne û helbestvan jî wekî hevderdekê dilê xwe bi germî daxwaza bihevgehiştinê û yekbûnê jê dike..."[63] Pîremêrdî di helbesta "Le naw Gulana"yê de behsa gelek cureyên gulan û taybetmendiyên wan dike, li dawiyê jî berçavkirina vî dîmenê gulê bi gula Kurdistanê xuya dike. Her wisa ew teqeziyê li wê yekê dike ku nakokî di navbera kurdan de nemînin, lewma ji xwedê dixwaze ku keremekê li miletê kurd bike û ji bindestiyê û nexweşiyê derîne.

**Av**

Yezdanê mezin di qurana pîroz de dibêje: "وَجَعَلْنَا مِنَ الْمَاء كُلَّ شَيْءٍ حَيٍّ أَفَلا يُؤْمِنُونَ"64 di vê ayetê de rastiyeke girîng xuya dibe; av bibira jiyanê ye û hemî giyandar ji vê çê bûne, anku av çavkaniya serekî ya jiyanê ye. Gotineke kurdî heye; av avahî ye.

Tiştê herî girîng di vê mijarê de ew e ku helbestvanên nû bi çi rengî serederiyê bi avê re dikin. Av bi hemî cureyên xwe ve bi ser hindek waran de tê parvekirin; derya û rûbar û kanî û cok û sûlav û karêz. Her ji kevin de avê mîna elementekî xwezayê bala helbestvanan kêşaye. Bêguman nêrînên helbestvanên klasîk û yên romantîk di rasta vî elementî de wek hev nînin ji ber ku helbestvanên klasîk pirî caran rondikên xwe bi deryayan wesf dikin û her wisa gelek caran rondikên xwe bi rûbar û baranan jî teşnîh dikin, lê helbestvanên romantîk nêrînên xwe bi rengekî nû li ser derya û rûbar û kaniyan xuya dikin.

[62] *Dîwanî Pîremêrd*, r. 144-146.
[63] Karwanî, Kakey Felah, *Şî'rî Nwêy Kurdî*, Çapaxaney Korî Zanyarî Kurd, 1978, r. 114.
[64] *Suret el-Enbiya*, Ayet 30.

**Derya**

Li vê derê pêdivî ye em rastiyekê bixin ber çavan; sebaret vî elementî, bi rengekî giştî kurdan rasterast serederî li gel deryayan nekiriye û lewma jî deryayan di helbestên kurdî de gelek reng venedaye. Heger em danberheviyekê bi cihên din ên avê bikin, wekî rûbar û kaniyan, derya nagehe asta wan. Rast e ku deryayan başî û xirabiyên xwe hene, lê ew di helbestên kurdî de pirî caran nîşana şerî û xirabiyê ne.

Helbestvan Mueyed Teyîb di helbesta "Têhn"ê de deryayê bi kar tîne. Dema derdê dilê xwe tev li deryayê dike, ew pirsyarekê ji dilê xwe dike; erê gunehê vî dilê hind mezin û pirî kerb û kîn an evîn çi ye? Gelo çima ew deryaya hind mezin firreke avê bi devê wî de nake? Ye'nî derya mîna sehrayê nîşana şerî û xirabyê ye anku derya û biyaban mîna devê ejderhayekî hatine wesifkirin ku hemî tiştan dibire û ji nav dibe. Di nav pêlên deryayê de, gelek tiştên xirab xuya dibin. Helbestvan li dawiyê jî danberheviyekê di navbera wan de dike; ne biyaban ji deryayan paqijtir in û ne derya ji biyabanan baştir in. Mueyed Teyîb di helbesta "Têhn"ê de dibêje:

Dema têhnê

Gewriya min, wekî sehrayê hişik kirî

Wekî deryayê swîr kirî

Ne sehrayê firreka avê pê da kir

Ne deryayê mûyek li xo şaş kir

Ji bo minê,

Têhniyê firreka ava tezî,

Ji kaniyeka binarê çiyayekê,

Çi car befrê ji ser wî bar nekirî

Sehra çi ji deryayê paktir e

Derya çi ji sehrayê çaktir e![65]

Goranê helbestvan jî hindek tişt li ser deryayan nivîsîne. Rast e ku deryayan di helbestên kurdî de cihekî mezin venegirtiye, lê Goranî ew mîna keresteyekî helbestan bi kar aniye. Ji bo mînak; li hindek cihan Goranî derya mîna çavkaniya hilmê bi kar aniye anku hilm ji deryayan radibe û hevrikiyê bi bayî re dike heta diçe serê çiyayan. Ye'nî Goran bi rengekî gelek baş vê rastiyê dixe ser wesfandina ewran û baranan û payîzê û mirinê.

Le deryawe qetarî hewrî barşit kewte dûy pêşenge

Be ser singî çiya da çokî dadawe, kiş û bê deng[66]

**Rûbar**

Rûbaran berevajî deryayan roberekî berfireh di helbestên romantîkî de vegirtiye. Her wisa helbestvanên kurd jî gelek bîrhatinên xweş û nexweş bi rûbaran re hene. "Bêguman gelek helbest li ser rûbaran hatine vehandin. Hindek caran helbestvanan rûbar bi xweştiya xwezayê û çavkaniyên jiyanê û jiyarê wesf kirine. Hindek caran jî rûbar mîna tiştên bitirs û gef li ser bajaran hatine wesfandin, xasime dema lehî radibin. Ji ber vê yekê, rûbar li cem helbestvanan rengvedana başiyê û xirabiyê û avakirinê û xirabkirinê ye ye'nî bûye nîşana jiyanê û mirinê."[67] Anku rûbar li cem helbestvanan çavkaniya xêrê bûye û gelek caran dibe sedema kavilkirinê. Her wisa helbestvan ji bo derbirîna viyana niştîmanê xwe penayê dibin ber rûbaran, an helwestên xwe yên siyasî didin ber çavan û derdên dilê xwe xuya dikin. Hindek caran rûbar hatine wesfandin ku "hêvî û umêdên niştîmanî û civakî bi wan hatine berçavkirin, bi rêya behskirina xem û kovanên xelkî."[68]

Mueyed Teyîb di helbesta "Gare Herê li Cihê Xo"yê de sebaret rûbarî dibêje:

Cokêt me her ava tê may,

---

65 Teyîb, Mueyed, *Piling Dema Birsî Dibin ... Mirov Dema Têr Dibin*, r. 135.
66 Goran, *Sercem*, r. 165.
67 Hemîd, Huseyn 'Ebud, *el-Tebî'e fî el-Şi'ir el-Îraqî el-Hedîs,* Rîsalet Macsitêr, Camî'et el-Besre, Kulyet el-Adab, 1984, r. 75.
68 Mecîd, Mihemed Hesen 'Elî, *el-Wesif fî el-Şi'ir el-Îraqî*, Rîsalet el-Dikturah, Camî'et Bexdad, 1985, r. 108.

Rwîbarêt me herê digerin.[69]

Helbestvanê me dakokiyê li wê yekê dike ku rûbar nîşana jiyanê û berdewamiya xebatê ye. Hebûna avê di cok û rûbaran de cihê girîngîpêdana wî ye, her wekî wî divê xuya bike ku ev elementê xwezayê nîşana manê û berdewamiya jiyanê û xebatê ye. Ew mîna rojeke geş amajeyê bi vî elementî dide.

Goran sebaret wesfandina çem û rûbaran behsa wê yekê dike dema di biharan de çem û rûbar radibin û ava wan hemî tiştan bi xwe re radimale. Ew dide ber çavên mirovî ka çawa av şînkatiyên biharê dihejîne û gelek darên nazik û lawaz bi xwe re dibe û wan êdî nahêle.

Wişke çem wek çewrî serdem hellsawe,

Bergî sewz û nermî behar jakawe[70]

**Kanî**

Kanî çavkaniya serekî ya zêdebûna avê ye, xasime xwezaya Kurdistanê bi kaniyan xweşik e. Zelalî û paqijiya ava kaniyan nîşana berdewamiya jiyanê ye. Kaniyan pîroziya xwe di helbestên kurdî de heye. Pirî caran dema helbestvan behsa vê mijarê dikin, tevlihevbûnek xuya dibe. Ew kaniyan û xweşiktiya jinan û xwezayê tevlihev dikin. Xasime Goran di sefera xwe ya Hewramanê de, di wesfa "kanî jinan"ê de, mîna wênegirekî wêneyê kaniyekê dide ber çavên mirovî û behsa hatin û çûna jinan dike. Paşî ew behsa wan kesan dike ku li ser rêya jinan radiwestin û her dema guh li dengê jinekê dibe axînek ji wan derdikevin.

Serçawey awêk: kellekêk le ser:

Jinêk têy eçê, jinêk dête der

Emeş le dêda kanî jinane,

Qîbley dildarî herzekarane![71]

---

[69] Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir,* r. 104.
[70] Goran, *Sercem,* r. 178.

**Sûlav**

Sûlav dîmenekî dilveker e û ji bo seyranî û gerokan cihekî balkêş e. Temaşekirina van dîmenan xweşiyekê li cem mirovî peyda dike. Zêdebarî vê yekê, sûlavan mefayên din jî hene; mîna çêkirina karebê û taybet li wan cihên çiyayî yên ku berf û baran zêde lê dibarin. Gelek sûlav li Kurdistanê jî hene û Pîremêrdî jî helbestek bi navê "Tavgey Zellm"ê di vî warî de heye. Ew hewara xwe dibe ber Selman pagê ku dikeve ser ava diyaleyê li nêzî bajarê Bexdayê. Beşa herî mezin ji rûbarê Zelmê ji Tanceroyê û Sîrwanê pêk tê. Merema me ew e ku Pîremêrd li vê derê wesfeke xweşik dide ber çavan; ew yekgirtina ava zelmê û ya sîrwanê û ya tanceroyê bi yekgirtina kurdan ve girê dide. Paşê ew daxwazê ji ava Zelmê dike ku daxwazê ji Selman pagê bike ku dawaya wê çendê bike ku nakokî di navbera wan de nemîne û kurd ber bi yekgirtinê biçin.

Ser binêrewe be lim û xaka

Bigirî le bargey Selmanî pak e

Billê: be qurban, tu nawit pak e

Bimanxere rêy yekêtî û çak e[72]

[71] 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 133.
[72] *Dîwanî Pîremêrd*, r. 176.

#### 2.5.1.2. Diyardeyên Xwezaya Bêgiyan

Diyardeyên xwezayê di helbestên nû yên kurdî de bi vî rengê li xwarê ji hev tên vavartin:

##### 2.5.1.2.1. Werzên Salê

Werzên salê du du hevberî yek radiwestin; bihar û payîz ku nîşanên jiyanê û mirinê ne, her wisa havîn û zivistan ku nîşanên germayê û sermayê yan xirvekirin û peydakirina qûtî û daran in.

Xuya ye ku her werzek ji werzên salê xasyet û taybetmendiyên xwe hene. Bêguman helbestvanên kurd pirî caran ev werz bi kar anîne û mîna nîşan û keresteyan di helbestên xwe de wergirtine. Lê dema mirov helbestên kurdî vedikole, ji bo mirovî xuya dibe ku werza havînê ji hemî werzên dî zêdetir di wan de hatiye behskirin. Mimkin e ev yek jî dibe sedem ku werza havînê delîveya jiyaneke nû û livînê ye, xasime ku dar û ber û şînkatî û giyandar ber bi guherînê û hêzeke nû diçin. Bi rengekî giştî, werzên salê canekî dî bi xwezayê didin.

**Bihar**

Bêguman biharê di welatê me de buhayekî herî girîng û taybet heye. Di werzê biharê de, mirov hest bi jiyaneke nû dike û hêzeke din dikeve nav naxê mirovî ji ber ku werzê biharê dikeve di navbera du werzên gelek bizehmet de ku zivistan û havîn in. Piştî derbasbûna van her du werzan, helbestvan behsa werzê biharê dikin ji ber ku rengên xweşik û dîmenên balkêş li biharê xuya dibin. Di vî werzî de, av û ba tên guhertin û baraneke zêde dibare ku dibe sedema şînbûna gij û giyayan û beşivîna dar û ber û kaniyan. “Av û bayê vî werzî kar li gelek şînkatiyên xwezayî û şînkatiyên din kiriye. Ev guherîna avê û bayî û baranbarîna vî werzî têrî û pirrî yên paqijî û cureyên şînkatiyan in.’[73]

Şêx Nurî Şêx Salih di helbesta “Nîsan”ê de li ser bihara Kurdistanê nivîsiye. Weku xuya ye, di vê helbestê de, helbestvanî wêneyê Kurdistanê tev li baranê û gul û

[73] Resol, Şukriye, *Werz û Salnamey Kurdî le Pend û Qisey Nesteqî Kurdî da*, Kovarî Roşinbîrî nwê, j. 117, 1988, r. 116.

giyayan dike û ruh dide xwezaya bêgiyan û wê radike semayê û balinde mîna dur û elmasên Kurdistanê dikevin ser dar û beran. Ye'nî ew bihara Kurdistanê mîna bûkekê diwesfîne.

Be pêkenînewe tebşîr ekan, ke ruhî behar

Le ne’şe da ye, ewa hat, be meqdemî nîsan

Be dane luluî baranî ruh bexşîtewe

Çinar û yasemen û serû û 'er'erî bustan

Be ihtîzazî nesîmê, be ne’şe dên û eçin

Mîsalî ruhî mucesem le cilweda reqsan[74]

**Havîn**

Rast e ku werza havînê li Kurdistanê werzeke dirêj e û bêguman havînê jî xweşî û xweşiktî û mefayên xwe hene. Her wisa ew werza karkirinê û xêr û bêran û peydakirin û komkirina qûtê zivistanê ye, werza hatina gerok û seyranyan e û werza gihîştina fêkî û dirûtinê ye. Ye'nî werza havînê ji bo kesên destkurt werza xêr û xweşî û berfirehiyan e.

Pîremêrdî gelek helbest li ser werza havînê di dîwana xwe de hene, mîna helbestên “Hawîn”, “Dubare Hawîn”, “Germay Hawîn” hwd. Em dikarin bibêjin ku werza havînê li cem Pîremêrdî cihê girîngîpêdanê bû. Pîremêrd di helbesta “Dubare Hawîn”ê de germaya havînê tev li hemasa niştîmanperweran dike. Ew wesfa germaya Hawînê bi pelên tenûrê dike û dinya kiriye dûkêl û gul û nêrgiz çilmisîne. Paşê Pîremêrd wê germayê dike wesfek ji bo niştîmanperweran û ciwanên kurd û xebat û qurbanîdana wan xuya dike. Hêvî û umêdên Pîremêrdî ew in ku 'eşqeke germ di dilê niştîmanperweran de berdewam be da ku daxwaz û berjewendiyên kitekesî nemînin û ciwanên kurd ji pêxemet wê yekê berdewam kar bikin ku welatê xwe ber bi pêş ve bibin.

---

[74] Azad 'Ebdilwahid, *Dîwanî Şêx Salih, Şêx Nurî*, Bergî Yekem, Beşî Duwem, Bexda, Çapxaney Cahiz, 1989, r. 202.

Hawînman bo hat wek killpey tenûr

Tepedûkellî xiste şarezûr

Zullfî berezay şoxî hellqirçan

Nêrgise carî be carêk tepan

***

Xozge em gire tawî 'eşq ebû

Le dillî weten persit ber ebû

Ewsa ew coş e, dillî enexşan

Dirkî tema'î şexsî esûtan[75]

**Payîz**

Nêrînên helbestvanên romantîk yên kurd jî sebaret mijara payîzê wekî nêrînên hemî helbestvanên romansî yên cîhanê ne. Payîz li cem wan nîşana bêhêvîtiyê, mirinê û sîsbûnê ye ji ber ku ew di naxê xwe de hest bi bêhêvîtiyê û mirina xwe dikin û bi mirina gul û giyayên payîzê re eleqedar dikin. Helbestvanên romansî soz û peymanên rasteqîne û nexweşiyên giran di wan helbestan de berçav dikin yên ku behsa werza payîzê dikin. Payîz dibe nîşana hevahengiyeke rasterast ku di navbera hestên helbestvanan û xwezayê de çê dibe, ta wê astê ku wekî xwedîkekê derbirînê ji derûnê wan dike û mîna hevderdekî bi wan re dimîne.[76] Diktor Izedîn Mistefa Resûl helwesta Goranî di helbesta payîzê de xuya dike; “Goran li werzên salê digere û ji hemiyan xembartir vedibîne ji bo ku bike hevalê derûna xwe ya giran û bi ser wê de jî ji bo bextê xwe digirî.”[77]

Paîz paîz

Bûkî pirç zerd

[75] *Dîwanî Pîremêrd*, r. 109.
[76] Hemîd, Huseyn ‘Ebud, *el-Tebî’e fî el-Şi’ir el-Îraqî el-Hedîs*, r. 128.
[77] Resol, 'Izedîn Mistefa, *Edebiyatî Nwêy Kurd î*(Çapa1) Çapxaney Hewlêr, 1990, r. 127.

Min mat tu zîz

Her dû hawderd

Min firmêskim, tu baranit

Min henasem tu bay sardit

Min xem tu hewrî giryanit

Diwayî naye, dadim dadit

Hergîz hergîz paîz paîz[78]

Goran di vê helbestê de mîna helbestvanekî romansî xuya dibe. Ew bi helwesta xwe û bi hemî hest û nestên xwe ve têkelî her rêzikekê ji van rêzikan bûye, xwe bi payîzê re hevderd û hevxem dibîne. Her wisa ew mîna bûkekê beşdarî payîzê dibe, lê bûkeke porzer. "Wekî jineke xwedî hest û nest serederî bi wê re kiriye ku bi hev re hevparî azar û eşkenceyên jiyanê dibin û çi tixûbek di navbera wan de namîne û her yek ji wan dibe temamkerê/a yê/ya dî. Matî Goran zîrî payîzê ye û ew her du hevderd in."[79] Ye'nî mirina Goranî bi zerbûna payîzê û rondikên wî ji hesreta baranê ne, ew bi henaseyeke tijî êş û payîz bi bayekî sar. Ev derdê hind giran bi xem têkelî 'ewrekî reş bûye. Goran û payîz bûne du gulên bi yek cil. Payîz bi vî rengî li cem helbestvanên romansî xuya dibe.

**Zivistan**

Zivistan li Kurdistanê werza berf û baranan e, werza sirr û sermayan û rawistyana jiyanê ye û werza tengavî û zehmetiyan e ji ber ku di vê werzê de rê û rêbar bi berf û baranan asê dibin û mirov bizariya xwe ji destê zivistanê dibînin. Zivistan qeyd e, werza tixûbdana terş û kewalan e ji ber ku berf nîşana mirinê û rawestiyana jiyanê ye.

Helwesta helbestvanan di rasta werza zivistanê de wê yekê xuya dike ku zivistan werzeke dijwar e û çi kesek nikare xwe li ber desthilata wê bigire, ta wê radeyê

[78] Goran, *Sercem*, r. 163.
[79] Mecîd, Fazil, *Siroşt le Şî'rî Goran da*, r. 77.

ku mar û dûbeş ji ber sermaya wê winda dibin. Ye'nî zivistan bi xwe danê bi bargiraniya xwe û tengavî û nexweşî û dilreqiyên xwe dide.

Helbestvan Mueyed Teyîb werzên salê berçav dike û ka her werzek bi çi navdar e, dibêje:

Li zivistana... Min tu diviyay

Çaxê befrê..

Hemî çiyayêt te dihinîn,

Li buhara.. Min tu diviyay,

Em reveka zaroka bûyn..

Me ji rezên te bahîv didizîn..

Li havîna.. Min tu diviyay,

Ezê serxoş.. Li nîv şeva..

Ji gelyê te dihat bayekê hîn.

Li paîza.. Min tu diviyay,

Destekê nw' ji zarokêt te..

Beref xwandingehê dibezîn.

Lê li xurbet û xerîbiya..

Hemî wexta min tu divêy![80]

Mueyed Teyîb di helbesta "Dihok"ê de viyana xwe ji bo bajarê xwe bi werzên salê xuya dike anku her werzeke bê, çi xweş û çi nexweş, 'eşq û viyanên wî ji bo bajarê wî germtir dibin. Ew taybetmendiyên her werzekê xweşik xuya dike mîna ku li zivistanê berf çiyayan dihûne, li biharan zaro rezên behîvan dişelînin, li havînê bayekî

[80] Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir,* r. 124-125.

hênik ji geliyê Duhokê tê, li payîzê xwendekar ber bi xwendingehê dibezin. Ew viyana xwe ji bo bajarê xwe û werzên salê têkelî hev dike.

Pîremêrd jî di helbesta xwe ya bi navê “Nawqedî Çiley Zistan Piçra”yê de dibêje:

Nawqedî çiley zistanman piçra

Emro beşokey hewraman girra

Hewa betînî ew teşqî şika

Pencey le go çû pêkewe lika

Befrî serçawey zellm twayewe

Hetaw kewte tîn roj gerayewe[81]

Di vê helbestê de, Pîremêrd kêfxweşiya xwe derdixe ku çilê zivistanê çû û dinya ber bi biharê diçe, ba hêdî hêdî germ dibe, berf hêdî hêdî dihele û namîne û careke dî terş û kewal li deşt û zinaran diçerin.

#### 2.5.1.2.2. Seqa

Bêguman ev element gelek diyardeyan vedigire, mîna 'ewran, baranê, berfê, lehiyan, keskesorê, bayî, reşebayan, şev û rojan, şev û roj û şefeqan, şev û şefeqan, roj û şefeqan hwd. Ev diyarde di dema guherînan de anku demkî ne. Ye'nî peywendiya wan bi sedem û encaman ve heye. Ji encamên elementên xwezayê, ev diyarde xuya dibin û ji nav diçin. Em dê behsa hindek diyardeyan bikin.

**Baran**

Baran çavkaniya herî sereke ya avê ye û dibe nîşana jiyanê. Ew baran e ku gul û giya û dexil û danan şîn dike û mirov bi wê kêfxweş û bextewer dibe. Berevajiya wê jî rast e; nebarîna baranê dibe sedema mirinê û tirsa mirovan. Her ji destpêka jiyanê gelek caran qurban ji pêxemet baranê hatine dan. Ew di nav pirî netewe û miletên dinyayê de

81 *Dîwanî Pîremêrd*, r. 137.

yek ji dab û nerîtên taybet e. Di nav kurdan de jî, nerîtek bi navê Bûka Baranê hebû. Ew di dema nebarîna baranê de dihat çêkirin û gêran.

Li ser baranê, Mueyed Teyîb di helbesta xwe ya bi navê "Baran"ê de dibêje:

Baran

Nameya 'eşqê ye

Ji esmanî

Bo 'erdî

Berisva wê

Herikîna çem û kaniya

Girnijîna gul û giya

Li ser rûyê deştê û

Lêvên çiya[82]

Mueyed di vê helbestê de xuya dike ku dilovaniya asmanî baranê ji bo erdî dike diyarî. Ev name ji bo gul û giya û rûbar û kaniyan dibe jiyan û bizav û girnijîn. Di helbestên nû de, helbestvan rondikên xwe bi baranê wesf dikin.

**Berf**

Berf ku diyardeyeke werza zivistanê ye herî zêde li welatên çiyayî dibare. Lewma jî di nav ferheng û edebiyatên wan miletan de bi gelek rengan behsa berfê tê kirin. Hindek caran berf bûye nîşana dilpaqijiya wan miletan û hindek caran jî bûye nîşana xem û nexweşiyan ji ber ku spîbûna porê mirovî wekî berfê ye û nîşana pîrîtiyê û nêzîkbûna mirinê ye.

Pîremêrd di helbesta "Beyanî bû"yê de behsa berfê dike:

[82] Teyîb, Mueyed, *Piling Dema Birsî Dibin ... Mirov Dema têr dibin*, r. 149.

Beyanî bû, le xew hestam ke rwanîm befre barîwe

Silêmanî ellêy Belqîs e, taray zîwî poşîwe

Demêke çawerêy befrêkî wa bûm, mujdey barî

Ser befre, keçî hêşta şere tu pellme bo yarî[83]

Di vê helbestê de, Pîremêrd wesfa bajarê Silêmaniyê piştî berfbarînê dike. Ew Silêmaniyê mîna Belqîsa Sebeyê dide ber çavan ku xêliya zîvî ku merema wî berf e poşiye. Çiyayê Gwêjeyê bi cilkên berfê şox û şeng û nazdar xuya dike. Pîremêrd danberheviyekê di navbera rengê asmanî û çiyayê Gwêjeyê de dike; asman şîn e û Gwêje spî ye anku Gwêje ji asmanî xweşiktir e. Paşê wesfa berfê bi ferîşteyan tê kirin anku ferîşte bi berfê re tên ser erdî. Vêca tîşka rojê dikeve ser berfê û berf dibiriqe. "Pîremêrdî hizra vê helbestê ji helbesteke poşkînî wergirtiye ku ji bo berfê nivîsandiye."[84]

**Şev û Roj**

Yek li dû yekê tê; şev, roj, ronahî û tarîtî. Jiyan bi vî rengî berdewam e. Bi hilatinê rojê re, hemî giyandar di livînê û xweşiyê de ne. Bi vî rengî, roj dibe nîşana jiyanê. Dema roj ava dibe, tarîtî û bêdengî û tirs xuya dibin, ye'nî şev dibe nîşana mirinê û roj nîşana serbestiyê û şadiyê û ew her du tevlihev; "تولج الليل في النهار وتولج النهار في الليل."[85] Pirî caran şev nîşana şer û derd û nexweşiyan e. Xwedê jî gotiye, "ومن شر غاسق اذا وقب"[86], ji ber ku şev û tarîtî dibin sedema xweparastinê ji xirab û dirindeyan.

Pirî caran şev li cem helbestvanan mîna hevalekî û hevxemekî bûye; şev bi derd û êş û janên wan re hevxem bûye. Ye'nî şev mîna penageha aşiqan xuya dike.

Mueyed Teyîb di helbesta "Şev û Roj"ê de dibêje:

---

83 *Dîwanî Pîremêrd*, r. 334.

84 'Ebdulla, Emîn Hacî, *Berawirdiyêk le Nêwan Helbestêkî Poşkîn û Pîremêrd da*, Kovarî Hawkarî, Jimarey Taybetî, 1/1/1972,r.43.

85 *Suret Alî 'Umran*, el-Ayet 27.

86 *Suret el-Feleq*, el-Ayet 3.

Ne şev

Têra xewnêt min diket

Ne roj

Têra xemêt min

Şev.. Roj.. Şev.. Roj

Ey Xudayê mezin!

Ji şev û rojê pêvetir

Tiştek nîne?[87]

Rast e, pirî caran şev û roj û rojhilatin û rojavabûn bi rewşa derûnî ya helbestvanan ve tên girêdan, ji aliyê rewşa derûnî ve wê yekê xuya dikin û reng e xweşiktiyekê jî didin ber çavan. Wekî ku Mueyed Teyîb dibêje; ne şev aramî ye û ne roj xweşî û şadî ye. “Şev nîşana windabûnê û xurbetê û tirsê ye, penageha aşiq û xemgîn û xeyalperweran e. Helbestvan bi şevê behsa derdên dilê xwe dikin; windakirin û dûrketina yarê, xem û nexweşî û kêşeyên bi jiyanê û djiminan re. Ji ber vê yekê, helbestvan rondikan jî dirêjînin. Şev li ber wan dirêj dibe û bidawî nabe.”[88]

[87] Teyîb, Mueyed, *Ne ba Min Swar Diket Ne Ax Min Peya Diket*, r. 90.
[88] Hemîd, Huseyn ‘Ebud, *el-Tebî’e fî el-Şi’ir el-Îraqî el-Hedîs*, r. 134.

### 2.5.1.3. Xwezaya Giyandar

Bêguman peywendiya mirov û giyaneweran ji bo serdemên herî kevin vedigere û ew peywendî bûye sedema peywendiyeke ruhanî di navbera wan de. Her wisa bi gelek hez û xwestekan wekhevî di navbera mirov û giyaneweran de xuya dibin. Her wisa ev bêdengiya li derdora wan dibe mij û moran û tirseke bihêz di navbera wan de xuya dibe. Ew her du mefayê ji hev distînin û yek ji mefayên vê peywendiyê ew e ku dibe sedema peywendîyeke madî ku ew berdewam harîkarên hev bin. Ev peywendî heta wê astê di navbera mirov û giyaneweran de bilind dibe ku dibe pîroziyek. Hindek caran giyanewer mîna xwedawendan hatine perestin û qurbanî ji wan re hatine dan. Heta îro jî hindek netewe bi çavê pîroziyê li giyaneweran dinêrin, wekî Hindê.[89]

Mirovan her ji kevin de giyanewer perestine, mîna çêlan li Hindê û maran li cem êzidiyan û hirçan li cem neteweyên qutbê bakurî û mişkan li cem hindek hozên hindî hwd. Her wisa gelek caran giyanewer bûne havênê xeyala mirovan û bûne efsane, destan û çîrok; mîna çîroka hudhudê û Belqîsayê û Hezretê Silêman, çîroka Ademî û Hewayê û marî, destana Gilgamişî û marî, çîroka nehnigî û Hezretê Ûnis, çîroka sîmerxê û azadkirina mirovan li cîhana bin dinyayê di hîkayetên folklorî yên kurdî de, çîroka kotrê û belgê zeytûnê û Hezretê Nuh û tofanê, çîroka kotran û anîn û birina nameyan hwd.

Hindek giyanewer gelek binavûdeng in û li cem mirovan bûne cihê amajekirinê ji ber ku her giyanewerekî yan balindeyekî sîfetek bi ser de zal bûye. Ew sîfet ji bo wî giyaneweran bûne nîşan û gelek caran mirov jî bi wan sîfetên giyanweran hatine şibhandin. "Helbestvanan giyanewer wekî çeveng bi kar anîne; şêr bi hêzê û azadiyê, gur bi xiyanetê, mamiz bi dilovaniyê û xweşiktiya çavan, kevok wekî nîşana aştiyê, qelereşk bi bêtifaqiyê, mar ji bo nemiriyê, bilbil ji bo evîndariyê, ne'ame ji bo serşoriyê hwd."[90] Ev sîfetên berbelav ên giyaneweran ji bo mirovan bûne serbor û serpêhatî, dema dibêjin: Filan kes mîna şêran bihêz e, mîna rûviyan fêlbaz e, mîna guran xayîn e, mîna keran mejîhişk e hwd.

---

[89] Xumîde, 'Ebdulrezaq, *Qises el-Heywan fî el-Edeb el'Erebî*, Mektebet el-Encilu el-Misriye, el-Qahîre, r. 9-14.

[90] Nesar, Huseyn, *el-Tebî'e wel-Şa'ir el-'Erebî*, Dar Misir lîl-Tîba'e – el-Qahîre, 1972, r. 23.

Di Qurana pîroz de jî, gelek ayet li ser giyaneweran hene. Hindek ji wan ayetan behsa mefayên wan dike, hindek ji wan mîna serboran in, hindek mîna qanûnên girêdayî giyanewer in, hindek ji wan mîna bîr û bawerî û dab û nerîtên bi giyaneweran ve girêdayî ne ku îslam dijî wê yekê ye, hindek ji wan ji bo ronkirina mu'cîzan in ji bo hindek pêxemberan hwd.[91]

Heger em bixwazin lêkolînê li ser giyandaran bikin, divê em wan li ser pênc cureyan parve bikin; giyandarên kûvî, giyandarên kedî, balinde, masî, û mêş û mor. Em dê ji bo vê mijarê hindek mînakan ji giyandaran berçav bikin ji bo ku em bizanin ka gelo helbestvanên nû çawa kar li ser wan kiriye.

#### 2.5.1.3.1. Giyandarên Kûvî

Piraniya van giyandaran mîna keresteyên helbestên nû hatine bikaranîn. Ji bo ku mijar zêde dirêj nebe, em dê tenê hindek mînakan li ser giyandarên kûvî behs bikin.

**Rovî**

Her ji kevin de rovî bi fêlbaziyê hatine nasandin, lewma helbestvanan ew wekî nîşana fêlbaziyê wergirtine û gelek caran çîrokên wan bi helbestan vegêrane. Bi sedan caran, roviyan fêl li kesên sade û cotyar û rezvanan kirine û dîkil û mirîşk li wan xwarine. Çîrok û serpêhatiyên roviyan hind mişe ne, heger beşeke vê lêkolînê jî ji bo wan bê terxankirin her kême. Bêguman wesfa kesên derewîn û fêlbaz bi roviyan hatiye kirin, her wekî Cegerxwîn vê yekê di helbesta "Sofiyê Meyxanê me"yê de xuya dike;

Were da biçîne meyxanê

Bila dîsa tu sofî bî

Eger dilpak û paqij bî

Ne ko sofiyekê rûvî bî[92]

---

[91] Humîde, 'Ebdulrezaq, *Qises el-Heywan Fî el-Edeb el'Erebî*, Mektebet el-Encilu el-Misriye, el-Qahîre, 1980, r. 68.
[92] Cigerxwîn, *Dîwana "6. Şefeq*", r. 85.

Cegerxwîn di vê helbestê de wêneyekî xweşik di navbera wan kesan de berçav dike ku xwe rastgo û sade nîşanî xelkî didin, lê bi rastî wisa nînin. Merema Cegerxwînî ew e ku mirov dilpaqij be û fêlbaziyan neke. Cegerxwînî peyva "dilpak"ê bi her du ramanan bi kar aniye; dilê mirovan bi rastî wekî endameke laşî paqij be û çi nexweşî li wî nebin û her wisa mirov derewîn û fêlbaz û şerxwaz nebe.

Her li ser vê mijarê, Pîremêrd jî dibêje:

Her çî wek rêwî fêlbaz bê

Nûşî debê, nabê derbaz bê

Xwa raste û rastî lay xoşe

Çewtî serencamî boşe[93]

Di vê helbestê de, Pîremêrd wekî kesekî şêwirmend xuya dike. Ew encamê fêlbaziyê bi jinavçûnê û nemanê ve girê dide û bangî xelkî dike ku xwe ji fêlbaziyan dûr bikin ji ber ku encamê wan her zerer û malwêranî ye.

**Mar**

Her ji wê dema ku mirov hatine ser rûyê erdî, mar giyandareke bizerer û xirab xuya dibe. Di edebiyatên cîhanî de jî, behsa maran bi gelek rengan hatiye kirin. Pirî caran, ew giyandarekî xirab hatiye berçavkirin. Mimkun e mar li cem hindek kesan giyandarekî pîroz be. Marek di nav destana Gilgamişî de giyayê nemiriyê dixwe, lewma ew her sal carekê kevlê xwe diavêje û dîsa nû dibe. Marekî dî jî heye ku çak e. Dema gemiya Hezretê Nuh kon dibe, ew mar dibe sedema parastina gemiya Nuhî û nahêle ew bin av bibe. Marê reş li cem êzidiyan cihekî taybet heye; wan wêneyê marî li ser deriyê mezarê Şêx Adî û bîra Zemzemê kêşaye. Mar di nav çîrokên folklorî yên kurdewarî de jî bi gelek rengan xuya dibin, taybet mar heftser û kuremar û ejdehak hwd.

Mihsin Qoçan di helbesta xwe ya "Sivik Were"yê de dibêje:

---

[93] *Dîwanî Pîremêrd*, r. 393.

Dê eksîra Gelgamişî

Ji mara stînim

Kem diyarî..

Bo te înim

Da ez û tu..

Hemî buhara nwî bibîn

Zêndî bibîn.[94]

Li vê derê, tevlihevbûnek xuya dibe. Pirî caran helbestvan kezî û biskên yara xwe bi marên reş wesf dikin, lê Mihsin Qoçan di vê helbestê de ji bo yara xwe dibêje: rêya min rûyeke dûr e, ber singê min hemî dehil û dirr û agir e. Dema ez vedigerim, ez dê eksîra Gilgamiş wekî diyariyeke pirbiha ji maran bistînim. Ji bo evîna me nemire, em dê mîna maran her sal carekê nû bibin.

Bêkesî jî helbestek bi navê "Şêro û Mar"ê heye. Di wê helbestê de, mar dibe nîşana bêwefatiyê. Şêro marekî sirrê-birî dibîne, lê mar li beranberî başî û qenciyên wî bi wî vedide. Ev çîroke helbesteke fêrkirinê ye, handana wê yekê dike ku mirov xwe ji heval û kesên xirab û bêwefa dûr bike.

| | |
|---|---|
| Rojê le çiley zistan | marêkî dî le kolan |
| Wa le serma sirr buwe | be 'eynî wek mirduwe |
| Dest be cê marey helgirt | xêra bo malewey bird |

Li dawiyê, babê şêroyî şîretan li wî dike:

Çake derheq kesanê   bike ke pêy bizanê[95]

[94] Qoçan, Mihsin, h.b. r. 68.
[95] *Dîwana Bêkesî*, r. 195.

#### 2.5.1.3.2. Giyandarên Kedî

Bêguman piraniya giyandaran li berahiyê kûvî bûne, lê mirovan ji ber hewcedariyên xwe hindek ji wan kedî kirine. Mirovan ew ji bo xizmeta xwe bi kar anîne, ji bo xwarinê û cil û bergan û veguhastina barên giran. Lewma jî giyandarên kûvî li nav malan hatine xwedîkirin û mefa ji wan hatiye wergirtin, wekî seyan, keran, hespan, bizinan, mîhan, dîkilan, mirîşkan, qazan hwd.

Her ji kevin de giyandarên kedî anku yên nav malê di helbestên kurdî de mîna keresteyekî bi kar hatine; hesp û kerên qan'î di helbestên kurdî de gelek berbelav in û dîkilê Şêx Rezayî û kerê Nalî jî wisa ne. Ji ber ku jiyana rojane bi van giyandaran re bûye, wan di nav berhem û dîtin û nêrînên wan de reng vedaye û hatine di nav tore û edebiyat û nivîsarên kevin û yên dî de.

Em dê li vê derê berê xwe bidin hindek mînakan ji giyandarên kedî ka helbestvanên nû bi çi rengî serederî bi wan re kiriye.

**Hesp**

Hesp nîşana hêzê ye. Xasime di nav 'ereban de hespan cihekî taybet heye. Ew hespan ji bo şeran û nêçîrê û xweşiktiyê bi kar tînin. "'Ereb ta wê astê bi hespan mendehuş bûne ku kêmasî li xwe û banî û zarokên xwe dihêla, lê li hespên xwe nedihêla."[96]

Her wisa "ji ber xweştiya hespan, ew tiştên herî bibuha -mîna wan ristikên jin li xwe dikin- li ber wan dikin."[97] Di nav kurdan de jî, hespan cihekî taybet heye. "Di serdemên kevin de û xasime di şeran de, hespan girîngiya xwe ya taybet hebû û hespên baş û qemerî bara serkirde û serdaran bûn."[98] Bi rengekî giştî di nav helbestên kurdî de, hesp zêde xuya nabe. Ew tenê di nav hindek rêzikên hindek helbestan de xuya dibe. Her wekî Pîremêrd dibêje:

---

[96] El'ufî, Ehmed Mihemed, *Exanî el-Tebî'e fî el-Şi'ir el-Cahilî*, Mektebet Nehze, Misir – el-Qahîre, 1958, ê. 91.
[97] Se'îd, Cemîl, *el-Wesif fî el-Şi'ir el-Îraqî fî el-Qirneyn el-Salis wal-Rabi'* el-Hîcrîyîn, Metbe'et el-Hîlal – Bexdad, 1948, ê. 94.
[98] Fetah, Dilêr Dawid, *Saloxdan di Mîrnameya Jan Dostî de,* Nameya Masterê, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, 2017, r. 144.

Hênde bê hêze eger tawî bidey

Naşkênê le dew hêlke be pa

Bo derê lê xorî nariwa be kutek

Rû be rûy pûş û giya dête sema[99]

Pîremêrd di van rêzikan de tûrebûna xwe ya ji hespê xwe berçav dike ji ber ku hespê wî bêhêz e. Ew ji hespê xwe peya dibe û bi pêyan dimeşe. Ew wisa behsa hespê xwe dike, her wekî hespê wî li ber destên keran hatiye perwerandin. Hespê wî bi zorê jî nameşe, lê gava ku çavê wî bi giyayî dikeve radibe semayê.

Mueyed Teyîb jî di helbesta "Nîhare"yê de hespê kihêl û bizavên jiyan û jiyaran tevlihev dike. Ji bo ku mirov berdewam xebatê û bizavê bike û derdê hejartiyê nebîne, divê mirov mîna hespên bihêz bizavê bike. Gotineke pêşînan heye, dibêje: heta nîva destî reş nebe, tahma devî xweş nabe.

Bêderê dê deyne bay

Ûşiya vê de

Jiyar û jîn her umêd e

Miloka bikêşe neraweste

Hespê kihêl ne xav û sist e[100]

**Se**

Se nîşana wefadariyê ye, xasime bi xwediyê xwe re. Pasewan û zêrevanên pezî û terş û kewalan û koçer û gundî gelek mefayê ji seyan dibînin. Helbet kurdan jî hind hez û viyan ji bo seyan hene, ji bo her seyekî navek gotiye; gewro, şêro, kejo, hwd. Dema helbestvan behsa seyan dikin, wekî şîret behs dikin. "Dema helbestvan behsa çîrokên seyan dikin, ew wan wekî mînak dînin. Ew her wisa çîrokên seyan mîna

---

[99] *Dîwanî Pîremêrd*, r. 365.

[100] Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, r. 149-150.

serpêhatî û şîretan bi dawî tînin. Baştirîn nimûne jî çîrokên "se û gurg" û "du se û gurgek" in."[101]

Di nav civaka kurdewarî de, wesfa seyan wisa tê kirin ku emîn in û diziyan ji xwediyên xwe nakin. Xwe heger ew birsî jî bin, devê xwe ji bo nanê xwediyê xwe nabin. Ev sîfetên baş ên seyan ji bo tiştan vedigerin; ew her ji zikmakî wisa ne yan ji perwerandinê û fêrkirinê ye.

Goran di helbesta "Seg wer"ê de dibêje:

Tûley ser aw, segî xwêrî!

Wat lê hat le min biwerî?

***

Minîş hendê kes, paşmile,

Lêm kewtûne teqey zile

***

Ba bo xoyan her bigefin,

Her xoyan her du teref in![102]

Goran di vê helbestê de dijî wan kesan radiweste ku gotinên xirab di rasta wî de dikin. Ew vî dîmenî nîşanî wan dide; du se hene, yek ji wan li ser avê ye û yê dî di binê bîrê de ye. Ew her du derewên hev û gotinên neşîrîn ji hev re dibêjin. Vêca Goran dibêje ku kes mîna wan seyan in û li pişt min derew in, lê ez wekî wan nabim anku ez bersiva wan nadim. Bila ew bikevin beranberiyek û birevin hev.

**Mih û Berx**

Bêguman xwedîkirina wan li cem koçeran mîna çavkaniya jiyanê ye. Her wisa ew li cem gundiyan jî gelek girîng in. Mih nîşana bêziyaniyê ye ji ber ku çi ziyan û

[101] Hemîd, Huseyn 'Ebud, *el-Tebî'e fî el-Şi'ir el-Îraqî el-Hedîs*, , r. 167.
[102] *Goran, Sercem,* r. 292-293.

zerer ji wan çê nabin. Berevajî, wan gelek qezenc û mefa hene, wekî şîrî, goştî, hiriyê hwd. Anku xwedîkirina wan qezenceke baş heye û berxên wan jî her wisa. Mihsin Qoçan bi vî rengî behsa berxan dike;

Hewe dîtiye carekê

***

Yan berxekî..

Ji tirsêt gurgî da gotibît

"ez naçime çel û çiya

Êdî hewe ez naçerim"[103]

Dema berx diçin çel û çiyayan û qesta nav giyayê biharê dikin gelek şa dibin, xasime êvaran. Lewma helbestvan dakokiyê li wê yekê dikin ku berx çi caran nikarin xwe ji xwezayê dûr bikin.

Her wisa Goran jî dîmenekî balkêş li ser berxeke xweşik û nerm û terr dide ber çavên me, gazî dike: were em bi hev re biçin û di nav gij û giyayan de bi hev re şa bibin. Goran di helbesta "Berxekem"ê de dibêje:

Ey berxoleke! Nerm û nolleke!

Bo her kwêyek çûm, tuş were le dûm,

Were xilexil! Biçû nerm û şil!

Bibarêne: ba' ... Berxî çaw be kil![104]

#### 2.5.1.3.3. Balinde

Balinde nîşana azadiyê û serbestiyê ye. Balinde bi rengekî giştî di nav helbestên kurdî de hatine bikaranîn û xasime ew balindeyên ku di nav qefesan de tên xwedîkirin

---

[103] Qoçan, Mihsin, h.b. r. 34.
[104] Goran, *Sercem,* r. 426.

û serbestiya wan tên windakirin, wekî kew û bilbilan. Helbet helbestvan hind behsa azadiya xwe nakin hindî ku behsa serbestiya van balindeyan dikin ji ber ku deng û awazên wan nîşan û derbirînên serbestiyê ne. “Dema doza azadiyê li cem helbestvanan tê behskirin, ew bi rengekî taybet behsa bilbilî dikin û bi rengekî giştî balindeyên din. Anku doza balindeyan mîna doza mirovan tînin ber çavan. Ew her du hevderd û hevxem in û dixwazin ji zindanê azad bibin û serbest bijîn. Vêca ew xweziyan dixwazin ku mîna wan balindeyan bin ku bi her du perên xwe li asmanan bifirrin û ji wî cihê ku azadiya wan lê hatiye tixûbdan dûr bikevin û êdî çi dab û nerît li ser hestên wan zal nebin ji bo ku mirovên bihêz zordariyê li mirovên bêhêz nekin û her wisa dewlemend xwîna hejaran nemêjin ji bo ku ew jî bikarin bigihêjin hêvî û umêdên xwe...”[105] Helbet her balindeyekî taybetmendî û xasyetên xwe hene û ji bo meremên taybet di nav helbestan de hatine bikaranîn. Di serdemên kevin de, balinde di nav koçk û telarên sultan û şah û mîran de ji bo xweşiktiyê hatine xwedîkirin. Mîrên kurdan jî balinde hebûne û girîngî jî bi wan daye. “Çi baz e! Hema bibêje niklê wî xencereke koçeran e, pancên wî çengel in û singa wî ya fireh û deqdeqî mîna çermê pilingekî ye. Çavên wî yên mezin û kildayî kûrbîn û tûj in. Ku mişkek li ser erdî bilive û ew jî di nav weran de be, ew dibine.”[106] Em dê li vê derê hindek mînakan li ser balindeyan bidin ber çavan ka gelo ew bi çi rengî di nav helbestên kurdî de hatine bikaranîn.

**Bilbil**

Bilbil di helbestên klasîk û yên nû de jî gelek hatiye bikaranîn, lê di helbestên klasîk de zêdetir wekî 'aşqê gulan xuya dibe. Di helbestên nû de, bilbil pirî caran bûye mijara helbesta helbestvanî. Helbestvanên nû danberheviyan di navbera xwe û bilbilan de dikin, behsa serbestî û dengxweşî û xemên bilbilan dikin. Ew her du hevderd û hevxem in. Bilbil li ser çeqên daran û ew li serê çiyayan bi hev re rondikan dibarînin. Hêvî û umêdên bilbilan û mirovan 'eynî ne; pêxemet serbestî û azadiya warê wan in. “Dîtin û nêrînên helbestvanên nû li ser bilbilan li ser du aliyan parve dibin; yek peywendiya li gel gulê, du peywendiya bi azadî û xemên mirovî ve.”[107] Bêguman helbestvan gelek wêneyan di nav helbestên xwe de bi kar tînin û berçav dikin. Ji pêxemet nîşandana hizr û bîrên xwe di gelek kevalên curbicur de, ew renge

---

[105] Hemîd, Huseyn ‘Ebud, *el-Tebî’e fî el-Şi’ir el-Îraqî el-Hedîs*, , r. 174-175.
[106] Fetah, Dilêr Dawid, h.b., r. 145.
[107] Hemîd, Huseyn ‘Ebud, *el-Tebî’e fî el-Şi’ir el-Îraqî el-Hedîs*, , r. 171.

temaşegehekê diafirînin û pêşkêşî xwînerên xwe dikin. Her wekî Cegerxwîn di helbesta xwe ya bi navê “Dilê Cegerxwîn”ê de dibêje:

Agir bi Kurdistanê ket lewra hewar e dil

Sed bax û sed bistanê ket manendî bilbil jar e dil[108]

Di vê rêzika helbestê de, Cegerxwîn tevlihevbûnekê di navbera du wêneyan de çê dike; wêneyê yekê bilbil e û yê duyê Kurdistan. Ew wêne gelek lêkdayî xuya dike; ew behsa wê xirabkariyê û zordariyê dike ku di Kurdistanê de heye. Her dîsa helbestvan Cegerxwîn ji bo diyarkirina xemgîniya xwe “dilê xwe” dike alavekî ragehandinê û bi wî hewar dike. Dema Kurdistan bi “bax û bustan” ve tê şewitandin û wêrankirin, hingê çi cihek parastî namîne ku milet di nav de rûne ji ber ku Kurdistan bindest e û di bin zilm û zordariyên dijminan de ye. Vêca ji verêja sotina Kurdistanê, bax û bostan mîna bilbilan dikin nalîn û hewar.

**Kevok**

Kevok wekî nîşana aştiyê û aramiyê tê nasîn û her ji serdemên kevin were wekî peyamber ji bo gîhandina nameyan hatiye bikaranîn û mirovan ew her dem pîroz nirxandiye. Di nav awaz û dengên balindeyên din de, kevokan awazeke taybet heye ku yekser mizgîniya nêzîkbûna aştiyê dide. Pirî caran helbestvanên nû deng û nalînên kevokan û derûna xwe wekî hev dibînin. Lewma dema hindek helbestvan tûşî derd û bela û nexweşiyan dibin, xemên xwe û kevokan tevlihev dikin. Pîremêrd di helbesta “Kotre Barîke”yê de dibêje:

Min û tu riştey meynet le mil bûyn

Nişîdexwanî xunçey yek gull bûyn

Sermestî neşey badey yek mil bûyn

Zadey Siroştî yek aw û gill bûyn[109]

---

[108] Cigerxwîn, *Dîwana “1. Agir û Prûsik”*, r. 43.

[109] *Dîwanî Pîremêrd*, r. 187.

Pîremêrd wêrankirina Kurdistanê ji aliyê dagirkeran ve û rûxandina hêlîna kevokê ku nîşana aştiyê ye bi hev re girê dide. Ye'nî helbestvanê me çarenivîsa xwe û ya kevokê wekî yek dibîne, anku derdê xwe û derd û meynetiyên kevokê tevlihev dike. Paşê ew her du yek awazê û yek stranê dibêjin. Ew di nav yek xwezayê de û ji yek av û giyayan peyda bûne anku merema wan her duyan ew e ku azad û serbest bijîn û ji derbideriyê rizgar bibin.

#### 2.5.1.3.4. Giyandarên Avî "Masî"

Masî ku giyandarekî avî ye gelek caran di nav helbestan de mîna alavê derbirîna hizr û hestên helbestvanan û wekî mijareke serbixwe hatiye behskirin. Masî her wisa di nav çîrok û efsaneyan de jî xuya dike, mîna çîroka Ûnis Pêxemberî û masiyê ku çîroka wê di qurana pîroz de jî hatiye vegêran. Pîremêrd di helbesta "Kunemasî"yê de dibêje:

Min masiyekim le netewey nûn

Ûnis pêxember bew bû be jalnun

***

Caran her be tor ekewtîne daw

Êsta bombaman zirme le aw hellsênê

***

Ya Xwa herwa bin ey benaw însan

Netan perjête ser ême manan[110]

Pîremêrd di vê helbestê de bi zimanê masiyekî diaxive anku masiyek serpêhatiya dîroka xwe vedigêre. Ew behsa wî masiyî dike yê ku Ûnis Pêxember daorayî û piştî lavayên wî bi zikrê "la ale ala ant"ê azad bûyî, paşê behsa wan mirovan dike ku masiyan bi bombeyan dikujin. Merema wî ji wan bombeyên masiyan pê dikujin ew e ku dabinit beranberî wan bombeyên mirov pê tên kuştin. Ev yek dibe

[110] 'Eynî çavkanî ya Berê, r. 228-229.

tolvekirina wan masiyan ku bi destên mirovan tên kuştin. Ye'nî ev giyandar jî duayan dikin ku mirov hev jî bi vî rengî bikujin ji ber ku masî dibêje: ez masiyê neteweyê nînim.

Her wisa Mueyed Teyîb jî di helbesta "Xemêt Zindiyekî Dibêjinê.. Mirov"ê de tevlihevbûna mirov û masiyan berçav dike:

Ew mirovê bûye masî,

Li deryaya kwîr..

Her ewe yê heta evro bizavê diket

Bo.. Fireka azadiyê.

Bo.. Bêhneka tenahiyê.

Bo.. Gavekê zaro tena memkê dayka xo bimêtin.

Bo.. Danekî gund û cinîk nehên sotin.

Welê hey ho..

Hêşta masî li nav deryayê têhnî ye û

Herê dibêjin..

***

Her mirov e..

Siroşt hemî li bin rikêba wî yê radibîte çargava.[111]

Mueyed Teyîb di vê helbestê de behsa gelek elementên xwezayê dike, xasime mirov û masiyan. Bêguman mirov jî yek ji elementên xwezayê tê hesibandin û ji xwezayê nayê cudakirin. Her wisa helbestvanê me wê yekê jî xuya dike ku heger mirov bibe masî û di nav deryayeke çend kûr de jî be, mirov her ji bo azadiyê û tenahiyê û

[111] Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, r. 67-68.

aramiyê dinale ji ber ku masî di deryayê de hest bi tirsê û nearamiyê dikin. Ye'nî her ji wê dema ku mirov hatine ser vê dinyayê, azadî û aramî xwe li masiyên deryayan jî bûye hisret. Belge ji bo vê nêrîna helbestvanî; ew bi xwe di helbesta "Gemî û Kevir"ê de dibêje:

Berî mirov peyda bibin

Pişta xo rast biken û

Li ser vê axê

Bikevine rê

Hemî bûnewerên dêm

Azadtir û

Yên avî tenatir bûn[112]

#### 2.5.1.3.5. Zîndewer "Mêş û Mor"

Gelek cureyên vî elementê giyandar hene; mêrî, pelatînk, mêş, mêşa hingvînî, hwd. Em dê behsa hindek ji wan bikin.

**Morî**

Morî nîşana xebatê û têkoşînê ye. Ew berdewam dixebite, ji bo ku berdewamiyê bide jiyana xwe. Morî bizavê dikin ku ji bo rojên sirr û serma û tegaviyan qûtî ji xwe re kom bikin. Hindek taybetmendiyên gelek baş û balkêş li cem moriyan hene; arîkar in, derewan nakin, jîr in û li dû qanûnên memleketa xwe diçin. Di civaka kurdan de, gelek pend û çîrok li ser moriyan hene ku mirov ji bo jiyana xwe serboran ji wan werbigire.

Bêkes di helbesta "Herewez"ê de dîmenekî xweşik ê moriyan dide ber çavên me. Ev dîmen li ser hevkariya wan e, ji pêxemet wê yekê ku karekî baş bikin. Vêca ew moriyan ji bo me dike mînak ku em jî wekî wan hevkar û serketî bin.

---

[112] Teyîb, Mueyed, *Ne Ba Min Swar Diket Ne Ax Min Peya Diket*, r. 86.

Le denke genimê alawe

Zor bedestiyewe damawe

Çendî ekird boy neebra

Hêz û qwetî lê bra

Emca mandû bû lêy da rwê

Hî tirî hêna legel xoy

Çûne serî û katê zanî

Genimyan bird beasanî[113]

Merema helbestvanî kar û hevkarî û berhemanîna wan e. Her ku moriyek nikare dendikeke genimî bibe memleketa xwe, diçe û gazî moriyên din dike ji bo ku alîkariya wê bikin û bi hêsanî bi hev re wê dendika genimî ji xwe re bibin. Dema zaro vî dîmenî dibînin, pend û 'îbretan ji moriyan werdigirin. Dara, navê wî zaroyî ye ku rojekê ev dîmen dikeve ber çavên wî û dibêje: morî ne vî karî dikin.

**Pelatînk**

Pelatînk nîşana xweşewitandinê û xwegorîkirinê ye ji ber ku ew xwe gorî ronahiyê dikin. Helbestvanên romansî wesfeke xweşik didin pelatînkan. "Pelatînk ew giyandarên nazik in ku xwedî rengên balkêş û firînên xweşik in û di nav bax û çîmenan de dijîn û ji vê gulê diçin a dî. Berbelav e ku dema pelatînk ronahiyê dibînin û xasime bi şevê û li tarîtiyê, ew xwe diavêjin nav wê ronahiyê û disojin. Lewma mîna serpêhatiyan tê gotin: ji pelatînkê kurtir e."[114]

Hafzê Qazî di helbesta "Belatînk"ê de dibêje:

Keskesorî perên belatînkê

Razandîne

[113] *Dîwana Bêkesî*, r. 197.
[114] Hemîd, Huseyn 'Ebud, *el-Tebî'e fî el-Şi'ir el-Îraqî el-Hedîs*, r. 208.

Çerxa didet

Di xeleka bilinde şwîrhên

Kela asê tim dizivirît

Pê çê nabît ji dav û xefkan

Derbaz bibît...

***

Wî dîmenî

Dilê belatînkê jenî

Şwîn rondikan kire kenî

Hîngê zanî

Bê mifa ye

Roj xeyrî ye

Azadiyê bar kiriye

Dûr ketiye...[115]

Qazî di wesfa xwezayê de dîmenekî balkêş dide pelatînkên rengîn, dema di nav baxan de difirin û çerxan didin. Paşê helbestvanê me vî dîmenê pelatînkan tev li çarenivîsa miletê xwe dike. Dema hemî rê li ber singê wan tên girtin û tixûbdan û ew nikarin azad bifirin û di 'eynî demê de dîmenên nexweş û karesatên dilhejîn dikevin ber çavên wan, ew li şûna rondikan dikenin ji ber ku ji ronahiyê û azadiyê bêhêvî dibin. Lewma helbestvanê me jî çarenivîsa xwe û miletê xwe bi ya pelatînkan dişibihîne. Dema çirayê ronahiyê dibînin, ew xwe disojînin.

[115] Qazî, Hafiz, *Dîwana Qazî*, r. 205-206.

**Mêşhingiv**

Mêşhingiv evîndarên gulan in. Ew nîşana geryanê û xebatê û têkoşînê ne. Ew digerin ku ava gulan ji bo çêkirina hingivî kom bikin. Ev berhem ji bo gelek nexweşiyan derman e, ji bilî xwarina wî ya xweş. Di çîrok û çîvanokan kurdî de wisa tê gotin; mêşhingivê ji xwedê xwest: dema ez bi kesekî vedim, bila yekser bimire. Xwedê ji wê re got: Na! Madem niyetên te wisa xirab in; tu xwe bi kê vedî, her tu bi xwe dê bimirî. Helbet dema mêşhingiv bi yekî vedide, her ew bi xwe dimire.

Her li ser vê mijarê, Goran di helbesta “Ahengêk le naw ran”ê de dibêje:

Henge zerde ebrê rêy dûr

Bo bînînî gullaley sor,

Ta negerê mêrgî behar

Dem nanête naw demî yar![116]

Goran behsa mêşhingivan dike ka bi çi rengî digerin û xebatê dikin û azaran dikêşin, wekî mînak ji bo mirovên xebatker li dinyayê da ku bigihêjin armancên xwe.

Her wisa Kake Felah sebaret mêşhingivan dibêje:

Ey hengî wîze xoşim

Weko tu tê ekoşim

Şîle û helaley bon xoş

Ekey be hengoyê noş

Minîş ey heng weko tu

Rencim girtûte esto

Berew amancî şîrîn

[116] Goran, *Sercem*, r. 50.

Şîrîntir e le hengwîn[117]

Kake Felah mêşhingivan diwesfîne û her wisa danberheviyekê di navbera armancên mêşhingivan û yên helbestvanan de dike. Ka mêşhingiv bi çi rengî di nav gulan de xebatê dike, helbestvan jî bi wî rengî xwe derdixe û rêya têkoşînê dide ber singê xwe. Armanca mêşhingivan çêkirina hingivî ye, lê armanca helbestvanî ji hingivî şîrîntir e ku azadî û serfiraziyên gel û welatên wî ne.

[117] Kakey Felah, *Cigergoşekan*, (Çapa3), Silêmanî, Çapxaney (Kakey Felah), 1970, r. 15.

# BEŞA SÊYEM

# XWEZA DI HELBESTÊN KURDÎ YÊN NÛ DE HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE

## 3.1. XWEZA DI HELBESTÊN KURDÎ DE

### 3.1.1. Xweza di Helbestên Klasîk yên Kurdî de

"Sebaret edebiyata kurdî ya klasîk, diyar e ku her ji berahiyê bi helbestan dest pê bûye. Piraniya dîrokzanên edebiyata kurdan dibêjin ku edebiyata kurdî ji Baba Tahirî dest pê bûye."[118] Anko helbestvanên klasîkî bi gelek rengan behsa element û diyardeyên xwezayê kiriye. Em dê tenê behsa du mînakan ji helbestvanên klasîk bikin ko em dikarin bibêjin ko ev her du helbestvan nûnerîtiya pirraniya helbestvanên klasîk dikin.

#### 3.1.1.1. Melayê Cizîrî

Reng e ku geryana me berfirehtir bibe, dema ku em nêrînekê li ser dîwana Cizîrî bikin. Wate dilê Cizîrî mîna "re'di – ewr û birûsyan"e. Şemis, qemer, nêrgizî sîrab, seher, sema, gulî bo 'enberîn û seba û qews û qezeh û hudhudî şirîn kelam û gul û gûn û çîçek û meşriq û xorşîd û benefş û 'endelîb û sunbol û sêv û werd û nesrîn û kohî qendîl û gulzar û xunav û serçeşmeyê heywan û sorgul û bi dehan peyvên dî yên girêdayî xwezayê di dîwana wî de hene. Cizîrî her wisa gelek peyvên dî jî di xwezayê de wergêrane, wêne pê çê kirine û bi dîmenên xwezayê re girê dane.

Bi dîtina me, pêdivî ye ku ferhengek û mijareke taybet ji bo vê yekê bên terxankirin. Heger em di dîwana Cizîrî de li wêneyên xwezayê bigerin an wan dêran destnîşan bikin ên ku ji bo xwezayê hatine vehandin an wan dîmenên xwezayê tomar bikin ku hizra sofigerî û felsefeya Cizîrî diyar dikin, em dê pêdivî bin ku beşeke taybet ji bo wê yekê bê terxankirin.

118 Mehmûd, Fazil Mecîd, S*roşt le Şî'rî Goran* da, r. 17.

Bulbulî mecruhî 'îşqî taqeta xaran nehin
Dî gula xarîş sine bêşkwek bê xar bit[119]

#### 3.1.1.2.Ehmedê Xanî

Ehmedê Xanî jî wekî seydayekî jêhatî di destana xwe ya bi nav û deng Mem û Zînê de behsa babet û diyardeyên xwezayê dike, wekî vê nimûneya li xwarê;

Ewrek te digo ji erdê rabû

Evraz li asman cema bû

Wî ewrî ji nîveka hinavan

Xunbarî dikir bi her du çavan[120]

Xanî aliyê xweşiktiya elementên xwezayê wekî ewr, erd û asman di van her du rêzikên di serî de diyar dike. Xanî dilê Memî bi koreke agirvêketî wek hev dike ku dûkêl ji wê korê radibe. Xanî wê dûkêlê jî bi ewrekî ku ji erdî ber bi asmanî ve rabûye wek hev dike û li nîveke hinavan li cihê baranê xwîn ji çavên Memî dibare.

Nimûneyeke dî;

Sef sef dimeşîne kuh û deştan

Ref ref dixweşîne seyr û geştan[121]

"Peyvnasî: sef sef: sef bi sef, rêz bi rêz – dimeşîn: diçûn, bi naz û keyfxweşî diçûn – gûh: kû, kî, kêf, çî, çiya – ref ref: ref bi ref, pol bi pol, deste deste, kom komî – xweşîn: xuşîn, xuşyan, dengê firîna refên baldaran an dengê herikîna avê."[122]

"Şîrove: Dema ku gera felekê bi xweşbextî û pîrozî dîsa doş bû û ser ji nû Newroz nîşan da cejna Newrozê pêre gehişt, gorekî wê rê û resma pîroz û mubarek, giştî xelkê bajarî û leşkerî hemû ji bajar û kelayan derketin û xan û man di cî de hêlan û

119 Mehmûd, Fazil Mecîd, *Siroşt le Şî'rî Goran da*, r. 20.
120 Cîhanî, Perwîz, *Mem û Zîn bi Rave û Şiroveyek Nû*, Bergê Duyê, Weş. Spîrêzê – Dihok, 200, r. 744.
121 Cîhanî, Perwîz, *Mem û Zîn bi Rave û Şiroveyek Nû*, Bergê Yekê, Weş. Spîrêzê – Dihok, 2007, r. 354.
122 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 54.

wekî cerde û nijdeyan xweşîn pê ket û deste deste û kom komî ber bi çil û çiya û geşt û seyrangehan meşiyan."[123]

Bi giştî behsa xwezayê bi rengekî berfireh di nav helbestên klasîk ên kurdî de hatiye kirin lê ji ber ku babetê me li jêr nav û nîşanên "xweza di helbestên nû yên kurdî de" ye, em nikarin zêdetir li ser xwezayê di helbestên klasîk de rawestin an bi dirêjî li ser vê mijarê binivîsin.

### 3.1.2. Xweza di Helbestên Nû yên Kurdî de

Her wekî tê zanîn, "di nav helbestên nû yên kurdî de, tuxmê xwezayê cihekî berfireh girtiye. Ev yek jî reng e ji eger û serdemên kartêkirina romansizma ewropayî be. Feylesofê fransayî Rosoy ku her gav gaziya vegeryanê ji bo hembêza xwezayê dikir digot: Xweza paqijtirîn melbend e ku mirov dikarin bi serbestî di nav de bijîn."[124]

Helbestvanên klasîk di cîhana hunerî de yek rêbaz girtiye, çi wekî mijar an awa û kêş û serwa. Wan ji der ve temaşeyî elementên xwezayê kiriye anku wesifkirina wan ji bo xwezayê bi rêjeyeke kêm an zêde rê bi hestên wan nedaye ku xweza kartêkirinê li wan bike.

Lê helbestvanên romantîk bi ruhê xwezayê re yan di yek qalbî de mijarên xwezayê lêk didin. Anku xwezaya ji derve kartêkirin li ser naxê van helbestvanan heye, wê rasterast li ser hest û sozên helbestvanan reng vedaye û di 'eynî demê de her tiştekî di nav dîmenên xwezayê de li ser xwezaya deverê werdigirin. Helbestvan li vê derê wan tiştan bi rêyên xwe yên taybet diweşînin ber destên xwendevanên xwe.

Ji ber ku helbestvanên romantîk girîngiyeke zêde didin hemî diyarde û elementên xwezayê, ew bi hûrî têkelî xwezayê dibin, gelek bi têr û teselî li ser van dîmenên balkêş radiwestin û gelek ramanan ji wan berçav dikin.

Em dikarin bidin xuyakirin ku helbestvan xwezayê bi raboriya mirovan ve girê didin. Ew behsa hindek rûdanên xweş û hindek rûdanên nexweş dikin û bi taybetî rûdanên girêdayî hilkeft û bîranînên mirovan digel xwezayê dadirêjin, bi bahaneya wê

123 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 354.
124 Ehmed, 'Edle Cemîl, *Rolê 'Ebdrehîm Rehimyê Hekarî di Nûkirina Hozana Kurdî da*, Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2003, r. 113.

yekê ku helbestvan bi rêya dîmen û elementên xwezayê beşdariyê di xem û nexweşiyên mirovan de bikin anku ji bo wê yekê ye ku helbestvan ji bo civaka xwe û bi taybetî ji bo xwendevanên xwe bidin xuyakirin ku ew digel êş û azarên gelê xwe ne.

Hindek caran helbestvan dilê xwe bi dîmenên xemgîn ên ji element û diyardeyên xwezayê diyar dikin, wekî bêhêvîbûnê û bêumîdbûnê dema ku ji ber jidestdana hindek destkeftan li cem mirovan peyda dibin. Li vê derê helbestvan rolê xwe digêrin û penayê ji bo xwezayê dibin.

Ev ji pêxemet wê yekê ye ku ew bikarin wekî hevalên dilsoz wefadariya xwe ji bo wan kesên li derdora xwe xuya bikin, ji ber razîkirinê û ji bo ku xemhilgirtinê li dev hevcinsê xwe ji dest nedin. “Ev hûrbînî di xwezayê de wisa dike ku mirov xwezaya endamî bêxt karî, ku xweza her dem di guherînên berdewam de ye, hestê naxê mirovan jî cur bi cur e. Ev liberhevdana cot xwezayê ye, pêngaveke ji bo bihevregirêdana reftarên mirovan û xwezayê ku di helbestên romantîkî de gelek berbelav e.”[125] Ev têkeliya mirovan û xwezayê tiştekî mekanîk nîne, belkî endamî ye.

“Yekemîn pêngava girêdana hestên naxê mirovan û hest û sozên wan bûye xwezaya derdoran, ev diyarde di helbestên romantîkî de zêde bi ber çavan dikeve.”[126]

Ye'nî nêrîna helbestvanên nû li ser xwezayê wisa ye ku helbestvan zêdetir digel dîmen û wêneyên xwezayê diaxivin û wekî tiştên zindî serederiyê digel wan dikin. Anku ew xwezayê wekî heyî venaguhêzin, belkî dahênanê di wê de dikin. Ev bi rengekî wisa ye ku helbestvan her tiştekî di dilê xwe de ji xweşî û nexweşiyan bi rêka dîmen û elementên xwezayê derxin.

Gelek caran merema helbestvanên romantîk serhildana welatî û parastin bûye, berevajî klasîkan ku merema wan pesindana kesên çak bûye anku meremeke girêdayî diyanetê û sofîtiyê hebûye.

Li vê derê ferz e ku em amajeyê bi hindek helbestvanên nû bidin ku bûne pêşengên helbestên nû yên kurdî

125 Ferset, Lîlyan, t: *'Ebdilwahid Loloe, el-Rumanisye*, Bexdad, 1978, r.20.
126 Selam, Kwêstan Cemal, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da*, r. 56.

### 3.1.2.1.Celadet Bedirxan

Malbata Bedirxaniyan bi dirêjahiya sedsala nozdehan û nîvê yekê ji sedsala bîstan biyaveke berfireh ji ferhenga siyasî û rewşenbîriya kurdî ji xwe re girtiye.

Her ji Mîrê Botanê, Mîr Bedirxanî bigire û heta digihe serkêşê karwanê rojnamevaniya kurdî, Mîqdad Bedirxanî û yên din mîna 'Ebdrehman Bedirxanî, Emîn Alî, 'Ebdrezaqî, Sureyayî, Mîr Celadetî, Kamuranî, Rewşenê, Sînemê… Her yek ji wan kesayetiyeke berçav e ku berhem û kesên çeleng ên kurdan bi cîhanê dane nasandin.

Celadet Alî Bedirxan jî yek ji neviyên vê malbatê ye ku tevaya jiyana xwe kiriye qurbanî ji sexmeratî xizmetkirina ziman û edebiyat û çanda kurdî. Dema em navê Celadetî dibihîsin, komeke tiştan di nav hizrên me re derbas dibin. Ew ne tenê nivîskar an jî edîb bû, belkî bi dirêjahiya jiyana xwe kar kiriye û di çendîn warên din de jî xizmeta kurdan kiriye. Xasime ew di warê rojnamevaniyê de xwedî û sernivîserê her du kovaran *Hawar* û *Ronahî* bûye. Mîna mirovekî çeleng, wî tenê piraniya karên rojnamevanî yên van her du kovaran bi rê ve birine.

Her wisa wî wekî rojnamevan an jî nivîser beşdarî di çendîn weşanên dî de kiriye, mîna *Roja Nû*, *Stêr*. Xasime wî di warê zimanî û rênivîsa kurdî de jî karekî mezin kiriye û ew yekemîn kes bû ku ji bo pirkirina valahiya zimanî û rênivîsa kurdiyê 31 tîpên latînî pêşniyaz kirine.

Di warê siyasetê de jî, wî beşdarî di çendîn rêxistin û bizavên azadîxwaziyê û çalakiyên siyasî de kiriye, ji wan jî Xoybûn ku bi daner û yekem serokê vê rêxistinê tê nasîn.

Di warê edebiyatan de jî, Celadetî karê berhevkirinê û lêkdanê li ser berhemên folklorî yên mîna serhatî û stranên kurdî kiriye. Ew bi xwe jî edîbekî nav qada edebiyata kurdan bûye. Berhemên wî, çi helbest û çi jî pexşan, şehdetiyê didin ku Celadet di warê edebiyatan de şasiwarekî çeleng bûye.[127]

---

127 Mizûrî, Azad 'Ebdul'Ezîz, *Celadet Bedirxan û Şi'ir*, (Çapa 1), Çapxaneya Hecî Haşim – Hewlêr, 2006, r. 9-10.

**Celadet û Xweza**

Helbet tê xuyakirin ku rengvedana xwezayê di helbestên Celadetî de diyar e. Dîmenên xweşik ên xwezaya Kurdistanê bûne alavên nexş û nîgarên helbestên wî, xasime ku werza biharê bi rengekî zêde bala mirovan dikêşe.

Di helbesta "Buhar"ê de, Celadet gelek dîmenên biharê yên xweşik û balkêş li deverên zozanan berçav dike ka çawa rûyekî geş li deşt û nihal û gul û gulçîçekan vedibe. Ew zêdetir behsa baranê li werza biharê dike û behsa dengê berx û mîhan û qebîna kewan dike. Celadet her wisa amajeyê bi çend elementên xwezayê jî dike, mîna berfê, deştan, cureyên gulan, bilbilan, kewan, maran, berxan…

Berf dihele li zozan

Stirî şîn in li deştan

Kulîlk hêj nuh şepal in

Gul û bilbil heval in

Buhar e, nuh buhar e

Tebî'et giş li kar e

***

Mij ketiye li doran

Hure-hure tum baran

Mih û berx in dikalin

Kew li marî dinalin

Buhar e, ev buhar e

Tebî'et giş li kar e[128]

Di helbesta "Dawet e"yê de jî, hindek wêne û dîmenên cu û cubarên ku ji serê çiyayên bilind ên Kurdistanê tên xwarê diyar in. Gulçîçek û gulzar û nêrgiz û yasemîn bi hev re di nav wê avê de dikevin govendê û semayê dikin. Mîr Celadetî li vê derê xweşiktiya xwezayê û evîna welatê xwe bi hev re girê dane, ji pêxemet wê ku xwezaya Kurdistanê xwe wekî bûkan pê dixemilîne, zêdetir merem jê berhingariya dagirkeran e.

Dengê avê çi zîz e

Newal jê re ezîz e

Welat! Welat! Welato!

Ji zozanan hat quling

Xeber anî ji xweyîng

Dê werin hewar e[129]

Di helbesta "Şeva We Xweş"ê de, Celadet hindek wêne û dîmenên balkêş ên elementên xwezayê berçav dike, mîna şevê, stêran, heyvê û rojê. Dema roj ava dibe û şev dest pê dike, asman bi hindek elementên dî yên mîna heyvê û stêr û hesareyan xweşiktiyeke dî dide ber çavan, wekî gul û gulistanan li asmanî ronî dibin ji ber ku roj û êvar diqulpin ser şevê û asman bi rengekî din xemla xwe dike û dîmenekî xweşik li ber çavên giyandaran xuya dike.

Şev e, şev e, roj çû ava

Hingurê re cihê xwe da

Roj safirî ket li doran

Soringa wê mal boran

Lê, şûna xwe vala nehişt

128 Bedirxan, *Celadet Alî, Hawar,* h. 1.
129 Bedirxan, *Celadet Alî, hawar,* h. 8.

Hêv û stêrk şandin ji pişt

Hêdî hêdî hilhatine

Li ser seran xweş hatine[130]

Di helbesta "Bilûra Min"ê de jî, dîmen û wêneyên girêdayî xwezayê hene. Dema em temaşeyî vê helbestê dikin, em dikarin bibêjin ku ew di nav pêlên Kovara Hawarê de mîna sembolekê ye. Ev helbest pirî raman û merem e, ji ber ku ew berî çendîn salan hatiye vehandin û belavkirin. Lê dema mirov wê dixwîne, mirov dibêje ku niha hatiye çêkirin anku helbesteke zindî û nemir e.

Ev helbest, Bilûra Min, wê yekê xuya dike ku çiya û zozan bi xeml û rewş in. Her wisa li derdora kaniyan govenda gulan e; gulçîçek û rihanan dîlan girtiye. Gelek dîmen wisa li wan deran hene, xasime şikeft û dar û berên serê zinaran an jî ew bayê ku ji serê çiyayan tê. Dengê bilûra wî wekî rihekî dixe canê wan û wan zindî dike. Mirov dikare bibêje ku mîna hostayekî xwedî şiyan û behremend bûye.

Bi rastî wî hindek dîmenên balkêş li ber çavên xwendevanên xwe raçandine, peyvên xwe li dû hev rêz kirine mîna ristikekê di gerdena keçeke bedew ku mirov bi dîtina wê mendehoş dibe.

Dengê blûra min,

Çiya û zozanên bilind,

Kaniyên bi gul û rîhan dor girtî,

Guhê şkevt û serê zinaran

Guhdarên te ne!

Û sura bayê xerbî,

Te di nav pelên darê de digerîne.

***

130 Bedirxan, *Celadet Alî, şam,* 18ê Tîrmehê, Hawar, h. 3.

Bilûra min,

Dengê xwe berde!

Dinya[131]

#### 3.1.2.2. Mueyed Teyîb

Mueyed Teyîb yek ji helbestvanên kurd ên astbilind e. Ew yek ji pêşengên şi'ra nû ya kurdî ye û di warê edebiyata zarokan de jî rolekî mezin gêraye. Ew ji başûrê Kurdistanê ye. Mueyed di sala 1957an de li bajarê Duhokê hatiye dinyayê û her li wê derê jiyaye û xwendina xwe ya berahiyê û navinciyê jî her li wê derê kiriye, lê xwendina xwe ya berheviyê li Hewlêrê bi dawî aniye. Ew her dem ji xwendekarên herî zîrek û serkeftî bû, ji derçûyên yekemîn bû.

Mueyedî di sala 1974an de dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Ew di sala 1978an de bûye xwendekarê koleja qanûnê û siyasetê ya Zanîngeha Bexdayê, her wê salê bûye endamê yekîtiya nivîserên kurd jî û li Bexdayê dest bi karê rojnamevaniyê kiriye. Wî li destpêkê wekî nivîser li rojnameya *Hawkarî*yê dest bi karî kiriye û paşê bûye berpirsiyarê rûpela kurmanciyê ya wê rojnameyê. Mueyedî her di wan salan de bernameyek bi navê "Her Stiranekê Çîrokeka hey" li Radyoya Bexdayê pêşkêş kiriye. Wê bernameyê zêde deng veda û di çendîn rapirsiyên li ser bernameyan de wekî pirguhdartirîn bername derket.

Mueyedî di navbera salên 1978an heta 1982yan de gelek çalakane beşdarî di bizav û kor û festîvalên edebiyatê û helbestan de li Duhokê û Hewlêrê û Silêmaniyê û Bexdayê kiriye.

Dîwana wî ya nexrî, *Stran û Berf û Agir*, di sala 1979an de ji aliyê rejîma diktatorî ya Bexdayê ve hat qedexekirin, lê helbestên wî bi destnivîsan di nav xelkî de belav bûn. Helbestên wî bûne dengê şoreşê û serhildanê û bergiriyê û hindî bibêjî li nav gelê me belav bûn. Bi hezaran law û ciwanan ew helbest ji ber dikirin û rihê azadîxwaziyê li cem wan difûriya. Her wisa gelek ji wan helbestan bûne stran jî û ketine ser devê zarok û pîr û canên vî miletê jar û bindest.

---

131 Bedirxan, *Celadet Alî, Hawar*, h. 32.

*Stran û Berf û Agir* li jêr vî navî, min diviya komeke şi'rên xwe di sala 1979an de, li Bexdayê, çap bikira, lê sansura –riqabe– çapemeniya rejîma faşîst a Bexdayê rê li min girt û çapkirina wan qedexe kir. Bi sanahî bû bo sansurê rê li çapkirina wan şi'ran bigire. Lê bi sanahî nebû ku ew bişê rê li belavkirina wan bigire."[132]

Her wekî ew bi xwe dibêje, "di sala 1982yan de ku hêşta xwendina xwe bi dawî neanîbû, ew neçar bû ku bigihêje nav rêzên şoreşê û bibe pêşmerge. Dema ew çûye nav rêzên şoreşê, wî dîtiye ku helbestên wî berî wî gihîştine nav şoreşê."

"Di sala 1982yan de ez ji Bexdayê derketim û çûme nav rêzên şoreşê, li wir min dît, şi'rên min berî min yêt gehşitîn û di nav pêşmergeyan de belav dibûn îna li wêrê jî min kasêtek tomar kir û her wesa min gelek ji wan şi'ran bi dengê xwe li radyoya dengê Kurdistanê xwandin."[133]

Di nav şoreşê de, helbestên wî bi dengê wî berdewam li Êzgê Şoreşê, Dengê Kurdistanê dihatin belavkirin.

Mueyed Teyîb di sala 1983yan de çû Îranê, paşê Suriyayê û paşê li Swêdê bûye penaber û 13 salan li wê derê jiyaye. Ew li Swêdê jî li ser karên rewşenbîrî berdewam bû. Ew bû yek ji endamên desteya nivîserên kovara *Berbang*ê ku li Ewropayê navdartirîn kovara kurdî bû û paşê bû sernivîserê wê. Di sala 1986an de, ew li Swêdê bû dersdêrê zimanê kurdî û beşdarî di amadekirina çendîn kitêbên ji bo zarokan de kir.

Piştî serhildana sala 1992yan, wî berdewam seredana Kurdistanê kiriye û beşdarî di karên edebî de kiriye. Dîwana wî, *Stran û Bberf û Agir*, ji bo cara yekê di sala 1992yan de hat çapkirin û heta niha sê caran çap bûye û ji bo ser zimanên 'erebî û farisî jî hatiye wergêran.

Mueyed di sala 1996an de bi yekcarî vegeriya Kurdistanê. Ew her wê salê zewicî û niha wî çar zarok hene û her çar jî keç in. Mueyed di sala 1999an de yek ji damezrînerên televizyona setelayta Kurdistanê bû û ji bo heyama sê salan berpirsiyarê nivîsîngeha wê ya Duhokê bû.

---

132 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, Dihok, (çapa1), 1992, r. 121.
133 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, r. 122.

Wî di sala 2002yan de weşanxaneya Spîrêzê damezirand û gelek kitêbên cur bi cur li kitêbxaneya kurdan zêde kirin, her wisa çendîn kovar jî derxistine. Wî kovara *Ciwan*ê ji bo ciwanan, kovara *Hêlîn*ê ji bo jinan, kovarên *Prêz*, *Rengiz* û *Afaq Spîrêz* jî bi zimanê 'erebî derxistin. Wî girîngiyeke zêde da warê zarokan jî; di sala 2003yan de kovara *Kepr*ê derxist û dest bi projeya "Hezar Kitêb bo Zarokan" kir ku cihekî taybet di kitêbxaneya zarokan de girtiye.

Mueyed di sala 2007an de di akademiya kurdî de bûye endamekî kara û di warên perwerandinê û fêrkirinê de li parêzgeha Duhokê rolekî mezin gêraye û piştevanekî mezin bûye ku zarokên me bi zarê dayika xwe bixwînin. Wî beşdarî û çavdêrî di kitêbên kurmancî yên dibistanan de kiriye. Di sala 2010an de jî, ew bûye endamê perlemana Îraqê û li wê derê bû peyivdarê lîsteya hevpeymaniya Kurdistanê. Di sala 2011an de û her li wê derê, Mueyed di kiryareke terorî de bi giranî birîndar bû. Ew digel bidawîhatina dewreya perlemanî, di sala 2014an de, teqawîd bû.

Mueyed di gelek festîvalên cîhanî de beşdar bûye û helbestên wî ji bo zimanên 'erebî, farisî, tirkî, swêdî, îngilîzî, fransî û elmanî hatine wergêran. Ew dîsa vegeriya ser dewama xwe ya weşanxaneya Spîrêzê û heta niha jî serokê wê ye û li Duhokê dijî. Her wisa Mueyed wekî çavdêrekî siyasî berdewam li ser şaşeyên televizyonên kurdî û yên 'erebî jî derdikeve.

Helbestên Mueyedî di qonaxên berahiyê û navendiyê û berheviyê yên dibistanên başûrê Kurdistanê de wekî nimûneyên helbestên nû yên kurdî tên xwendin. Her wisa helbestên wî li zanîngehên Duhokê, Zaxoyê û Mêrdînê bûne mijarên çendîn lêkolîn û nameyên akademîk. Her dîsa gelek helbestên wî bûne stran jî. Di sala 2014an de jî, hemî helbestên wî bi elfabêya latînî li weşanxaneya Avestayê hatine çapkirin.

**Berhemên Mueyed Teyîbî yên çapkirî.**

1. *Stran û Befr û Agir*, helbest
2. *Aştî û Viyan*, helbest ji bo zarokan
3. *Me Nevêt Tundûtîjî*, helbest ji bo zarokan
4. *Piling Dema Birsî Dibin Mirov Dema Têr Dibin*, helbest
5. *Parzînkê Şi'ri û Çîrokan ji bo Zarokan*

6. *Ferhenga Keprê ya Wênedar*, ferhengek ji bo zarokan
7. *Serbazê Xoragir*, Çîrok ji bo zarokan
8. *Kêza Tera Ciwan,* Çîrok ji bo zarokan
9. *Kevoka Aştiyê*, Çîrok ji bo zarokan
10. *Ne Mirinê Ez Divêm Ne Min Jiyan*, helbest

Ji bo nimûne;

Evroke.. Çavbeleka min..

Ya girê dayî..

Li bin kwînekê reş û diryayî..

Li nav deşteka bê bab û day..

Roja aryayî..

Xîzê şaryayî..

Zerya min ya di xuhê ra mayî..[134]

***

Ezê ditirsim..

Roja aryayî..

Kirêt biket..

Hizar deqa.. Li eniyê bidet ..

Rengê çiya.. Ji dêmî bibet[135]

Ev dîmen ji taybetmendiyên xwezaya deverên 'ereban pêk hatiye anku ev keval başûrê Îraqê ji bo me berçav dike. Mueyed Teyîb di helbesta "Fireka Bayî"yê de xuya dike ka ew ta çi radeyê bi xwezaya Kurdistanê daxbar bûye. Xweza li dev wî nîşaneka

134 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, Dihok, Çapxaneya Cizîrî, (Çapa 3), 2009, r. 19-20.
135 'Eynî Çavkaniyê, r. 20.

berhingariyê bûye ku di navbera gelê kurd û djimnan de bi rêya danberheviya du kevalên xwezayê hatiye berçavkirin. Helbestvan wan her du kevalan dide ber hev û diyar dike ku xwezaya mirovan çeqek ji jiyana wan e. Ew xwezaya kurdan û wê xwezaya ku ji aliyê dijminan ve li ser wan hatiye sepandin dide ber hev.

Ji helbesta "Ho Bêriyê"•

Ho bêriyê

Minê zanî,

Kela xerîbiyêt şivanî..

Xo havête cergê te ve.[136]

***

Ho bêriyê

Ger tu hatî..

Pirsyar bike ji darberiyê..

Bêjê:

Çewa befir li ser takêt te dibîte kevî?

Tu nakevî!

Bêjê: çewa bivir û dasa..

Hizar cara bejna te birî?

Tu nemirî![137]

Helbestvanê me wisa xuya dike ku neşê ji xwezaya Kurdistanê dûr bikeve û tahm û çêja ji wê wernegire ji ber ku ew di nav wê xwezaya xweşik û balkêş de mezin

• di Rojnameya Hawkariyê de hatiye Belavkirin, Tehsîn Tahay hindek ji vê Helbestê kiriye Stiran.
136 'Eynî Çavkaniyê, r. 63.
137 'Eynî Çavkanî ya berê, r. 64-65.

bûye. Rast e ku ew gelek caran ji ber kawdanên siyasî derbider bûye, lê her dem dîmenên mîna darberyan, berfê, keviyan… li cem wî mane da ku amajeyê bi wan bide serhildan û bergiryên miletê xwe yê stemlêkirî û ji pêxemet wê yekê ku handan xurt û ciwanên welatê xwe bike û wan ji bo parastina axa welatî hişyar bike. Lewma em dikarin bibêjin ku wesfa xwezayê digel meremên bergirîkirinê û serhildanê di helbestên Mueyed Teyîbî de hatiye têkelkirin.

Ji helbesta "Sirê Ez Birim"ê

Dêmê wê buhar

Sing û berê wê havîn

Pirça wê payîz û

Dilê wê zivistaneka sar û befrîn[138]

***

Ne rojekê

Nêrgizekê serê xo lê hilda

Ne pêlistankek

Li hindav serê min firî[139]

Di helbesta "Sirê Ez Birim"ê de, helbestvanî werzên salê bihar, havîn, payîz û zivistan bi kar aniye, ji pêxemet wê yekê ku diyar bike ku her werzek ji van di nav xwezaya Kurdistanê de tahm û çêj û xweşiktiyên xwe yên taybet hene. Mueyed her wisa wekî hostayekî şareza van dîmenên ciwan ên xwezaya werzên Kurdistanê digel evîniyê û dildariyê têkel kirine.

Di kopleya duyan de, ew behsa nêrgizan dike ku zêdetir ji bo çiyayên Kurdistanê amaje ye ji ber ku nêrgiz xemla çiyayan in. Her wisa dema helbestvanê me

138 Teyîb, Mueyed, *Ne Ba Min Swar diket ne Ax Min Peya diket*, ji Çap û Weş. Kitêbxaneya Cizîrî – Dihok, Çapxaneya Martîsê – Tirkiya,( çapa1), 2016, r. 109.
139 'Eynî Çavkaniyê, r. 110.

behsa pêlistankan dike, merema wî zêdetir ew e ku jiyana vî balindeyî mîna jiyana kurdan e. Karê wê her dem mişextibûn e ji ber ku çi cih nebûne ku ew bi serbestî û aramî pê şa bibe.

Ye'nî em dikarin bibêjin ku helbestvanê me bi rengekî balkêş xweşiktiya xwezayê digel aliyê dildariyê û xweşevaniyê tevlihev kirine, an bi rengekî din helbestvan hêzeke dî dide helbesta xwe.

Ji helbesta "Gare Herê li Cihê Xo"yê

Kê gotiye te?

Dêwek hat û destêt xo dane bin garey..

Ji warê me bir!

***

Gare herê li cihê xo may,

Hêşta kwîvî yê lê diçerin[140]

Yek ji elementên xwezaya bêgiyan çiya ye, lewma helbestvanî zêde girîngî daye çiyayan. Mueyed gelek caran penayê dibe ber dîmenên van elementan, wekî pirsiyarekê dike û paşê wisa bersivê dide ku çi kesekî hêza çiyayan nîne. Helbestvan wisa dide xuyakirin ku ew peywendiya di navbera çiyayan û serhildanê de zêde mikom û bihêz e. Mimkun e ku ev bandora xwezayê ya li ser Mueyedî ji wê yekê be ku ew bi xwe têkelî çiya û xwezaya çiyayan bûye.

Ji helbesta "Befr"ê

Min veşêrin,

Li kopê çiyayekê befrîn ..

Befr û kevî jê bar neken ..

---

140 Teyîb, Mueyed, *Stiran û Befr û Agir*, r. 103-104.

Ger lê har bû germ û havîn

Da ez jî mîna Ademî

Bizivirmev nejadê xo

Bibme befir ..

Bibime kevî![141]

Bandora dîmenên çiyayan li ser vî helbestvanî heta wê astê bilind bûye ku gelek caran ew bi xwe têkelî çiyayan dibe û dixwaze ku piştî mirinê jî ew li serê çiyayan û di nav berfê de bê veşartin ji bo ku ji hevaliya berfê û çiyayan dûr nekeve û careke dî bibe berf ji ber ku ew serê çiyayên bilind û gopên berfîn ji bo cih û warên xwe yên piştî mirinê destnîşan dike. Wisa diyar e ku çiya aramiyê û tenahiyê û bexteweriyê dide helbestvanî.

Ji helbesta "Buharvano"yê

Çi şînî ye û çi zêmar e?

Binefş û nêrgiz çirimsîn..[142]

***

Gotin

"adarok bo me şîn kirin"

Lê adarok ..

Her li roja diwê mirin

Berze kirin[143]

---

141 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 44.
142 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 15-16.
143 'Eynî Çavkaniyê, r. 15-16.

Di helbesta “Buharvano”yê de, helbestvanî mijara gul û giyayên ku taybet li Kurdistanê şîn dibin hilêxistiye. Wî viyaye bi rêya wan zêdetir têkelî vê xwezaya xweşik bibe, bi taybetî li werza biharê ji ber ku gelek bîrhatinên xweş û nexweş di meha adarê de hene. Lewma jî helbestvan di vê helbestê de wêneyên balkêş dide ber çavên wergirê xwe, mîna înana navên çend gulekan, binefş û nêrgiz û adarok. Ev her sê gul li çiyayên Kurdistanê tên dîtin, lê merema helbestvanî ji adarokê 11ê adarê ye. Helbestvan şiyaye bi hosteyiya xwe û bi rêya wênekirina serbora vê gulê çarenivîsa rêkevtinnameya 11ê Adarê vegêre û bide diyarkirin.

## 3.2.XWEZA DI HELBESTÊN QADIR QAÇAX Û EDÎB ÇELKÎ DE

### 3.2.1. Xweza Û Xweşiktiya Jîngeha Kurdistanê

Xwezaya Kurdistanê bi giştî û jîngeha Kurdistanê a xweşik bi taybetî bandoreke rasterast li ser her du helbestvanên me, Qeçaxî û Çelkî, heye. Ev yek jî ji bo viyana wan a bêtixûb ji bo jîngeh û xwezayên Kurdistanê vedigere. Em dê ji pêxemet vê mijarê hindek mînakan ji helbestên wan bidin ber çavan.

Qadir Qeçax di helbesta “Çiya Hwîvî”yê de di rasta jîngeha Kurdistanê de dibêje:

Rewşa welatê min çiya

Wargehê pirr gul û giya

Jîngeha kew kwîvî ya

Çeperê xir tengaviya

Cihê umêd û hwîviya[144]

Qeçaxî di dîwana xwe ya bi navê *Çiyavîn*ê de zêdetir ji hezar navên çiyayên Kurdistanê bi rengê helbestê vehandine. Bêguman jîngeha Kurdistanê bi çiyayan navdar e, lewma helbestvan Qeçax wesfeke yekcar xweşik dide elementên jîngehê,

[144] Qeçax, Qadir, *Çiyavîn,* (Çapa 1), Çapxaneya Hecî Haşimî, Hewlêr, 2005, r. 64.

mîna çiya û gul û giya û kew û kûviyan. Bi rastî rewşa jîngeha Kurdistanê bi van dîmenên balkêş dibe palder ku mirov xwe gorî welatê xwe bike ji ber ku hemî hêvî û umêdên mirovan di nav vê jîngehê de bi rengekî azad henaseya xwe hildikêşin.

Her wisa Edîb Çelkî helbesteke taybet bi navê "Jîngeh"ê heye. Ew jî ev helbest e;

Jîngeh

Xeml û semyana me ye

Jêderê mana me ye

Gemiya hemû zindîya

Jîngeh jiyana me ye

***

Ger ba ye ger ax û av

Gerdûn û asman û tav

Canewer dar û giya

Biparêzin wan hergav

***

Mala me ye ev geştî

Diparêzît Siroştî

Her kesê wê wêran ket

Bi destê xo xo kuştî

***

Pîrs Govend û Şirîn

Rûkuçk û Zê û Rûyê Şîn

Jiyan û jîngeh parast

Şaneder şkefta dêrîn[145]

Edîb Çelkî bi xwe di dîdarekê de sebaret vê helbestê dibêje: “Ev helbest dibe yekemîn helbest li ser mijara jîngehê ku bi hûrî behsa xeml û rewş û parastinên Kurdistanê dike.”[146] Bêguman ew di vê helbestê de dîmenekî xweşik dide jîngehê, tevlihevbûnekê di navbera hemî zindiyan û jîngehê de berçav dike. Ew her wisa bangî mirovan dike ku her tiştekî di vê gerdûnê de biparêzin, mîna ba û ax û av û canewer û dar û bar û giyayan. Ew van elementên xwezayê bi gemiyekê yan keştiyekê wesf dike; dema kesek jîngehê wêran dike, ew bi destên xwe vê gemiyê bin av dike. Pîrs û Govend û Şirîn navên sê çiyayan in û Rûkuçk û Zê û Rûyê Şîn navên sê çeman in. Ev çiya û çem dikevin deverên Amêdiyê û Barzanê û Mêrgesorê. Her ji kevin de û ta niha jî, jîngeh li van deveran -xasime li devera Barzanê- hatiye parastin.

Her wisa Edîb Çelkî di helbesta “Şêx 'Ebdilselamê Barzanî” jî de behsa hindek qanûn û destûrên parastina jîngehê dike;

Rêxist civak jîngeh parast

Li her gundî çê kir civat[147]

Bi rengekî taybet li devera Barzanê, li ser destûra şêxên Barzanê, jîngeh hatiye parastin. Bê destûra şêxê wan, çi kesek nikare teyr û tewalan, masiyan û giyanewerên kûvî bikuje. Ne her ew, çi kesek nikare darên terr û şîn jî bibire. Anku li dû qanûnên jîngeha devera Barzanê, ew kes tên sizadan.

Her wisa helbestvan Qadir Qeçax helbestek li ser talankirin û jinavbirina jîngeha Kurdistanê heye, dibêje;

Wî serdemê

[145] Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2010, r. 100-101.
[146] Çavpêkevtineka Taybet bi Helbestvan Edîb Çelkî re, *li Pertûkxaneya Bedirxanyan*, Dihok, 8/5/2017.
[147] Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, (Çapa 1), Çapxaneya Girîn Gilorγê/ Beyrut – Libnan, 2016, r. 20.

Welatê min

Bi tundî ketiye

Ber pêlan!

Bombe û topa

Çiya û rez û zevî

Dikêlan

Jehr û kîmya...

Kanî û cok û rwîbar

Dişêlan,[148]

Kurdistan ji wan welatan e ku xwezayeke xweşik û delal heye. Ew ji çiya û av û av û rûbar û rez û bax û bostanan û gelek tiştên dî pêk tê. Ji aliyekî ve, ev jîngeh û xweza ji bo kurdan û xasime ji bo xelkê gundan bûye çavkaniya jiyan û jiyara hemî civakê. Dahata xelkê gundan bara pirtir ji xwezayê bûye. Lewma dijminan dest bi sotin û jinavbirina jîngehê û nehêlana xwezaya Kurdistanê kiriye. Ye'nî helbestvanê me behsa serdema rejîma Be'sê dike. Rakirina enfalan bi ser gelê kurd de nexweştirîn rewş bû ku kurd ketibûn tê de. Ji encamên reftarên xirab û neşaristaniyên rejîma Be'sê li dijî kurdan, gelek tişt bûn qurbanî. Wan çekê jehrîn ne tenê ji bo kuştina mirovan bi kar anîn, belkî niyeta wan talankirina jîngehê û nehêlana hemî çavkaniyên jiyan û jiyaran bû. Bêguman jiyana kurdan li ser dar û bar û bostan û zevî û rezan û tiştên wisa bûye. Xwe kanî û rûbar jî bi destên dijminan hatine jinavbirin û têkşêlan da ku çi kesek mefayê ji wan neke. Em dikarin bibêjin ku dijminên kurdan bi hemî reng û rûyan jiyan li ber çavên wan reş û tarî dikir.

Her wisa helbestvan Edîb Çelkî jî di helbesta “Nêrgiza Xamtîrî” de jîngeha Kurdistanê bi baştirîn şitt wesf dike, dema dibêje:

Te çav nêrgiza Xamtîrî

[148] Qeçax, Qadir, *Bizot*, (Çapa 1), Çapxaneya Hewlêrê, 2003, r. 18.

Por mîna pêlên Xabîrî

Pira berî bejna te ye

Her dem û gav min tu li bîrî[149]

Çelkî di vê helbestê de dilbera xwe bi çendîn cihên şûnwarî yên jîngeha Kurdistanê diwesfîne, mîna çiyayê Xamtîrî, rûbarê xabûrî, pira delalê, hwd. Ji aliyekî ve, xuya ye ku wî şarezatiyeke baş di jîngeha Kurdistanê de heye ji ber ku ew ji bo heyama dozdeh salan li çiyayên Kurdistanê pêşmergeyekî çeleng bû. Ji aliyekê dî ve, xwendevan dizanin ku Çelkî ev cihên pîroz û hemî jîngeha Kurdistanê her dem li bîr in ji ber ku dema tu tiştekî ku tu bevînî bi tiştekî dî biwesfînî, tiştê duyê bibuhatir e. Ye'nî tu tiştê yekê devînî û tu dixwazî wî bikî baştirîn, lewma tu wî bi baştirîn tişt diwesfînî. Di vê helbestê de, dilbera wî tiştê yekê ye û ew cihên jîngeha Kurdistanê ku Çelkî dilbera xwe bi wan diwesfine tiştên duyê ne.[150]

Hejayî gotinê ye ku nêrgizên çiyayê Xamtîrî bi xweşiktiya xwe navdar in, lewma Çelkî helbesta xwe bi "Nêrgiza Xamtîrî" bi nav kiriye. Her wisa em dikarin bibêjin ku Çelkî nêrgizên Xamtîrî ji bo xweşiktiya jîngeha Kurdistanê kirine çeveng. Anku wî şarezatiyeke baş di jîngeha Kurdistanê de heye û ev jî ji bo neteweperweriya wî vedigere.

Her wisa Çelkî di helbesta "Şivanê Garey" de dibêje:

Rêvas gaz diket: ez û tu

Pêkve naçîn çi dîwana[151]

Bêguman rêvas li nav jîngeha Kurdistanê giyayekî berbelav û nas e, xasime li deverên çiyayî. Ev gotin jî gotineke pêşiyên kurdan e û merem ji wê ew e ku kurd û 'ereb du milet in û qet nabin yek. Şivanê Gareyî jî dibêje dijminan ku Kurdistan welatê kurdan e, ne yê wan e.

149 Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2010, r. 32.
150 Meley, Zinarê 'Ednanî û Mecîd, Mislim 'Ismet, kovara helbestê, jimare 9, 2013, r. 11.
151 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 14.

### 3.2.2. Xweza û Niştîmanperwerî

Niştîmanperwerî hesteke yan hezeke ku derbirînê ji viyaneke mezin dike û berjewendiyên gel û niştîmanî ji hemî berjewendiyên takekesî û mezhebî û siyasî û partîtî li cem mirovan mezintir dike, ta wê radeyê ku mirov gelek şanaziyê bi welat û niştîmanê xwe bike. Lewma dema helbestvan ji welatê xwe dûr dikevin, ji xerîbî û evîna welatê xwe penayê dibin ber xwezayê anku ew elementên xwezaya welatê xwe ji bo derbirandina hest û evînên xwe li beranberî niştîman û welatê xwe dike alav. Her du helbestvanên me, Qeçax û Çelkî, di ciwantiya xwe de çûne nav rêzên şoreşê li deverên çiyayî û piraniya helbestên xwe di nav xwezaya Kurdistanê de vehandine. Naveroka helbestên wan bi serhildanê û bergiriyê tije ye. Her wisa mora elementên xwezayê jî di helbestên wan de xuya ye, mîna çiyayan, rûbaran, kaniyan, kelan, şikeftan, gulan, giyandaran hwd. Ye'nî dikarin bibêjin ku xwezaya Kurdistanê bandoreke yekcar mezin li ser hest û hizr û bîrên wan kiriye ku viyana gel û niştîmanan ji her tiştekî mezintir û bilindtir be. Her wekî Qadir Qeçax di helbesta "Swînd"ê de dibêje:

Xozî min dîtba

Ew dem zwî hatî

***

Mezintrîn swînd û pîroztirîn

Swînd bi tinê li ev biba

Bi axa wilatî[152]

Qeçax di vê parçehelbestê de wisa dide xuyakirin ku li cem her neteweyekê ax pîroz e, lewma hêvî û umêdên wî ew in ku sûnda bi axa welatî bibe mezintirîn sûnda xelkî. Rast e ku ax jî elementekî vê xwezayê ye, lê merema serekî ya Qeçaxî viyana vî niştîmanî ye. Çavkaniya viyana mirovan a bêtixûb ji bo xwezaya xweşik a Kurdistanê vedigere, mîna ax û av û deşt û çiyayên Kurdistanê.

Her wisa helbestvan Edîb Çelkî di helbesta "Warê Me"yê de dibêje:

[152] Qeçax, Qadir, *Beyana Min,* (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2015, r. 70.

Warê me hemiyan e, dayka dilovan e

Pir bedew û rind e, şirîn û ciwan e

Li ser demên dêrîn tev da himbêz kirîn

Dagîr û çar par kir xaka niştîmane

***

Çerxa demî zivirî, roja kurdan helat

Milet tev hişyar bû, canê xo kir xelat

Hevgirtin yekêtî, aştî û dîmokratî

Rêkên çareser in bo azadyia welat[153]

Çelkî di piraniya helbestên xwe de evîna xwe ya mezin ji bo niştîmanê xwe Kurdistanê radigehîne. Hestên Çelkî yên niştîmanperwerî gelek bihêz in ji ber ku kurd mezintirîn neteweya tevaya cîhanê ye ku ta niha dewleta xwe nîne. Di benda duyê de, Çelkî daxwaz dike ku kurd bibin yek û aştî û demokrasî dirûşma wan be da ku kurd her dem serkeftî û bextewer bin. Ji bo zanîn ev helbest li ser kêşa folklorî ya dîlanan ya "6+6=12" hatiye nivîsandin, lê serbenda wê li ser kêşa dîlanan "6 birgeyî" hatiye nivîsandin. Çelkî di helbesta "Di Peristgeha Welatî de"yê de dibêje:

Welatê min

Her wesanê..

Çaxê rwîbarê evîna te yê pir mey

Bi ser dil da dihête xar

Zistanê lê diket bihar

***

[153] Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, (çapa 1), çapxaneya girîn giloriyê/ Beyrut – Libnan, 2010, r. 72-73.

Welatê min

Min tu divêy

Temet kêlî yên şehîda

Min tu divêy

Temet dalxên penahinda

Min tu divêy

Temet serhildanên kurda[154]

Çelkî di vê helbestê de behsa wan qehreman û pehlewanan dike ku canê xwe ji bo azadiya welatê xwe kirî qurban, mîna Nurî Şawîsê nemir, şehîdê nemir Memo Cotyar Amêdî û hevalên wî. Wî ev şehîd mîna nîşana niştîmanperwerî wesfandine.

Her wisa Qeçax di helbesta "Hwîviya Serketinê" de dibêje:

Welatê min Kurdistan

Vêt nemînî parçe parçe

Rewşa çiya û rwîbar û kanî

Hemî kurda êk armanc e[155]

Helbestvanê me di vê helbestê de hindek elementên xwezayê dide ber çavên me, mîna çiya û rûbar û kaniyan. Qeçax her ji kevin de yek ji kesên niştîmanperwer bûye, ev jî belgeyek e ku di helbestên wî de xuya dike. Her mijareke girêdayî xebatê, têkoşanê, bergiriyê, berevaniyê û viyana welatî û axê û alayê û tiştên wisa anku hemî mijarên niştîmanî û neteweyî di helbestên wî de reng vedidin.

[154] Çelkî, Edîb, *Stiranên Zêy*, pertûkxaneya Xanî, Dihok, 2017, r. 47.
[155] Qeçax, Qadir, *Kel û Şkeft*, (Çapa 1), Çapxaneya xanî, Dihok, 2007, r. 90.

### 3.2.3. Xweza û Jin

Dema danberheviyek di navbera xweşiktiya xwezayê û ya jinan de tê kirin, ew yek ji me re xuya dibe ku xweşiktiya xwezayê li beranberî xweşiktiya jinan çi girîngiya xwe li cem helbestvanên romantîk nîne. Lewma helbestvanên romantîk bi rengekî giştî xwezayê û xweşiktiya wê wekî jinan dibînin, bi wê sedemê ku xweşiktiya jinan û sîfetên wan di nav xwezayê de bi ber çavan dikevin. Ye'nî careke dî xweza şîrîntir û qeşengtir xuya dibe. Helbestvan Edîb Çelkî di her sê dîwanên xwe de mijara evînê û wesfa jinan bi elementên xwezayê hatine saloxdan, taybet di dîwana *Dara Çilawaz*ê de, peyman, kaniya evînê, postê vala, dilber, dîlane, têlînaz, şahjina rojhlatê, 'aşqim û gelekên dî mînakên herî berçav û xurt in. Xasime ku çelkî di helbesta “Peyman”ê de dibêje:

Were peyman were yarê

Dêm genimê kezî marê

Şema zendê sing hinarê

Te şeland xemla biharê

***

Te xemla biharê şeland

Perde li ser raza heland

Sore rwîya wan hirmîya

Nêçîr kirim te dil revand

***

Periya min nazik û nerm e

Heyvê ji dêmê wê şerm e[156]

---

[156] Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2010, r. 16.

Helbestvan Çelkî di vê helbestê de evîna yara xwe bi hindek elementên xwezayê teşbîh dike, mîna maran, hinaran, hirmiyan û heyvê. Evîna xwe ya mezin bi wesfandina sîfetên yarê behs dike, mîna dêm û kezî û sing û rûyan. Xemla bejn û bala wê xemla biharê şelandiye. Ye'nî ew tevlihevbûnekê di navbera xwezayê û yara xwe de berçav dike.

Her wisa Qadir Qeçax di helbesta "Cotkekê na"yê de dibêje:

Rwîgehê te

Kevî befrek

Sor û spî ye

Li komte çiyayê

Zozana

Cot lêvêt te

Perêt gula

Mexmeliye

Li nav aqar û

Bîstana

Eniya te berperekê

Kaxezî ye

E lê dinivîsim

Hozana

Gerdena te

Ji xal û nîşana

Tijî ye[157]

Dema ku helbestvan xweşiktiya xwezayê bi evînê û dildariyê re têkel dike, ew hêzeke nû bi helbesta xwe dide her weku li destpêka helbesta xwe penayê dibe ber wênekirina çend elementekên xwezayê yên mîna berfê, çiyayî, zozanan, gulan, aqarî û bostanan û yara xwe bi wan diwesfîne. Her wisa ew di helbesta "Valantayn"ê de dibêje:

Pir pîroz e roja dila

Bihar diyar li serêt mila

Stirîna dengê bilbila

Belatînk dadin ser tila

Evîndar bikene cot mila

Bi maç û hingvîn û kakila

Soz da şalwîla bo gula[158]

Qeçax di vê helbestê de vê rojê ji bo dildaran girîng dinirxîne û pîroziya wê dide ber çavan. Evîndar bi gulên sor pîrozbahiyê li hev dikin. Ev roj ne tenê ji bo evîndaran şahî ye, lê xweza bi hemî elementên xwe ve di nav şahiyê de ye mîna ku bihar dixemile, bilbil distrin û pelatînk li evîndaran kom dibin. Ye'nî di vê rojê de evîndar sozên xwe nû dikin û lêborîn xuya dibe.

Her wisa Edîb Çelkî di helbesta "Kaniya Evînê" de 'eşqa xwe û payîzê û gula solînê tevlihev dike û dibêje:

Paîz hat û solîn weryan

Dilên me li kovana çeryan

Ji germa 'eşqa min û te

157 Qeçax, Qadir, *Bizot*, (Çapa 1), Çapxaneya Hewlêrê, 2003, r. 149.
158 Qeçax, Qadir, *Gyandarperwer*, (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2007, r. 72.

'erd û 'esman bo me giryan

***

Ev 'eşqa hinde kevnare

Rê naçinê nîne çare

Hindî diborin sal û zeman

Herdem ya xurt û siyar e[159]

Çelkî mîna helbestvanekî romantîkî payîzê werzê zerbûnê û dilşikestinê û 'emirkurtiyê dibîne, xasime di vê helbestê de gelek bêhêvîtî û reşbînî û rondbarandin berçav in. Erd û asman ji bo evîna wan rondikan bi ser dar û ber û deryayan û çiyayan hemî tiştan de dibarînin. Solîn 'emirkurt e, lewma helbestvanî ew ji bo mijara xwe hilbijartiye. Solînê du raman hene; ya yekê ew coya avê ye ku di bin erdî re diçe ku hindek ji wê re "nihîn"ê dibêjin. Ya duyê gul an kulîlka nîv vebûyî û nîv bişkivî ye ku hindek ji wê re "beşoj" dibêjin. Li vê derê, merema helbestvanî ew kulîlkên payîzî û nazik in ku 'emirkurt in û her dem bişkuj in ku bi navê "canemerg"ê jî navdar in. Ye'nî Çelkî di vê helbestê de xweşiktirîn derbirîna edebî bi kar aniye; payîz bi rengê zer wesfandiye ku di xwezayê de wisa xuya dibe û peyva 'eşqê hevderdî giryanê kiriye.

Çelkî di helbesta xwe ya "Dilber"ê de jî sebaret mijara evînê tevlihevkirineke xweşik di navbera dilbera xwe û elementên xwezayê de dike;

Çav nêrgiz e, dêm esmer e

Xanim du cara dilber e

Carek dilê min biriye

Carek jî dilê wê ber e

***

Birûsk im, agir û gor im

---

[159] Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2010, r. 18-19.

Li ser pêlên bay difirm

Bo dîdara çavên te yar

Her şev deryayan dibirim

***

Tu axirîn vîna min î

Kûrtirîn birîna min î

Tu hebûnî, tu nebûnî

Tu havênê jîna min î

***

Xewnên 'eşqa te dûr birim

Bes e te ez êxsîr kirim

Çaverê bim heta kengî

Were dilber te pîr kirim[160]

Helbet Çelkî helbestvanekî bihinêr e; wî kariye nêrgizê û yara xwe xweşik tevlihev bike. Diyalogeke ruhî di navbera helbestvanî û nêrgizê û xwezayê û gulan de peyda dibe. Nêrgiz gelek caran bûye nîşana çavan, lê di edebiyata cîhanî de nîşana xweperestinê ye ku çîroka wê ji bo efsaneyeke yewnanyan vedigere. Lê li cem kurdan, nêrgiz nîşana evînê û dildariyê û dostaniyê ye û xasime ji bo çavên şîn.

Çelkî bi rengekî balkêş behsa dilberê dike. Dilber navekî jinan e û wekî wesf jî ji jinên gelek nazik û bedew tê gotin. Di koka xwe de, ew ji du peyvan pêk hatiye; "dil" û "ber". Manaya wê dilber e û ji dilbirinê û dilrevandinê hatiye anku dilê evîndarên xwe bi xwe re dibe. Li vê derê, helbestvanî gotiye: ev xanim du caran dilber e; carekê

[160] Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, (Çapa 1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2010, r. 26-27.

dilê min biriye û carekê jî dilê wê ber e û kevir e û nerm nabe û alaya spî bilind nake. Benda duyê ‘tu hebûn î, tu nebûn î’ gelek ramanan dide, lê yên herî girîng ev in;

Yek: Hebûna min bi hebûn û nebûnên te ve girêdayî ye. Tu hebî, ez jî heme. Tu nebî, ez jî nînim.

Du: Rast e tu heyî, lê tu nînî ji ber ku destê min nagehe te û hêşta tu ya min nînî.

Benda dawiyê “xewnên 'eşqa te duyr brim” gelek xembar e; ew di şoka yara xwe de mîna bendekî yan êsîrekî xuya dibe. Ew hind ji himbêz û xerîbiyên yara xwe dilsotî ye ku ji dîtina wê bêhêvî dibe, lewma dibêje: ez kal bûm, lê dilê wê her geş e.”[161]

### 3.2.4. Xweza û Derûn

Bêguman ew bêhêvîtî, reşbînî û nexweşiyên helbestvanên romantîk di nav elementên xwezayê de dibînin mîna werza payîzê û gula solînê û adarokên 'emirkurt û sîsbûna gij û giya û dar û beran ji rengvedana xem û nexweşî û bêhêvîtiyên derûna helbestvanî bi xwe ye ji ber ku payîz bi xwe bêhêvî nîne. Ye'nî ew derbirîna derûna helbestvanan e; ew ji derûna xwe ve xemgîn in. Ev xemgînî û diltengiya derûnî ketiye ser elementên xwezayê jî. Dema helbestvan behsa sîsbûn û zerbûna her elementeke xwezayê yan weryan û hişkbûna belgên daran an jî awazên xembar ên balindeyan di werza payîzê de dikin, ew derbirînê ji derûna xwe dikin. “Dema helbestvanek behsa hişkbûn û behtîna baxan û sîbera tarî û ewran û mirina gulan dike, van hemî wêneyên biçûk tînin ji bo ku wêneyê mirovekî xemgîn pê çê bikin ku hest bi nêzîkbûna mirinê dike û ew jî helbestvan bi xwe ye.”[162] Ev diyarde bi rengekî giştî li cem hemî helbestvanên romantîk heye û reng vedaye.

Helbestvanên romantîk yên kurd jî mîna helbestvanên romantîk yên cîhanê payîzê nîşana sîsbûnê, mirinê û bêhêvîtiyê datînin ji ber ku ew bi xwe jî di naxê xwe de hest bi bêhêvîtiyê dike û mirina xwe û mirina gul û giyayên payîzê bi hev re girê dide.

[161] 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 27.
[162] Elhemdanî, Salim Ehmed û Ehmed, Faiq Mistefa, *el-Edeb el-'Erebî el-Hedîs,* Dar el-Kutub lîl-Tîba'e wel-Neşr, 1978, r. 201.

Helbestvan Qadir Qeçax di helbesta “Bizav”ê de axê û xwezaya Kurdistanê bi rengekî xweşik tev li derûnê xwe dike;

Ew nêrgiza bi xwîna 'ewra

Bête avdan

Ji ber bêhna wê

Hişyar dibin

Pepûk û tûk

Ew mamiza

Xelkî digotê bêxodan

Careka dî lê peyda bûn

Penc û nînok

Ew kadiza

Tevin raçandin li asmana

Bûye xodan şêrek û nîşan[163]

Qadir Qeçax di vê helbestê de hindek dîmen ji xwezaya welatê xwe bi kar aniye, mîna nêrgiz û ewr û pepûk û tûk, mamiz û asmanan. Bi van elementên xwezayî, ew li ser rewşa nebaş derbirînê ji derûna xwe dike. Demekê xelkê Kurdistanê ji xweza û jîngeha welatê xwe gelek hez dikir û ew çendîn sal û zeman bûn ku wan berevanî jê dikir da ku jîngeha wî biparêzin. Wan roj bi roj zêdetir xebat dikir û baştir berevanî ji Kurdistanê dikir. Merema wan tenê ew bû ku azad di nav xwezaya Kurdistanê de bijîn, lê dagirker hatin û ev welatê hind salan kurdan parastî û li ser axa wî jiyan, bi hêsanî dagir kir û xewnên kurdan pûç kirin. Dagirkeran hemî tişt wekî xwe zîvirandin û ka

[163] Qeçax, Qadir, *Bizav*, (Çapa 1), Rajan, Kurdistana Îranê, 1984, r. 83.

çawa “pencan” li ser jiyana her kesekî xirabî hene, wan wisa -wekî pencên tûj- serederî bi xelkî û xwezaya Kurdistanê re kir.

Qeçax her wisa di helbesta “Hewara Tayinkucî”yê de jî behsa kîmyabarankirina cih û war û jîngeh û xwezayên Kurdistanê dike;

Werin berif Hîruşîma

Werin hêv den...

Daxa kîra cegera min

Jiyê nazikê

Diwazde salî

Bê sal borîn û bê gotin

Di çirkekê da...

Bû pîrejin[164]

Ev yek ji wan mijaran e ku Qeçaxî pena birye ber wan. Di çend çirkekan de, dagirkeran mirov û xweza û dar û berên Kurdistanê hemî bi hev re ber bi pîrîtiyê, mirinê, sîsbûnê û nemanê ve birin. Qeçax Kurdistanê bi Hîroşîmayê dişibihîne; heman karesat rejîma 'Îraqê jî bi serê gelê kurd anî. Lewma ew dibêje: werin hîroşîmayê bibînin; neyaran ji nişkekê ve û di çend çirkeyekan de hemî tiştên xweşik ber bi nemanê birin. Wî ev rewş jî bi pîrejinan şibihandiye.

Helbestvan Edîb Çelkî di helbesta “Wexera Dûr”ê de dibêje:

Were bibîne sal û dema

Xemla biharê çû nema

Gemiya jînê rê winda kir

---

[164] Qeçax, Qadir, *Bizav û Amanc*, (Çapa 1), Çapxaneya Wezareta Rewşenbîryê, Hewlêr, 2000, r. 66.

Keftim derya qehr û xema

***

Bîrhatin û peyvên şirîn

Bûne dastanek agirîn

Keyf û kenî .. Bûne keser

Xoşî û sema .. Bûne birîn[165]

Çelkî di vê helbestê de derbirînê ji wexera yara xwe dike, mîna bihareke xemla wê behtî û gemîvanekî rêya xwe winda kirî. Ew ji derûna xwe ve mîna kesekî şepirze ye, hemî bîrhatinên wî bûne destaneke reş anku ew mîna kesekî ku hizr û bîran dûr biriye bi derûna xwe re danûstandinê dike û dibêje: Kêf û kenîn, xweşî û sema bûne keser û birîn. Ev dîmen di helbesta "Razên Çiya"yê jî de xuya dibin;

Êvariyekê..

Li perê gundî rwînîştî me

Pêlên derya kûra hizra

Veşartîme

Bayek hat û ez rakirim

Bilind kirim

Heta geham rasta çiya

Rasta zozan û kêriya

Min hewar kir ji dilek sotî:

-Ho çiyawo

[165] Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, r. 82-83.

Boçî serê te yê spî ye û

Rondikên te xoş dibarin

Dikeye girî?

Diyar e nîşanên pîryê ne û

Îro sube

Tu dê mirî?[166]

Çelkî şiyaye mîna hostayekî şareza derbirîneke balkêş ji derûna xwe bike, bi hindek peyvên mîna êvar û barîna rondikan û pîrî û mirinan. Ew xwe û hindek elementên xwezayê hevderd û hevxem dibîne, mîna pêlên deryayan û ba û çiya û zozanan. Çelkî her wisa di helbesta "Xewnistan"ê de dibêje:

Ne min roj in ne min şev in

Hewrên xema naverevin

Ax ji destê vê qederê

Xewn û hîvî vêk nakevin

***

Demê diçim nav şûnwara

Maç dikim ez ber û dara

Dibêjim ez hizar xozî

Bo wan dema û wan rojgara[167]

Kêşa vê helbestê "4+4=8" hatiye vehandin. Çelkî peyvên qeder û xewn û hêvî û xwezî û xeman wekî derbirîn ji naxê xwe derdixe û bi hindek elementên xwezayê

[166] Çelkî, Edîb, *Stiranên Zêy*,(Çapa2) Pertûkxaneya Xanî, Dihok, 2017, r. 32.
[167] Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, r. 93-94.

diwesfîne, mîna şev û roj û ewr û ber û daran. Merema helbestvanê me ew e ku dilê xwe rihet bike û xasime dema ku elementên xwezayê tev li êş û xemên xwe dike, mîna hevalekî dilsoz hevderd û hevxem bi wî re dimîne.

### 3.2.5. Bîr û Bawerî û Newroz

Bêguman her helbestvanek di serdemekê de dijî û girîngiyê dide hizr û bîr û baweriyên aydyolojyekê û pêgiriyê bi wan dike û ew aydyolojî di nav deqên wî yên edebî de reng vedide.

Berçavkirina guherînên hizr û bîrên her du helbestvanan, Qeçaxî û Edîbî û li dû zincîreya dîwan û helbestên wan, em dikarin arasteyên wan ên aydyolojî bi vî rengî xuya bikin:

Rast e ku ev her du helbestvanên me ji binemalên dîndar in, lê vê yekê çi rengvedan di nav deqên helbestên wan de nîne anku viyana welatî û axê û kelepora miletî yek ji sedem û palderên serekî yên hişyarbûnê ji xewa xefletê û bindestiyê û derdeseriyê û zulmê û stemê ye. Kurdistanê jî ev hemî ji destên dijminan û kesên xayîn û xwefiroş û beg û axa û 'eşîretan dîtine û wan dîndarên ku berevanî ji miletê xwe nekirî û li ser kuştin û enfalkirina kurdan bêdeng mane. Bi vê meremê, em dê cuda cuda behsa wan her duyan bikin.

#### 3.2.5.1. Qadir Qeçax û Bîr û Bawerî

Dîtin û nêrînên bi vî rengî xuya dibin; axa û beg û 'eşîret û şêx û mela bûne sedema sereke ya bindestbûna kurdan. Lewma jî ew her li destpêka vehandina helbestan hêrişê dike ser şêx û beg û axa û melayan. Ye'nî piştî hişyarbûna helbestvanî û xasime dema ku ew çû nav rêzên şoreşê, wî xwestiye ku wê yekê bi rengekî kiryarkî anku praktîkî bike û bi rastî xizmeta gel û welatê xwe bike û lewma jî wî karê xwe yê sereke kiriye hişyarkirina xelkî li ser hizr û bîrên netewetiyê û di nav tex û çînên miletî de belav dike. Qeçax di helbesta “Hîngê”yê de behsa kesên xayîn û xwefiroş dike;

Ger netewekê neman qareman

Hîngê netewe diçit berev neman

Ger ne bi harîkariya xaînan

Bihostek axê naête jidestdan

Bi helwêst û dad û xokirinequrban

Milet dibit xodan dewlet û semyan[168]

Qeçax di vê parçehelbestê de xuya dike ku her dema di nav her welatekî yan miletekî de qehreman û pehlewanên azadîxwaziya miletî neman, hingê ew milet ber bi nemanê diçe û hebûn û nasnameya xwe ya neteweyî di nav hemî miletên cîhanê de ji dest dide. Ew her dîsa xuya dike ku heger bi alîkarî û piştevaniya xayîn û xwefiroşan nebe, dijmin çi caran nikarin xwe bihostekê jî ji axa miletî bistînin. Ye'nî milet bi qehreman û pehlewanên xwe, bi hizr û bîr û baweriyên xwe, bi parastina dadiyê di nav welatî de û bi qurbanîdanê digehin hêvî û armancên xwe û dibin xwedî dewlet û semiyan.

Qeçax her wisa di helbesta “Ferman û Helwîst”ê de jî bîr û baweriyên xwe li ser 'eşîretan û dîndaran xuya dike;

Nextê azadî û dîmokratî û aştiyê

Rondik û xuhdan û xwîn e

Pîr bawer în 'eşîrî û ol

Penceşêrin ji bo qeware û dewletbûnê

Berçavtirîn kusp û asteng û

Rêgir in...[169]

Em bi xwendina hindek helbestên Qeçaxî digehin vê encamê; kurd fêr bûne ku ta bigehin azadiyê û serbestiyê, divê xuhê û xwînê birêjin. Ew her wisa kesên dîndar û yên girêdayî 'eşîretê jî bi wê yekê tawanbar dike ku ji bo dijmin û dagirkeran bûne rêxweşker, xasime axayan ku li ser hindek bingehên 'eşîretan xelkê hejar bindest kiriye

[168] Qeçax, Qadir, *Beyana Min*, r. 65.
[169], Qeçax, Qadir, *Ferman û Helwîst*, Kovara Lalişê, Jimare 40, Zivistana 2015ê, r. 36.

û dîndaran jî bi gotinên xwe yên xapînok xelk di ser de biriye û milet bi rêka van her du aliyan, 'eşîret û dîndaran, ketiye di nexweşiyan de.

Qeçax kurdên êzidî kurdên resen dibîne, her wekî di helbesta "Ferman û Helwîst"ê de dibêje:

Rast e rast e

Ev jî fermanek giran e

Belê merema serekî

Ne her bi tinê ji bo kurdêt

Êzdiyan e

We ye kurdêt resenêt êzdî

Pitir tê da kire ziyane

Belê ne parçeparçebûna

Kurdistanê

Ne bi ol û 'eşîretiyê

Çi kurd ji yê dî ne paşve ne û

Ne cuda ne...[170]

Qeçax di vê parçehelbestê de wê yekê xuya dike ku ev karesata ji aliyê dijminekî dî yê dirinde ve ku dîşî (da'ş) ye bi serê kurdên êzidî hatine her tenê ji bo kurdên êzidî bûye, lê ji bo tevaya miletê kurd bûye. Ew her wisa dibêje ku rast e kurdên êzidî ji hemî kurdan zêdetir ketine ber pêlên reş û tarî yên van hêrişên dirindane, lê çi cudahî di navbera kurdan de nîne. Anku ji bo nehêlana miletê kurd, dijminan her carekê bi rengekî hêriş kiriye ser wan û xwîna wan riştiye. Ye'nî dijminan

[170] 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 36.

wisa viyaye ku miletê kurd her dem wisa hizr bike ku man û neman û buhişt û cehnem di destên wan de ne. Ew her carekê bi rengekî dirindane hêriş dikin ser gelê kurd. Anku bîr û baweriyên Qeçaxî wisa ne ku çi cudahî ji aliyê olî ve di navbera kurdan de nîne, lê kurdên êzidî resen dibîne.

### 3.2.5.2. Edîb Çelkî û Bîr û Bawerî

Rast e ku Çelkî derbasbûyîyê koleja şerî'etê ya Zanîngeha Bexdayê ye, lê piştî ku wî xwendina xwe bi dawî aniye berê xwe daye çiyayan û çûye nav rêzên şoreşê û bûye pêşmergeyekî niştîmanperwer. Her sê dîwanên wî ji bo bîr û baweriyên wî baştirîn belge ne û derbirînê ji baweriya wî ya bi doza gelê wî dikin. Ew di wê baweriyê de ye ku hunermend dikarin bi rêya helbest û stranan miletê kurd nêzî hev bikin û zaravên hev zêdetir bifahm in. Ev jî peyameke neteweyî ya gelek girîng e û ew rolê hêzên siyasî yên kurdan nikarin bi temamî pê rabin, helbestvan Çelkî di wê baweriyê de ye, stranên kurdî dikarin bi wî rolî rabin û xelkê Kurdistanê nêzî hev bikin.

Çelkî di helbesta "Beyta Laliş"ê de girîngiyeke yekcar mezin dide cih û warên êzidiyan ên pîroz;

Kaniya spî muhra pakî ye

Berat tuberk û çakî ye

Laliş rewşa welatê min

Kevnewarê vî xakî ye

***

Zorî û stem sal û zeman

Derbas bûn heftê û du ferman

Kes nekarî me winda ket

Me parastin ol û ziman

***

Parastin kulturê kurdan

Şêx Fexr û Dawidê Derman

Xidir û Hesed û Pisê Cem

Derwêş û Pîr Reşê Heyran[171]

Çelkî di vê helbestê de behsa cih û tiştên pîroz ên êzidiyan dike, mîna Kaniya Spî, Beratan û Laleşê. Ew rol û aliyên pîroz ên wan jî diyar dike. Kaniya Spî kaniyeke ava paqij e, li Perestgeha Laleşê ye û êzidî zarokên xwe bi ava wê mor dikin. Berat girovirkeke hindî keta maziyê ye, ji axa Laleşê û ava Kaniya Spî tê hevîrkirin û çêkirin. Her mirovekî êzidî beratekî wekî tiberk bi xwe re hildigire. Ji aliyekî dî ve, hilgirtina wê beratê belge ye li ser girêdana wan bi ax û av û welatên wan ve. Laleş mezintirîn perestgeha êzidiyan e.

Her wisa Çelkî di benda duyê de behsa wan fermanên ku bi serê êzidiyan hatine dike. Laleş di bersinggirtina fermanan û enfalan û 'erebandina Kurdistanê de çeperê herî pêşiyê bûye. Ev helbesta Çelkî ji peyameke viyanê û rêzgirtinê ye ji bo vê diyaneta deryayeke asteng û nexweşiyan derbas kirî û zindî mayî. Her wisa Çelkî di wê baweriyê de ye ku êzidiyatî mozyomeke dewlemend a parastina zimanê kurdî ye.

Çelkî di benda sêyan de jî behsa wê yekê dike ku êzidiyan kulturê kurdan parastiye û êzidiyatî ferhengeke zengîn a çand û zimanên kurdî ye. Ew her wisa behsa hindek mêrçakên êzidiyan dike, mîna Şêx Fexrê Adiya, Dawidê Bin Derman, Xidirê Bin Xidir, Hesedê Altewrî, Pisê Cem, Derwêşê Qatanî û Pîr Reşê Heyran ku navdartirîn qewlnivîsên êzidiyan in."[172]

#### 3.2.5.2.1. Edîb Çelkî û Newroz

Newroz di dîroka gelê kurd de rojeke mezin û pîroz e ku bûye nîşana xweragiriyê, serbestiyê, serfiraziyê, xweşiyê, seyranan û bîrhatinan. Newroz roja serkeftin û zilbûna hêza xêrê û çakiyê bi ser hêza şerî, stemê û zordariyê ye. Ye'nî Newroz li cem her kurdekî bûye nîşana bixwebawerbûnê û şanaziyê. Newroz her wisa

[171] Çelkî, Edîb, *Dara Çil Awaz*, r. 20-21.
[172] 'Eynî Çavkanî ya Berê, r. 22.

serê sala kurdî ye, dawiya zivistanê û serê biharê ye. Newroz yekem roja biharê û bexteweriyê ye. Edîb Çelkî di helbesta "Newroz"ê de dibêje:

Dîroka kevnar im ez, nîşana doza we me

Her sal carek nû dibim, xodana soza xwe me

Peyama azadî me, roja pîroz a we me

Ez cejna Kurdistan im, şahî û Newroza we me

***

Zistan sersala cîhan, lê ez bihara we me

Befr û sermayê dibem, gula adara we me

Aştî û şadî seyran im, sebr û hedara we me

Sersala gelên arî, cejna kubara we me

***

Firîşta Siroştî me, perî û delala we me

Kiras kesk û rengîn im, ez bûka sala we me

Nîşaniya min agir e, çirayê mala we me

Evîndara çiya me, ez rengê ala we me[173]

Di vê mijarê de, tiştekî balkêş û cuda li cem Edîb Çelkî heye ku wî ji helbestvanên din yên ku helbest bi Newrozê vehandine cuda dike. Şêwaz û awayên derbirînê yên piraniya helbestên ku li ser Newrozê hatine vehandin axaftina bi Newrozê re ye mîna "Newroz tu cejna miletê arî" yan jî xeberdane mîna "Newroz hat û bi gul û rîhan." Lê Çelkî cudahî di form û teknîka helbesta xwe ya Newrozê de kirine. Wî Newroz kiriye keçek û ew keç mîna keçeke gelek bi bîr û bawerî û xwedan soz bi

[173] Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, r. 97-98.

xelkê Kurdistanê re diaxive, xasime dema Newrozê bi ferîşteya xwezayê û çirayê ronahiyê û evîndara çiyayan diwesfîne. "Newroz sembola azadiyê ye. Her ji ber girîngî û pîroziya vê roja nû, pirraniya malên kurdan navê zarokên xwe dikin "Newroz/nevroz". Newroz bûye mijar û egera herî sereke ya lêgeryanê û azirandina mejî û xameyên nivîskar û hunermendan. Gelek nivîskar hest û nestên xwe dikin kiras, tekst û helbestên xwe bi vê peyva geş û rengdar dixemilînin. Guman tê de nîne ku gelek awayên helbestan hene, yek ji wan jî helbesta strankî ye. Divê her yek ji me vê pirsyarê ji xwe bike; erê hemî helbestvan dişên helbesta strankî binivîsin? Bêguman tenê ez dişêm nûnertiya xwe bikim û biryarder û bersivdera pirsyara xwe. Ez bi hemî piştrastî ve dibêjim: Nexêr, hemî helbestvan neşên vê yekê bikin ji ber ku divê helbestvanê stranê rewşenbîrekî dewlemend be bi dîrok, folklor, edebiyat, felsefe, ol… de ku bişê dahênan û afirandinên baş û mezin bike..."[174] Ye'nî Sindis Nihêlî sebaret helbesta Newrozê ya Edîb Çelkî dibêje: Ev cara yekê ye ez teksteke bi vî rengî li ser Newrozê dixwînim. Ev jî ji bo serbor û ziman û şarezahiya darêtinê li dev helbestvanî vedigere ku piraniya taybetmendî yên helbesta stranê di wê de bi kar anîne û ev helbesteke tijî raman û dilveker e.

Her wisa Edîb Çelkî di helbesta "Elho bilind difirn"ê de jî dibêje:

Ew namirin

Hindî stirana bibêjin

Sipne û Xabîr

Zê û Rûyê Şîn

Hindî Newroz cejna me bît

Bi agirê wê bixemilin

Gare û Metîn

[174] Nihêlî, Sindis, Kovara Zînê, Jimare 16, 2016, r. 66.

Cudî û Sefîn[175]

Çelkî di vê parçehelbestê de canê paqij ê hemî şehîdên Kurdistanê û Newrozê dide ber hev anku ew wesfa şehîdan bi hindek elementên xwezayê dike, mîna çemên Sipney, Xabûrî û Zêy. Newroz cejneke pîroz e û serkeftina her mirovekî kurd e, xasime ku Çelkî Newrozê bi xweragiriya hêza çiyayên Gare, Metîn, Cudî û Sefînan diwesfîne. Ye'nî Newroz û şehîd her du bi hev re dibin nîşana jiyanê û serhildanê. "Helbet, helbestvanê me gêjina me ya Newrozê jî ji bîr nake. Ew gelek caran di helbestan de amajeyê bi Newrozê dike, her wesa ew pirî caran bi rêya hêmayên wê, fenanî agirî, amajeyê pê dike. Lê ew hindek caran navê Newrozê rasterast tîne,"[176] ji bo mînak, ew di malika pêşiyê ya helbesta "Heyraneka Xemgîn"ê de dibêje;

Wek rojên reş û pêlên enfala

Hatin vekujin cejn û sersalla

Ji holê raken azadiya jînê

Navê Kurdistan Newroz û ala[177]

---

175 Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, r. 29.
176 Meley, Zinarê 'Ednanî û Mecîd, Mislim 'Ismet, Kovara Helbestê, r. 23.
177 Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, r. 38.

## ENCAM

Piştî me xebata xwe bi têr û teselî li ser xwezayê û taybetmendiyên wê di nav helbestên nû yên kurdî de kirî û taybet di nav helbestên Qadir Qeçaxî û Edîb Çelkî de, em li dawiyê gehan van xalan:

1. Xwezayê û xweşiktiyê cihekî berfireh ji helbestên nû dagir kiriye, xasime ku xwezayê di helbestên nû yên kurdî de komeke xasyetan heye ku wan ji helbestên klasîkî cuda dikin ji ber ku helbestvanên romantîk girîngiyeke zêde didin hemî regez û diyardeyên xwezayê. Helbestvanên nû berê xwe daye xwezayê û nîşandana dîmenên wê bi hemî ta, cure, regez û diyardeyên wê ve. Tevlihevkirina mirovan û xwezayê bi giyandar û bêgiyanên wê ve yek ji xemên helbestvanên nû ye.

2. Sedema vegera helbestvanan ber bi himbêza xwezayê û bikaranîna regez û diyardeyên xwezayê wekî keresteyê sereke û bingehîn di helbestan de ji bo xweşiktiya xwezaya Kurdistanê û evîna kûr a helbestvanan ji bo wê xwezaya ku ew xwe parek ji wê dizanin vedigere û bi sedema helbestên xwe yên li ser xwezayê zêdetir xweşiktiya xwezayê berçav dikin, niştîmanî li ber dilê xwendevanan xweşdivîtir dikin ji bo ku di tengavan de wekî dayika xwe bergîrê jê bikin.

3. Helbestvan gelek caran her tenê bi wesfên rût û serve serve û derveyî yên regez û diyardeyên xwezayê destan danahêlin, belkî li dû xweşiktirîn dîmenan digerin ji bo ku wan wekî nîşan bi kar bînin û bi behaneya wan nîşanan meremên xwe yên fikrî û filosofî û civakî derbibirin.

4. Gelek caran ruh bi regez û diyardeyên xwezaya bêgiyan tê dan û wekî mirovan hest û hiş ji bo wan tên çêkirin û dibin hevraz û hevdemên helbestvanan û helbestvan bi wan re diaxivin û dilê xwe ji wan re vedikin û bersivan ji wan werdigirin. Ye'nî guhertinên wijdanî, ruhanî û fikrî di navbera wan de çê dibin.

5. Gelek caran helbestvan xwe di nav xwezayê de dibînin, anku tevliheviyeke çir di navbera helbestvanan û xwezayê de çê dibe û yekîtiyeke mezin di navbera mirovan û giyaneweran û xwezaya bêgiyan de çê dibe ku dikeve warê nêrînên sofigerî ku xwe di yekbûnê de dibînin.

6. Helbestvanên kurd serederî bi xwezaya giyandar û ya bêgiyan re kiriye, lê xwezaya bêgiyan bi hemî reng, cure, regez, diyarde û dîmenên xwe ve zêdetir hatiye di nav helbestên nû de.

7. Ji regezên xwezaya bêgiyan, roj û heyv û stêr û cureyên dar û baran û gulan helbestên nû xemilandine û gelek caran jî wekî nîşan bi kar hatine. Roj nîşana jiyanê û ronahiyê û azadiyê û bezandina tarîtiyê ye. Hilatina rojê nîşana xweşiyê û welidînê ye û avabûna rojê nîşana xem û mirin û nemanan e. Heyv û stêr gelek caran bûne hevraz û hevdemên helbestvanan û gilî û gazinên dilê xwe ji wan re kirine û ew kirine hevderd û hevxemên xwe. Erd ku çavkaniya xwarin û vexwarin û qût û hevranên mirovan e gelek caran bi dayikê hatiye şibihandin ji bo ku nifşên nû pal bidin ku bergiriyê ji axa xwe bikin û xwe gorî wê bikin. Çiya jî nîşana xweragiriyê û meziniyê û serfiraziyê ye.

8. Şînkatî rûberekî zêde berfireh di helbestên xwezayê de girtiye. Ji bilî ku dar û ber çavkaniya xwarinan û sojekan û sîberan in, gelek caran ruh bi wan hatiye dan û wekî giyandarên xwedî hest û hiş serederî bi wan re hatiye kirin. Gul jî bi hemî cure û rengên xwe ve zêde ji aliyê helbestvanan ve hatiye behskirin ku bi manaya giştî yan wekî gulên taybet ku her cureyekî xasyetek heye û nîşana tiştekî ye. Wekî regezeke xweşik û mefadêr behsa avê hatiye kirin ku çavkaniya jiyanê ye. Av nîşana jiyanê ye; li kû derê av hebe, avedanî li wê derê ye. Rûbar û kanî û sûlav ji hemî çavkaniyên dî yên avê zêdetir di helbestên nû de bi kar hatine.

9. Diyardeyên xwezayî jî li dû cure û awayên xwe di helbestên nû de bi kar hatine: Cihekî baş ji bo “gejeyên” werzên salê hatiye terxankirin. Bihar ji hemî werzan zêdetir bi kar hatiye ji ber ku di vê werzê de Kurdistan dixemile û giyandar û şînkatî serê xwe hildidin, lewma bihar bûye nîşana zindîbûnê û jiyanê. Helbestvanên romantîk zêdetir girîngî bi payîzê daye ji ber ku ew nîşana xeman û mirinê û nemanê ye. Zivistan nîşana stemê û zehmetê û sistbûna jiyanê ye. Havîn jî nîşana jiyanê û xêr û bereketan e. Ji bilî werzan, ewr û baran û berf jî hene. Ewr û baran nîşana jiyanê û xêr û bêran in. Berf xeman û pîrîtiyê û di 'eynî demê de jî paqijiya ferîşteyan li bîra me tîne. Şev û roj jî di helbestên kurdî de bûne nîşan. Şev nîşana windabûnê û stemê û bêdadiyê ye û roj nîşana nehêlana zilmê û zordariyê û derketina şahiyê ye.

10. Giyandar jî bi kûvî û kedî yên xwe di helbestên nû de hatine behskirin, an ji bo temamkirina dîmenê giştî yê xwezaya bêgiyan hatine yan nîşandana xweşiktiya wan giyandaran û yan jî ji bo derxistina mefa yan ziyanên wan giyandaran wekî nîşan bi kar hatine. Hindek caran jî peywendiyên wijdanî di navbera helbestvanan û giyandaran de peyda dibin. Helbestvan danûstandinê bi wan re dikin, her wekî heval û hevparên xem û nexweşiyên jiyana xwe seredeiyê bi wan re dikin. Balinde ji hemî giyandaran zêdetir di helbestan de hatiye behskirin. Balindeyên azad nîşana serbestiyê û yên di nav qefesan de jî nîşana êsîriyê ne. Xwendina balindeyan nîşana serbestiya bîr û bawerî û derbirînan e. Helbestvan gelek caran dixwazin ku wekî balindeyan du çeng bi wan ve hebûna û ew jî serbest bifirîyina, geriyabana, ji zilm û zordariyan dûr ketibana û bi hêvî û umêdên xwe şa bûbana. Her balindeyek nîşana tiştekî ye; bilbil nîşana serbestiyê û dengxweşiyê ye, kevok nîşana aştiyê ye, elho nîşana hêzê û desthilatê û serbilindiyê ye hwd.

11. Helbest li ser zindewerên wekî moêrû û mêş û mor û mêşhingivan û pelatînkan jî hatine nivîsandin û ew wekî nîşan hatine bikaranîn. Morû nîşana xebat û lebat û têkoşanan e ji bo jiyanê û paşerojê, pelatînk nîşana evînê û xweşewitandinê ye, mêşhingiv nîşana lêgeryana cihên meremê ye hwd.

12. Zimanê wan helbestên behsa xwezayê dikin, kurdiyeke paqij û vewjartî ye û peyvên xwemalî di wan de hatine bikaranîn, bi pend û gotinên pêşînan û peyvên xweş ên nav xelkî hatine xemilandin. Rolê peyvan bi deng û manayên wan ve di nîşandana xwezayê de gelek mezin û berçav e.

13. Xwezaya xweşik a Kurdistanê kartêkirineke rasterast li her du helbestvanan, Qadir Qeçax û Edîb Çelkî kiriye. Ev jî ji verêja evîna kûr û bêdawî ya wan her duyan ji bo wê xwezayê ye ji ber ku heger mirov ji hundirê xwe tiştekî ne'ecibîne, qet di behskirina wî de serkeftî nabe.

14. Helbet zimanê helbestan li cem her du helbestvanan, Qadir Qeçax û Edîb Çelkî, ji rûyê dariştinê ve zimanekî sade û sivik û nazik û xweş e û ji rûyê manayê ve jî meremdar e. Xasime zimanê helbestan li cem Edîb Çelkî nemazeyî ye, wî peyvên petî û yên folklorî ji zarê xelkî wergirtine û bi kar anîne. Her wisa wî gelek peyv jî ji xwezayê bê guherandin wergirtine û hindek caran jî peyvên nû ji wan çê kirine. Sebaret

helbestên Qadir Qeçax; piraniya helbestên wî “posterî” ne anku li beranber her helbestekê nîgarek jî hatiye kêşan. Wî helbestên xwe bi rengekî serbest vehandine. Her wisa wî çend dîwanek hene ku bi xwezayê re girêdayî ne, mîna *Çiyavîn*ê, *Guldan*ê, *Kanî û Rûbar*ê, *Giyandarperwer*ê û *Kel û Şikeft*ê.

15. Di vê lêkolînê de, me jimareyeke helbestên Qadir Qeçax û Edîb Çelkî di warên niştîmanperwerî û evîna jinan û ya jîngehê de tev li elementên xwezayê kirine. Ev yek dibe sedema evîna wan a bêtixûb ji bo dîmenên balkêş ên Kurdistanê. Her wisa helbestên li ser xwezayê gelek cureyên wêneyên xweşik ji xwezaya Kurdistanê berçav dikin, çi wêneyên rasterast an nerasterast ku bi şibihandinê hatine çêkirin.

16. Bê guman xwezayê cihekê berfireh di helbestên her du helbestvanan, Qadir Qeçax û Edîb Çelkî, de vegirtiye. Her wisa tevlihevkirina baş bi regez û diyardeyên xwezayê re di nav helbestên wan de xweya dibe.

17. her du helbestvanên me karîne li bin himbêza xwezayê re bandorê li ser civakî bikin. Bi sedema helbestên xwe yên girêdayî bi elementên xwezayê re dilê xwandevanên xwe ji tengavî û nehametî û bêzariyan dûr bikin. Anko diyarkirina dîmenên xweşik yên balkêş ên mîna çem, kanî, sûlav, çiya, dar, gul û gulçîçekan. Di nav helbestên wan de, dibe sedema bêhinfirehî û hizrên erênî li cem xwandevanan çê dibe.

18. Li dawiyê em gehiştin wê encamê ko piştî lêkolîn û xwandina me ji bo dîwanên her du helbestvanan ew yek xweya dibe ko behra pitir ji dîwan û helbestên wan girêdayî xwezayê ne. Her wisa li gorî şiyanên xwe, her du helbestvan karîne girêdanekê di navbera xwandevanên xwe û regez û diyardeyên xwezayê berdest bikin.

## ÇAVKANÎ

### A-Pirtûk

### 1-Bi Zimanê Kurdî:


-Amêdî, Sadiq Behaedîn, *Hozanvanêt Kurd*, (Çapa1), Çapxaneya Korî Zanyarî – Îraq, Bexda, 1980.

-Bamernî, Newzad 'Ebdula, *Aydolojiya di Hozanên Cigerxwînî da,* (Çapa1), weş. Spîrêzê ya Çap û Weşanê, Çapxaneya Xanî, Dihok, 2007.

-Cîhanî, Perwîz, Mem û Zîn Bi Rave û Şiroveyek Nû, Bergê Duyê, Weş. Spîrêzê – Dihok,2007.

-Celîl, Ordîxan, *Şî'rî Şaristanî Cegerxiwên*, 'Îzedîn Mistefa Resol, Wer, Kirmancî Xwaro u Tîpî 'Erebî uPerawêz, Weş. Spîrêzê, Çapxaneya Xanî, Dihok, 2009.

-‘Elî, Dilşad, *Dîlan Şa'îr û Azadîxwaz*, Çapxaney Korî Zanyarî Kurd, Bexda, 1981.

-Hisênî, Riza Seyîd, *Qutabxane Edebiyekan*, û. 'Arif, Heme Kerîm, Dezgay Twêjînewe û Weş, Mukriyanî, Çapxaney Wezaretî Perwerde, Hewlêr, 2006.

-Karwanî, Kakey Felah, *Şî'rî Nwêy Kurdî*, çapaxaney korî zanyarî kurd, 1978.

-Kurdo, Qanat, *Tarîxa Edebiyata Kurdî*, (Çapa1),bariş matba'a-mucelit, stanbul, 2010.

-Melay Kerîm, Mihemed, *Sercem Şî'rekanî 'Ebdula Goran*, bergî yekem, (Çapa5), pexşangay panîz, tehran, 1393.

-Mizûrî, Azad ‘Ebdul’ezîz, *Celadet Bedirxan û Şi’ir*, (Çapa 1), çapxaneya hecî haşim – Hewlêr, 2006.

-Qeredaxî, ‘Elî Şêx 'Omer, *Mewlewî û Siroşt*, Çapaxaney korî zanyarî kurd, Bexda, 1978.

-Resol, Şukriye, *Werz û Salnamey Kurdî le Pend û Qisey Nesteqî kurdî da,* kovarî Roşinbîrî nwê, 1988

-Resol, 'Izedîn Mistefa, *edebiyatî nwêy kurdî*, Çapxaney Hewlêr, 1990.

-Scadî, 'Elaedîn, *Mêjûy Edebî Kurdî*, (Çapa2), Bexda, 1971.

-Xeznedar, Marif, *Mêjûy Edebî Kurdî,* Bergî Yekem, Çapxaney,Weş, Aras, 2001.

.

**-2-Bi Zimanê 'Erebî:**

**-1.Qurana Kerîm:**

-1.Suret 'Tur', el-Ayet 35.

-2.Suret 'el-Enbiya', el-Ayet 30.

-3.Suret 'Alî 'Îmran', el-Ayet 27.

-4.Suret 'Ael-Feleq', el-Ayet 3.

**-2.Perûk:**

-Elzubeydî, Kasid Yasir, *el-Tebî'e fî el-Quran el-Kerîm,* Metbe'e el-Zehra – Mûsil, t. 2, 1980.

-El'ewfî, Ahmed Mihemed, *Exanî el-Tebî'e fî Elşi'ir el-Cahilî*, Mektebet Nehze, Msir – el-Qahîre, 1958.

-'Ebdalnur, Cibur, *el-Mu'cem el-Edebî*, Dar el-'Ilim el-Milayîn, Beyrut, t. 1, 1979.

-Ferset, Lîlyan, t: 'Ebdilwahid loloe, *el-Romansiye*, Bexdad, 1978.

-Mûsa, Mihemed Yusif, *el-Quran wel-Felsefe*, Dar el-Me'arif bî-Misir – el-Qahîre, 1958.

-Nesare, Huseyn, *el-Tebî'e wel-Şi'ir el-'Erebî,* Dar Misir lîl-Tîba'e, el-Qahîre, 1972.

-Newfel, Seyid, *Şi'ir el-Tebî'e fî el-Edeb el-Endelusî*, Cewde el-Rikabî, Dar el-Me'arif bî-Misir – el-Qahîre, t. 4, 1975.

-Silîba, Cemîl, *el-Mu'ecem el-Felsefî*, Dar el-Kitab el-lubnanî, (Çapa2), 1979.

-Xelîl, 'Îmadedîn, *el-Tebî'e fî el-Fen el-Xerbî wel-Îslamî*, Metbe'e el-Zehra – mûsil, t. 2, 1980.

-Newfel, Seyid, *Şi'ir el-Tebî'e fî el-Edeb el-'Erebî*, el-Qahîre, Metbe'e Misir, 1945.

-Selam, Mihemed Zexlul, *el-Neqd el-Edebî el-Hedîs*, Dar el-Me'arif, Qahîre, t. 1, 1981.

-Se'îd, Cemîl, *el-Wesif fî el-Şi'ir el-'Îraqî fî el-Qirneyn el-Salis wel-Rabi' el-Hicrîyîn*, Metbe'et el-Hîlal – Bexdad, 1948.

-Wehbe, Micdî, kamil mihendis, *Mu'ecem el-Mistelihat el-'Erebiye fî el-Luxe wel-Edeb*, Mektebet Lubnan, t. 2, 1970.

-Xumîde, 'Ebdulrezaq, *Qises el-Heywan fî el-Edeb el-'Erebî*, Mektebet el-Encilu el-Misriye, el-Qahîre, 1980.

**-C-Bi Zimanê Farisî:**

-Harlind, Rîcar, *Der Amedî Tarîxî Ber Nevriyey Adabî ez Eflatun ta Bart*, Tercumê 'Elî me'sumî ve Şayur Curkiş, Çapê Duvum, 1384.

-Silîba, Cemîl, *Ferhengê Felsefî, Tercumê: Minuchirêanmî Derbîdî*, (Çapa2), Tehran, 1381k.

-4-Bi Zimanê Îngilîzî

-Amma, 108 Qoutes on Nature, p. 12.

**Ç.Dîwan û Komên Helbestan:**

-Bedirxan, Kamîran, *Dilê Kurên Min*, Têlî Emînî ji Tîpên Latînî Veguhertiye û Vekolaye, Darul-Huriye, Bexda, 1991.

-*Bêkes*, Mihemedî Mela Kerîm, (Çapa2), Çapxaney Eledîb, 1989.

-Cigerxwîn, *Agir û Prûsik*, Dîwana Yekem, Weş. Avestayê, Stembol, 2003.

-Cigerxwîn, *Serwa Azadî*, Dîwana Duwem, Şam, 1954.

-Cigerxwîn, *Kî Me Ez*, Dîwana Sêyem, (Çapa3), Weşanên Avestayê, Stembol, 2003.

-Cigerxwîn, *Şefeq*, Dîwana Şeşem, (Çapa3), Weşanên Avestayê, Stembol, 2003.

-Çelkî, Edîb, *Stiranên Zêy*, Pertûkxaneya Xanî, Dihok, 2017.

-Çelkî, Edîb, *Pêlistankên Koçer*, (Çapa1), Çapxaneya Girîn Giloriyê, Beyrut / libnan, 2016.

-Çelkî, Edîb, *dara çil awaz*, (Çapa1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2010.

-Dîwanî Goran, *Sercem Berhemî Goran*, Bergî Yekem, Mihemedî Mela Kerîm, Bexda, Çapxaney Korî Zanyarî 'Îraq, 1980.

-Kakey Felah, *Cigergoşekan*, Çapî Sêyem, Silêmanî, Çapxaney ‘Kakey Felah’, 1970.

-*Pîremêrdî Nemir*, Mihemed Resol Hawar, Bexda, Çapxaney ‘Almanî’, 1970.

-*Pîremêrd*, Faq Huşyar û Mehmûd Ehmed Mihemed, Bexda, 1990.

-Qeçax, Qadir, *Bizot*, (Çapa1), Çapxaneya Hewlêrê, 2003.

-Qeçax, Qadir, *Beyana Min*, (Çapa1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2015.

-Qeçax, Qadir, *Kel Û Şkeft*, (Çapa1), Çapxaneya Xanî, Dihok, 2007.

-Qeçax, Qadir, *Giyandarperwer*, (Çapa1), Çapxaneya Hawarê, Dihok, 2007.

-Qeçax, Qadir, *Bizav*, Çapa Yekê, Rajan, Kurdistana Îranê, 1984.

-Qeçax, Qadir, *Bizav û Amanc*, (Çapa1), Çapxaneya Wezareta Rewşenbîriyê, Hewlêr, 2000.

-Qeçax, Qadir, *Çiyavîn,* (Çapa1), Çapxaneya Hecî Haşimî, Hewlêr, 2005.

-Qoçan, Mihsin, *Befra Li Vêrê*, (Çapa1), bi Harîkarî ya Emîndarî ya Giştî ya Rewşenbîrî û Lawan Hatiye Çapkirin, Çapxaneya es'edê – Bexda, 1986.

-Qazî, Hafiz, *Dîwana Qazî Bi Navê Êş û Jan*, (Çapa1), Çapxaneya Xebatê, Dihok, 2004.

-Sindî, Bedirxan, *Hozanêt Min*, (Çapa1), Weş. Spîrêzê – Dihok, 2009.

-*Şêx Salih, Şêx Nurî*, Azad 'Ebdilwahid, Bergî Yekem, Beşî Duwem, Bexda, Çapxaney ‘Cahiz’, 1989.

-Teyîb, Mueyed, *Stiran Û Befr Û Agir*, Dihok, (Çapa1), 1992.

-Teyîb, Mueyed, *Piling Dema Birsî Dibin ... Mirov Dema Têr Dibin*, (Çapa1), Spîrêz, 2012.

-Teyîb, Mueyed, *Ne Ba Min Swar Diket Ne Ax Min Peya Diket*, Ji Çap û Weş.Kitêbxaneya Cizîrî – Dihod, Çapxaneya Martîsê – Tirkya, (Çapa1), 2016.

**D.Kovar**

**1-Bi Zimanê Kurdî:**

-Balayî, Fehmî, *Peywendî Di Navbera Wîneyê Hunerî û Siroştî De*, Kovara Metînê, Dihok, j. 186, 2009.

-'Ebdulla, Emîn Hacî, *Berawirdiyêk le Nêwan Helbestêkî Poşkîn û Pîremêrd da*, Kovarî Hawkarî, Jimarey Taybetî, 1/1/1972.

-*Kovarî Nûserî Kurd*, Jimare 15, 1979.

Mîrawdelî, Kemal, *Siroşt û Ciwanî le Şi'rî Goran da*, Nûserî Kurd,J ‘9’, 1973.

-Meley, Zinarê 'Ednanî û Mecîd, Mislim 'Ismet, *Neteweperwerî di Helbestên Edîbê Çelkî da, Kovara Helbestê*, Jimare '9', 2013.

-Nihêlî, Sindis, *Hemî Dengên Jinan Xoş Nînin*, Kovara Zînê, Jimare 16, 2016.

-Qeçax, Qadir, *Ferman û Helwîst*, Kovara Lalişê, Jimare '40', 2015.

**2- Bi Zimanê 'Erebî:**

-Elmuxadîme, Silêman Xalid, *Mefhum el-Tebî'e Mîn el-Fikir el-Yunanî îla Fikir el-Hedase*, Micelet Dîrasat, Urdin, '. '26',1999.

-Baqir, Teha, *Melhemet Kilkamiş*, t. '4', dar el-Huriye lîl-Tîba'e, Bexdad, 1980.-

**E.Nameyên Ekademî:**

**1- Bi Zimanê Kurdî:**

-Ehmed, 'Edle Cemîl, *Rolê 'Ebdirehîm Rehmiyê Hekarî di Nûkirina Hozana Kurdî da*, Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, 2003

-Fetah, Dilêr Dawid, *Saloxdan di Mîrnameya Jan Dostî de, Nameya Masterê*, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, 2017.

-Husên, Beyan Ehmed, *Hozana Bergiriyê Li Serdemê Şoreşa Gulanê 1976-1991ê Devera Behdînan*, Nameya Masterê, Zanîngeha Dihokê, Kolîja Adabê, 2003.

-Mehmûd, Fazil Mecîd, *Siroşt le Şî'rî Goran da*, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1990.

-Nebî, Kamîran Mihemed, *Qûnaxên Werara Netewayetî di Hozana Kurdî da*, Nama Diktorayê,Zanîngeha Selahedîn, 2005.

-Selam, Kwêstan Cemal, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da '1930-1960'*, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1996.

-Mehmûd, Fazil Mecîd, *Siroşt le Şî'rî Goran da*, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1990.

-Selam, Kwêstan Cemal, *Siroşt le Şî'rî Nwêy Kurdî da '1930-1960'*, Nameyêkî Master, Kolîjî Adab, Zankoy Selahedîn, 1996.

**2- Bi Zimanê 'Erebî**

-Hemîd, Huseyn 'Ebud, *el-Tebî'e fî el-Şi'ir el-'Îraqî el-Hedîs*, Rîsalet Macistêr, Camî'et el-Besre, Kuliyet el-Adab, 1984.

-Mecîd, Mihemd Hesen 'Elî, *el-Wesif fî el-Şi'ir el-'Îraqî*, Rîsalet el-Dikturah, Camî'et Bexdad, 1985.

**Ê.Çavpêketin**

-Çelkî, Edîb, *Pertûkxaneya Bedirxaniyan*, Dihok, 8/5/2017.

-Qeçax, Qadir, *Mozexaneya Qeçaxê*, Dihok, 17/6/2017.

**-F.Malperên Înternetê**

-Hittp://Ar.Wkipedia.Org/Wiki/el-*Tebî'e*

Hittp//:*Mayalmoudalal.Jeeron*.Com/Archive/2009/1/773597.Htimt.

intihal.net

Benzerlik Raporu

2017-11-23 11:17:20.0

**HAYHAT ISSA IBRAHIM** adına yüklenen "**XWEZA DI HELBESTÊN NÛ YÊN KURDÎ DE HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE**" isimli eserin benzerlik testi yapılmıştır. Test sonucunda benzerlik oranı %**0** bulunmuştur.

Doküman Kodu : **2034_1511425038**

Doküman Kodu ile bu dokümanın doğruluğu
**http://app.intihal.net/kontrol.jsp** adresinden kontrol edilebilir.

intihal.net

# XWEZA DI HELBESTÊN NÛ YÊN KURDÎ DE HELBESTÊN QADIR QEÇAX Û EDÎB ÇELKÎ WEK NIMÛNE

**Yazar :** HAYHAT ISSA IBRAHIM **Sayfa Sayısı :** 70 **Kelime Sayısı :** 30507 **Karakter Sayısı :** 187751

ORJINALLİK RAPORU

| BENZERLİK ENDEKSİ | İNTERNET KAYNAKLARI | YAYINLAR | ÖĞRENCİ ÖDEVLERİ |
|---|---|---|---|
| %0 | - | - | - |

BİRİNCİL KAYNAKLAR

| | | |
|---|---|---|
| 1 | http://arxiv.org - **Internet Source** | <%1 |
| 2 | Yüzüncü Yıl Üniversitesi - **Vebêjin di navbera romana \'\'Navê min Sor e \'\'ya Orhan Pamuk û \'\'Mîrnameya\'\' Can dost e Pamuk\'taki anlatım Benim Adım Kırmızı ve Jan Dost\'un Mirnami si** | <%1 |
| 3 | Yüzüncü Yıl Üniversitesi - **Di edebiyata Kurdî ya kevin û nû da erkên rexneyî Kürt edebiyatında eski eleştiri ve yeni eleştiri arasınındaki eleştiri görevi** | <%1 |
| 4 | Mardin Artuklu Üniversitesi - **Dengbêj resoyê gopala Dengbêj resoyê gopala\'nin yaşam ve eserleri** | <%1 |
| 5 | Yüzüncü Yıl Üniversitesi - **Berhevxitna cînavkên kesî di Kurmanciya jorîn û jêrîn de Yukarı ve aşağı Kurmanci\'deki şahıs zamirlerinin toplanması** | <%1 |
| 6 | Yüzüncü Yıl Üniversitesi - **Nûjenxazî di rûxsara helbestên Şêx Nûrî da Şeyh Nuri\'nin şiirlerinde kullandığı şiir kalıpları** | <%1 |
| 7 | Mardin Artuklu Üniversitesi - **Dı tradîsyona dengbêjıya kurdî de şakıro (jıyan û berhem) Kürt dengbejlik geleneğinde dengbej şakıro (hayatı ve eserleri)** | <%1 |

T.C
Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**QADIR QEÇAX VE EDÎB ÇELKÎ ŞİİRLERİ ÖRNEKLEMİNDE MODERN KÜRT ŞİİRİNDE DOĞA**

HAYHAT ISSA IBRAHIM

15711020

Danışman

Doç. Dr. Rafik SULAIMAN

Mardin 2017